

NÛDEM

No 15 1995



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

NÛDEM Werger Derdikeve!

Piştî kovara Nûdemê û pirtûkên Weşanên Nûdemê, wê niha jî kovareke xwerû werger, bi navê "NÛDEM Werger" derkeve.

Polîtîkaya NÛDEM Werger jî wê mîna ya NÛDEMÊ demokratîk û serbixwe be, bi gotineke din wê Kurdistanê be. Wê salê du hejmar derkevin, ango biharan û payizan û wê her hejmarek ji dusedî (200) heta çarsed (400) rûpelê be. Wê ebada wê ji kovara NÛDEMÊ mezintir be, lê wê nêzikî karekera wê be. Ji wergerên çîrok û helbestan wêdetir, wê wergerên teoriya edebiyatê bi giştî, tevgerên edebî, dîroka edebiyatê; li ser roman, çîrok, helbest, piyes, rexne û hwd bin. Em ê bi tenê xwe bi edebiyatê ve jî bi sînor nekin, herweha em ê hejmarên taybetî li ser felsefê, li ser dîn, li ser îdeolojiyan jî amade bikin.

Heta ji me bê, em ê wergerên ji zimanên orjînal bikin. Ji niha ve hevalên me li seranserê dinyayê dest bi wergerên ji zimanên mîna îngilîzî, almanî, fransî, tirkî, swêdî, erebî û hwd. kirine.

Kurdo/Kurdê, ger tu dixwazî em bigihîjin pîvana dinyayê û zimanê me têkeve nava refên zimanên dinyayê, divê tu ji niha ve haziriya abonetiya NÛDEM Werger bikî. NÛDEM Werger ya te ye, ya zimanê te ye, ya miletê te ye!

NÛDEM Werger di nêzik de derdikeve!

NÜDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî

Xwedî û berpirsiyarê giştî
Chief Editor

Firat Cewerî

Hejmar 15
Payiz: 1995

Şerdên abonetiye (salek)
Swêd: 190 Sek
Welatên din: 50 \$
Institution 260 Sek

Postgîro: 616 36 25-2
ISSN: 1103-1964

Wêneya bergê: Amand v. Schwiger-
Lerchenfeld, *Die Frauen des Orients*
Wien & Leipzig, 1904.
Ev wêne ji arşîva Rohat Alakom
hatiye girtin.

Pergala berg û rûpelan: Nûdem

NÜDEM kovareke serbixwe û
Kurdistanî ye, ferqiyetê naxe navbera
nêrîn û îdeolojiyên kurdan, ji
dijîminatiya kes û rêkxistinên dîr e,
rûpelên wê ji hemû nivîskarên kurd re
vekirine.

*Heqar, Mehmed Uzun, Naci Kutlay, Z. Umar, Nûll
Duhokî, Hesenî Metî, Husein Duzen, Sebri Botanî, Husein Qazî, Ş
B. Norkî, Bedriyanî I pîzdemir, Lemanî Bejîl*

Navnîşan/Adress

Termov. 52 2tr.
175 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-583 564 68

NAVEROK

- 4 BÎRANÎNÊN MEZINÊN KURDAN ♦ **Firat Cewerî**
- 6 PÊNC HELBEST JI ♦ **Rojen Barnas**
- 12 MÎR KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN ♦ **Rojan Hazim**
- 26 ÇÎROKA BÛNA MIN ♦ **Mehfûz Mayî**
- 28 GALÎLEO GALILEI ♦ **Şerefxan Cizirî**
- 32 JI WÊ RE ♦ **Can Gülşenoğlu**
- 33 EHMEDE XANÎ Û RAMANA DEWLETÎ ♦ **Felât Dilgeş**
- 56 HELBESTEK JI ♦ **Mervanê Keleş**
- 60 ÊZÎDIYÊN ÇIYAYÊ SINCARE ♦ **Ingmar Karlsson**
- 69 SEYDAYÊ TÎRÊJ ♦ **Şefîk Kaya**
- 74 SEBRIYE HEKARÎ ♦ **Xelîl Duhokî**
- 76 ROMANSEKE ÇILMISÎ ♦ **Firat Cewerî**
- 81 HAPPY BIRTH DAY TO... ♦ **M. Emin Pencewinî**
- 84 DEMEKE KU HATE KUŞTIN ♦ **Süleyman Demir**
- 103 HIŞÊ XWE PÊŞ DE BIBIN ♦ **Aziz Nesin**
- 106 HELBESTEK JI ♦ **Hoşeng Biroka**
- 108 PÊWÎSTIYA PISPORIYÊ ♦ **Lokman Polat**
- 110 REWŞEN BEDIR-XAN ♦ **F. Cewerî**
- 114 SEROKÊ KARÊ DIYANETÊ... ♦ **Sabah Kara**



BÎRANÎNÊN MEZINÊN KURDAN

Di sala 1993'an de sedsaliya bûyîna Celadet Bedir-Xan bû. Îsal jî sedsaliya bûyîna birayê wî yê biçûk Kamiran Bedir-Xan e. Hertim mîna ku Kamiran Bedir-Xan di siya Celadet Bedir-Xan de hatibe jibîrkin. Bi hinceta bîranîna Kamiran Beg min di tu kovar û rojnameyên kurdan de tiştek nexwend, tu nûçe nebihîst, tu çalakî nedît. Kamiran Bedir-Xan yek ji rewşenbîr û nivîskarên kurdan yê jîr e ku bi sedan nivîsên cihêreng li dû xwe hiştine. Bêguman wê hertim cihekî wî yê taybetî di dîroka rewşenbîriya kurdî de hebe. Di vê hejmarê de Rojan Hazim li ser jiyana Kamiran Bedir-Xan, li ser malbata Bedir-Xaniyan, li ser xebatên Kamiran Bedir-Xan dîr û dirêj radiweste. Em hêvîdar in me ê bi vê nivîsê rewşenbîr û nivîskarê xwe bi bîr anîbe.

Bîranîneke din heye ku îro jî bo kurdan bûye nîşana yekîtî û azadiyê. Ev bîranîna han jî sêedsaliya nivîsandina Mem û Zîna Ehmedê Xanî ye. Hem berî niha bi du salan, yanî di bîranîna Celadet Bedir-Xan de, hem jî îsal, kurd bi girseyî van herdu mezinên xwe bi bîr tînin. Di 93'an de ji bo Celadet Bedir-Xan li seranserî dinyayê çalakî çêbûn, civîn û konferans li dar ketin, kovar û rojnameyên kurdan cihên fireh jê re veqetandin. Ji her nêrîn û îdeolojiyê, kurd li Celadet Bedir-Xan xwedî derketin, zanebûn û mezinahiya wî anîne ziman. Bi gotineke din, kurd bi bîranîna navê wî ber bi hev hatin, ji dijîtî û dijminatîya li hemberî hevdu bi dîr ketin. Em dibînin îsal saleke hîn xurttir e. Ev sala bîranîna sêedsaliya nivîsandina Mem û Zînê, ji aliyê pîrrianiya kurdan ve sala Ehmedê Xanî hatiye îlankirin. Bi îlankirina vê salê re seferberlikeke xwendin û nivîsandina kurdî jî dest pê kiriye. Ji destpêka sala 1995'an û vir ve li ser Emedê Xanî pir tişt hatin gotin û nivîsandin. Di derheqa wî de raman û nêrînên cihê hatin pêşkêşkirin. Hinekan ew mîna alim û filozof, hinekan ew mîna hîmavêjê nasyonalîzma kurdî, hinekan ew mîna têkoşer, hinekan ew mîna humanîst, hinekan ew mîna şerker û hwd. dane naskirin. Di nava rûpelên kovar û rojnameyên kurdan de li

Firat Cewerî

ser wî lêkolîn hatin kirin, ji aliyê kurd û biyaniyan ve li ser wî pirtûk hatin nivîsandin, navê wî li grûbên tiyatro û hwd. hate kirin, resaman wêneyên wî çêkirin, hêkelçêker li ser çêkirina hêkelên wî dixebitin. Bivê nevé, di nava vê xebata gurr de wê gelek tiştên ji rastiye dût jî derkevin meydanê, lê di vir de tiştê girîng, di bin navê Ehmedê Xanî de, di bin sîwana wî de berbihevhatin û yekîtiya kurdan e. Gurrkirina pêlên hîsên neteweyî û ji bo bidestxistina mafê xwe têkoşîn e. Yanî Ehmedê Xanî di vir de sembolek e, ji bo kurdan lixwewedîderketin e, ji ber paşeroja xwe serbilindahî û ji bo pêşerojê jî avêtina hîmê kurdayetiyeke pak û ber bi azadiyê gavavêtin e. Di şexsê Ehmedê Xanî de, lêgerîn û lêxwedîderketina kevneşexsiyetên kurdan e. Bi vê hincetê naskirin û qîmerdayina zanebûn û rewşenbîriya kurdî ya îroyîn e. Bi gotineke din, di sala Ehmedê Xanî de baweriya kurdan bi wan xurtir bûye, hevî û moral daye wan û qîmeta xwendin û nivîsandina kurdî li ba wan bilind kiriye.

Felat Dilgeş bi lêkolîneke xwe ya li ser Ehmedê Xanî beşdariyê li vê hejmarê Nûdemê dike. Dilgeş Ehmedê Xanî beramberî hin filozof û navdarên dinyayê yên mîna Platon, Îbnî Xaldûn, Mackiaveli, Thomas More û Thomas Hobbes dike; di warê îdarekirina filozofan ya dewletê de nêrîna Ehmedê Xanî nêzikî ya Platon dibîne. Mîna tê zanîn şagirtê Sokrates, Platon, li dijî sistemen mîna oligarşî, monarşî û demokrasîyê bû û wî di şûna wan sisteman de desthilatdariya filozofan rasttir didît. Nêzikahiya Ehmedê Xanî ya Îbnî Xaldûn jî ew e, ku Îbnî Xaldûn koçeriya ereban di avakirina dewletê de mîna astengiyek didît û herweha Ehmedê Xanî jî bêtifaqî û hev-dunehesibandina kurdan li pêşîya avakirina dewleteke kurdî mîna astengiyekê dibîne. Di avakirina dewletê de Machiaveli hêz û zorê roleke bingeşîn dibîne, Ehmedê Xanî jî bawer e ku bi şûr û zanebûnê wê dewleteke kurdî ava bibe. Ehmedê Xanî ji utopiya Thomas More dût e, lê di warê desthilatdarî û otorîteya dewletê de nêrînen Ehmedê Xanî û Thomas Hobbes nêzikî hev in. Felat Dilgeş bi firehî li ser vê mijarê radiweste û dûtûbûn û nêzikahiya nêrînen Ehmedê Xanî û van filozof û navdarên dinyayê beramberî hev dike.

Şerefexan Cizîrî di nivîsa xwe "Galileo Galilei" de li ser nêrîn û felsefeya Galileo Galilei radiweste û zehmetiyên ku Galilei ji bo keşîfa xwe kişandine tîne ziman. Di sala 1616'an de desthilatdariya dînî bi mehkemeya engizisyonê biryar dide ku nêrînen Galileo Galilei qedexe bike û paşê jî cezayên dirêj dide wî. Ji xwe berî wî jî Giordano Bruna ji ber fikrên xwe hatibû îzolekirin û şewitandin û bûbû yek ji qurbanên nivîskar û filozofan. Mamosteyê Platon, Sokrates jî di 68 saliya xwe de bi îdamê hatibû mehkûmkirin û paşê jî bi jehrê hatibû kuştin. Serê nivîskar û filozofan di her deman de bi desthilatdaran re di belayê de ye. Ehmedê Xanî jî di dema xwe de ji desthilatdar û mîran gazin kiriye û ji bo ku ew tadeyê li feqîr û şaîran nekin, ew haydar kirine. Stêmkariya li ser nivîskar û filozofan ji dema Sokrates û heta roja me dom dike. Sûleyman Demir bi nivîsa xwe "Demeke ku Hate Kuştin" resimekî reş yê dema desthilatdariya Stalîn radixe. Di wan salan de girtin, îşkence û windakirina şaîr û nivîskarên navdar yên mîna Osîp Mandelstam, Vladimir Mayakovskî, Marîna Tsvetayeva, Maxim Gorkî, Isaak babel û Vsevolod Meyerhold şirove dike.

Wekî din hûn ê di vê hejmarê de ji bilî helbestên Rojen Barnas pêrgî navên hin şaîrên nû û herweha pêrgî gelek nivîsên cihê werin.

Bi hêviya dinyayeke xweş... ✍️

DÎCLE Û FIRAT

Rojen Bamas

1. Du Perî

Di destpêka zemanekî nesalixdayî
Ku zeman hê nêremok
Û avis bû bi tarî û ronîyê.

Ji alîkî bêalî
Ji batin
Du kevok
 bi fir
 hatin.

Geriyên li bilindayiya, li pehnayî
Noqî kûrayiyê bûn, brûskasa...
Warek ji xwe re hilbijartin
Danîn li erdê
Xwe şelihandin ji post û kirasa.

Gêran bi periyên herdû kevok:
Du perî;
Du keçên xama
Du perî;
Cêwîkên hêkekê
Ketin temaşa erdek raxistî:
Bi berrî û deşt , kortik û pehnav
Bi çiyayên bilind û geliyên kûr
Ku xelek xelek di hev de bestî.

Jê hez kîrin,
Pê şa bûn,
Û jê ecêbmayî.
Mîna reqasa
Ketin govendê.
Stran...
Ji stranan govend geş bû.
Govend girtin, ji govendê stran kemilîn.
Xulxulîn kete erd û esman
Maka cêwîkên tarî û ronî
Ya di ber tengiya zayinê de
Li ber govend û stranên wan ji xwe ve çû,
Raza
Barê xwe danî
Û za
herdû cêwîkan;
‘ Tarî û Ronî
Sar û Germ’

Ku li pey hev in
Lê ji hev cuda.
Ne di êk hev de
Û ne bi hev ra.

Stran geş bû
Govenda keçperiyên
Hingî çû germtirîn bû
Hingî çû xweş bû,
Li ber nazdaryên Roniyê.

Govendê xweser;
-Bakur û başûr ve jorejêr,
Rast û çep ve l’ berayî
Bê ser û bê dûvik
Bê haf û hember-
Dest pê kir
Ku Perî

Hê bêtir lê sor bûn.
Ji ber gurmîna pehniyên wan
Bi sar û germê
Du serkanî derbûn,
- Milkanî digel-
Zan ji destpêka zemanekî bêdestpêk
Distrên û di govendê de ne hê jî
Dizên ta dawiya zemanê bêdawayê.

Rawiyê efsanê riwayet nake
Ku çawa Keçperî warqilîn lê.
Lê, bi navê xwe bi nav kirin herdû nûzayan
Yê yekê Firat, yê dinê Dîclê

2. Mezopotamya

Di hembêza Firat û di paşila Dîclê de
Axek hêşîn bû seraser
Bi berrî û deşt, kortik û pehnav
Bi çiyayên bilind û geliyên kûr
Xakek bi kûrahî zayok
Erdek li berayî bi xêrûber

Xweza bi şîranî li vê der
Dergûşa pitika şarsaniyetê
Hejand bi evînî, bi nazdarî
Gel tê de afirîn, gel tê de rabûn
Gel ku mora xwe li sînga
Zanîn û şarsaniyeta mirovî xistin
Lê hê jî kes nizane ka gelo
Bi ku ve çûn
An ji ku hatin.

3. Ev Milk

Di hembêza Firat û di paşila Dîclê de
Evîn germ e,
Hezkin;
Kûr û zirav û dirêj.
Esman bibext û zengîn
Ji dayînên esmanî.
Erd makeyek biber e,
Dizê bi dîlovanî

Ji esman hatin em,
-Wek kurd-
An
Ji erdê hêşîn bûn bi awakî?
Kengê... çawa... çilo...
Peyda bûn li vî xakî?...
Kes nîne bersîva vê pirsê bide
Û bîra tarîxê jî ji heq dernayê.
Tiştê tê zanîn
Ji destpêka zemanekî nebinavkirî
Em li vê deverê ne.
Me gêra vî xakî kire war
Û vî warî kire milk
Me xwe jê re feda kir
Ji silqê safî.

4. Pêrgîn

Rabin pêrgînê xwenasîn
Xwezanîn rabin li piya bipên
Mizgîna serîdana vejîné ye
Bibihên.

Bihîstin helbet
Bihîstin xwenasîn û xwezanîn
Li piya stran bi dîlok, bi bêlûte
Û stran stranê
Ji devê min û te.

Dîcle - Firat jiyan e,
Jiyan kurt e li berê.
Ji destpêka bêdestpêk
Hetanî serbiserê
Delala ber dila ye
Dilê b' tijî keserê
Ma gelo emê çawa
Canê xwe nedin l' serê?

Dîcle - Firat xwîn û can,
Laş bi xwe Kurdistan e.
Bê laş ma xwîn çi tişt e?
Xwîn û laş pêkve can e.
Ger Kurdistan behîşt e,
Bê kurd behîşt xopan e.
Gava behîşt ji dest çû
Cîhan êdî zindan e.

5. Di Hembêza Firat û Di Paşila Dîclê De

Di hembêza Firat û di paşila Dîclê de
Çiyayên bilind hene;
navserên wan
Hêlînên eyloyan in: Eylo serbilind...
Û warê
çêra berxikên me.

Di hembêza Firat û di paşila Dîclê de
Gelî hene; bi rêl in, bi kaş û bi rizde ne
Kûvî tê de digerin;

kûvî ji mêj ve
Nêzenasê gir-rik û evîna me ne.

Di hembêza Firat û di paşila Dîclê de
Deşt;

ta çav ji çava biniqînin rast
Rast hene; tê de asik diçêrin,
Bê paxava ji benderihêk
Hespên me yê beza tê de digerin.

Di hembêza Firat û di paşila Dîclê de
Milkek heye li raser esmanekî bêdawî
Li kadîza wî stêrkin hene
Navên wan ji beriya b' hezarên salan
Me danî
Û ew
Bi delalî
Diçirisin.

Rojen Barnas

Mîr Kamiran A. Bedir-Xan

Rojan Hazim

Gava Firat Cewerî, ji bo kovara NÛ-DEMÊ pêşniyara ji nû ve weşandina birek ji pêşgotina rojnama Stêr ya li ser Mîr Kamiran kir -Stêr, çapa nû, *Weşanxana Xanî & Bateyî, 1992 Danmark-*; me careke di çav lê gerand ku hindê kêmasiyên zimanî serast bikin. Lê belê, xûya bû ku ji paragrafa "Portreya Kamiran Ali Bedir-Xan, -rûpel 12- " destpêkirin dê tevayîya nivîsarê kem bike. Lewma, me ji navbira "Birayên Bedir-Xanî: Mîr Celadet û Mîr Kamiran" destpêkir. Ya rastî jî heke mirov bixwaze taybetî li ser Mîr Kamiran jî binivîse, heta mirov li ser Mîr Celadet çend gotina neke mirov nikare yekser derbazî ser gotina Mîr Kamiran bibe. Jiyan van herdu bira ji gelek aliyan ve pêkve girêdayî ye. Vêca bi kurtî jî be; em dê ji gotina "li ser herdu bira" dest pê bikin û paşê jî gotinê bi firehî binin ser Mîr Kamiran.

Birayên Bedir-Xanî: Mîr Celadet û Mîr Kamiran

Binemaleke jîr, kêrhatî, rûspî, serbilind, dilêr; xwenda, têgihîştî, zana; û digel hinde xasyetên herî baş û qenc derece yêk welathez û parêz... (Têkçûyîn û xwe berze kirina hindê kesên vê binemalê, bi giştî xasyeta baş ya vê binemala ku di her keysî da ji bo

Kurdistaneke serbixwe serhildane, xirab nake û herweha sihê li kiryarên welatparêz yên binemalê jî nake.)

Binemala Bedir-Xaniya, binemaleke boş, mezin û fireh e. Nifûsa vê binemalê temerî gundekî adetî yê Kurdistanê dike...

Lê belê, îro danîna dara secera binemala Bedir-Xaniya gelek dijwar e. Ji ber ku ev binemale di serî da ji aliyê dewleta Osmanî û paşê jî îdara Jontirka û dawiyê jî ji aliyê hûkmeta Kemalîst ya dewleta Tirkîyê ve hate belav û derbeder kirin... Endamên jîr û kêrhatiyên vê binemalê berbelavî rojhilata navîn û Ewrupeyê bûn. Paşnavê yên li Tirkîyê mayî hate guhartin û gelek neheqî lê hatin kirin. Bi kurtî dewleta Osmanî û paşê jî ya Kemalîst hemû zulm û teda kir ku nav û dengê vê binemalê bête birandin û ji bîr kirin... (*Piştî weşandina nû ya rojnama Stêr ji aliyê me ve; nivîskar û lêkolîner Malmîsanîj pirtûkek li ser binemala Bedir-Xaniya bi tirkî weşand. Li ser binemalê hindê agahdariyên fireh hatine dan... Navê pirtûkê: "Cizira Botanli Bedirhaniler" e. Weşanên Apec, Swêd 1994*)

Kamiran A. Bedir-Xan li ser bapîrê xwe Bedir-Xan Paşa wisa gotiye: "Li gor gotina 99 zarokên bapîrê min hebûne... Lê ev tişt baş tê zanîn; gava wî wefat kir, 21 law û 21



Kamiran Ali Bedir-Xan

keçên wî dijiyan. Min bi xwe 15–16 mam û ewçend jî metên xwe nasîn.“ Berbang, hj. 7/90, r. 11). Di nivîsara Aharon Cohen da jî behsê 95 zarokên Bedir-Xan Beg tête kirin... (*Stêr, çapa nû, r. 18-21, Weşanxana Xanî & Bateyî, 1992, Danmark*)

Pêşiyê binemalê, Mîrê Cizîra Botan, Mîr Bedir-Xan e. Bedir-Xanî ji eşîra Ezîzan in... Di navîna sedsala 19an (li salên 1843–46) dijî ororîta Osmaniya serî hildan û serê wê Bedir-Xan Paşa bi xwe kişand... Lê belê, serneketin û ji aliyê dewleta Osmaniyan hatin mişext kirin û midehekî dirêj li giravê Gîrîtê man... Di dîroka têkoşîna şoreşa Kurdistanê da serhildana 1843 ya Bedir-Xan -ku ji Musil heta Diyarbekir, Wan, Hekarî û heta nêzikî Urmiye û Mahabadê axeke fireh ji dijmin rizgar kiribû- cihekî girîng digre...

Piştî pêşiyê binemala Bedir-Xaniya, Mîr Bedir-Xan; gelek endamên vê binemala welatparêz û têkoşer jî tevî bizava rizgarîxwaziya gelê Kurd bûn û rolên girîng û pêşeng leystin...

Pêşengên serhildana 1879–ê kurên Mîr Bedir-Xan, Osman û Hûsên Kenan Paşa bûn. Herweha Mîthed û Emîn Ali Bedir-Xan jî serokên serhildana 1889–ê bûn...

Mîthed Bedir-Xan digel birayê xwe Evdîrehman rojnama pêşîne kurdî “Kurdistan” sala 1898–ê li Kahîrê derxistin...

Bi kurtî gelek endamên vê binemalê di xebat û têkoşînên ser û navîna sedsala bîsta da bi aktîvî cih girtin...

Endamekî vê binemalê, babê Kamiran, Mîr Emîn Alî jî kurê Mîr Bedir-Xan e. Emîn Alî Beg hem awukat hem jî çavdêrê dayra dadiyê bû... Birayê Kamiran yê me-

zin Sureya jî awukat û nivîskar bû. (*Di pirtûka Malmisanîj ya li ser binemala Bedir-Xaniyan da tête gotin ku Sureya li Universita Stanbolê li Zanîngeha Çandiniyê xwendina xwe ya bilind timam kiriye: Cizira Botanli Bedirhaniler, r. 92, Apec, Swêd 1994*)

Kamiran A. Bedir-Xan, di binemaleke wisa zana û têkoşer da mezin û perwerde bû.

Helbet di vê pêşgotina kurt da li ser vê binemala mezin tiştne kûr û dûr nivîsin dijwar e. Eve bi serê xwe babetekî lêkolînî ye... Ji nav vê binemalê emê malekê nimûne wergirin û ji vê malê jî emê zêdetir li ser du bira: Mîr Celadet û Mîr Kamiran rawestin. Dawiyê jî em dê qisê pirtir bînine ser jiyan, xebat û kiryarên Kamiran Bedir-Xan... Hetta divê tiştêkî dî jî bînine bîra xwendevana ; li ser Kamiran Bedir-Xan jî ji ber ku agahdariyên heyî kêr in em dê bi kurtî sekinin...

Heta niha li ser Mîr Celadet hindêk tişt hatine nivîsîn lê belê, li ser Mîr Kamiran tiştên hatine nivîsîn (helbet yên ku me dît) gelek kêr in...

(Di Ansiklopediya Îslamî ya bi zimanên Îngilîzî û Fransî da kurteştûnek li ser Sureya û Celadet hatiye nivîsîn lê belê, behsê Kamiran nayê kirin... -Cildê B- Tenê di babeta çapemeniya kurdî da dema behsê Hawar, Ronahî û Roja Nû tête kirin, navê rojnama Stêr jî derbaz dibe û digel navê Mîr Celadet yê Mîr Kamiran jî tête anîn... -Cildê K- Lê belê, ev bende di Ansiklopediya Îslamî ya bi tirkî da nîn in...)

Wekî mirov li kar û xebata wan, kiryarên wan yên bi qedir û qîmet dinêre, hingê tête dîtîn ku tiştên li ser wan hatine nivîsîn

çend kê m in û ne têrker in... Halçî, diviya ku li ser van xebatkarên gel, lêkolînên fireh û têrker hatîban nivîsîn ku xwendevan ji wan û kiryarên wan yê giranbiha haydar bibûna. Lê belê, dîsa ev erke li ser milên lêkolîneran e ku pê rabin...

Li ser kar û xebata Mîr Celadet jî bi serê xwe nehetiye sekinîn. Digel ji nû ve weşandina berhemên wan yê biqîmet wekî; Hawar, Ronahî, Gramera Kurmancî, kurtejiyanname û çend agahdariyên dî hatine nivîsîn. Herweha di hindê rojname an jî kovarên kurdî da; wekî Berbang û hindekên dî çend "meqalên" kurt hatine weşandin. An jî di xebatên zanyar û lêkolînerên kurd yê navdar wekî Profesor Qanatâ Kurdo û Mehmed Emîn Bozarslan (Jîn û Tarîxa Edebiyata Kurdî) bi kurtî ji wan hatiye behs kirin. Li ser Mîr Kamiran ji xwe ewqas jî nehatiye nivîsîn...

Bi firehî binemala Bedir-Xaniyan li aliyekê ; lê belê taybetî jiyan, kar û xebata van herdu bira –Celadet û Kamiran– hêjayî lêkolînên kûr û fireh e. Xebata Mîr Celadet û Kamiran cihekî girîng û herweha taybetî heye di dîroka zanyarî, edebî, çandî û hetta siyasî ya gelê Kurd da... Lewma heke em di nav kiryarên baş yê bi firehî binemala Bedir-Xaniyan da tixûbekî kîvş danine ber xebata van herdu birayên dilsozên gel û welatê xwe, neheqî nabe û di cih da ye...

Xebata hevdemî ya herdu bira

Mîr Celadet û Mîr Kamiran bi kapasîta xwe ya zanyarî û bi giştî ronakbîriyê ve di rêz û standarda Ewropîyan da bûn. Mirov dikare bêje ku herdu jî ji hemû aliyan ve anku komple zana bûn. Hem li ser xwen-

dina xwe ya hiqûqê xwedî kariyera akademîk bûn hem jî ji aliye zimanzaniyê ve jî adeta otorîte bûn. Têr û tijiya wan ya edebî û çandî û hetta siyasî jî ji xwe bi serê xwe dergehekî zanîne bû. Lê belê, milekî wan yê herî pêş û ber bi çav jî rojnamevaniya wan bû.

Xwediyên rojnamevaniya kurdî ya klasîk û modern jî ji xwe endamên vê binemalê ne. Birayên Bedir-Xanî Mîkdat Mîdhet û Evdirehman sala 1898ê li Kahîrê bi destpêka rojname Kurdistan gava pêşîne rojnamevaniya kurdî avêtin. Vê gavê, derî li rojnamevaniya kurdî vekir û xebata pratîk ya rojnamevanî û bi giştî çapemeniyê bi geşbûnî dom kir... Xebata moderne pêşketî ya rojnamevanî û bi giştî çapemeniya kurdî jî dîsa du birayên Bedir-Xanî, Mîr Celadet û Mîr Kamiran di navbera salên 1932 û 1945ê da bi weşandina Hawar, Ronahî, Roja Nû û Stêr û gelek pirtûkan gihandin dereceyêke bilind... Mîr Celadet û Mîr Kamiran jî herwekî Mîkdat û Evdirehman, rojnamevaniya xwe di xizmeta hişyar kirina gelê Kurd û hûkariyê zimanê kurdî da bi dilekî pak bi kar anîn... Em dê ber bi dawîya vê nivîsarê ve çend pasajan ji wan nivîsarên dilpakîya Mîkdat û Evdirehman Bedir-Xan û yek-du meqalên Mîr Celadet û Mîr Kamiran wekî nimûne bidin.

Di kar û xebatên herdu birayan da hev û du timamkirinek xûya ye. Birayê mezin Mîr Celadet bi zanayî û tecruba xwe li pêşiyê ye. Mîr Kamiran jî bi jîrî û zanîna xwe mil bi milê birayê xwe ve ye. Ew hem di warê zanyarî, çandî û edebî da hem jî di warê siyasî da bi hev ra ne û hev û du timam dikan. 1919ê herdu bira -Mîr Celadet

û Mîr Kamiran- û Ekrem Cemîl Paşa digel berpîrsiyarekî Îngîlîz -Nowel- ji ser Kextayê (Kolik) ber bi Meleyê ve diçin ku dijî dewletê haziriya bizaveke nû bikin... Ev hevrayiya wan taybatî di demê Xwebûn (Xoybûn) -1927- û piştî Xwebûnê, di demê weşandina Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr û gelek karên dî yên çapemenî da jî bi xurtî tete dîtin. Eve nişa dide ku ew ji bilî biratiyê, hevrêyên têkoşênê jî bûn...

Zimanê kurdî bi xebata van herdu bira pêşket. Di serê her tiştî da danîna alfabeja latînî digel hevkarîya Mîr Kamiran, xizmeta sereke ya Mîr Celadet bû. Bi vê yekê goreyî famîlyaya Îndo-Germen renegekî hev-demî dane zimanê kurdî. Bi amade kirina gramerê, zimanê kurdî li gorî form û metodolojiya zimanên Îndo-Germen, gihandin standardeke hevdem û navnetewî... Ji bilî vê xebata zanyarî û teorîk; bi karê weşan û çapemeniyê, ziman hem di warê pratîkê da bi kar anîn û hem jî ji aliyê bêje û gotina ve zengîn kirin û pêşve birin... Di xebata wan ya zanyarî, edebî, çandî û hetta siyasî da, ji bilî berhemên wan yên wekî pirtûk hatine weşandin, kovarên Hawar û Ronahî; rojnameên Roja Nû û Stêr bi serê xwe abîde ne... Rûpelên van weşana bi lêkolînên li ser ziman û gelek babetên dî yên siyasî û civakî, çîrok, helbest, serpêhatî, wergêr û meqalên dî ve têt û tijî ne. Ev berhemên biqîmet îro di warê hûkariya ziman û çandî da, bûjenên herî girîng in di destên xwendevan, lêkolîner û nivîskarên Kurd da...

Portreya Kamiran Ali Bedir-Xan

Neviyê Mîrê Cizîra Botan Bedir-Xan Paşa

û kurê Mîr Emîn Ali Bedir-Xan,

Kamiran Ali Bedir-Xan, 21-ê Tebaxê sala 1895-ê li Suriyê hatiye dinyayê. (Li ser cihê bûyîna Kamiran Bedir-Xan du agahdariyên ji hev cûda hene. Di pêşgotina çapa nûyî Roja Nû (*Weşanên Jîna Nû, Swêd 1986*) û lêkolîna Mahmûd Lewendî da -Rojname, hj. o, Stanbol 1991- tete gotin ku li Stanbolê hatiye dinyayê. Lê li gorî nivîsara Aharon Cohen, Kamiran Bedir-Xan 1894-ê li Suriyê bajarê Jarablosê hatiye dinyayê. (*Stêr, çapa nû, r. 19, Weşanxana Xanî & Bateyî, Danmark 1992*). Gelo kîjan rast e? Eve jî bi serê xwe pîrseke!. Lê belê, me ev yeke ji xwendekara Mîr Kamiran, Profesora Joyce Blau'yê pîrsî. Joyce Blau'yê got ku bi esehî cihê bûyîna wî nizane lê belê, bi texmîneke xurt li Suriyê hatiye dinyayê. Ev agahdariya Joyce Blau'yê tespîta Aharon Cohen ya "cih" dirastîne. Lê wekî sal bi gotina Joyce Blau jî li sala 1895ê hatiye dinyayê. Diyarê ku agahdariya Aharon Cohen ya di derheqê salê da şaş xûya dike. Anku ne 1894, 1895 e sala bûyîna Mîr Kamiran Bedir-Xan... Di gelek nivîsînên kurdî da sala bûyîna Mîr Celadet jî wisa şaş hatiye nivîsîn. Di pêşgotina Hemreş Reşo ya çapa nûyî Hawarê da -1975, Elmanya- sala bûyîna Celadet 1897 hatiye dan. Herweha di pêşgotina weşanxana Jîna Nû ya çapa nûyî Ronahî jî da -Swêd, 1985- sala bûyîna Celadet 1897 hatiye nivîsîn. Li gorî sala bûyîna Mîr Kamiran -1895- nivîsîna sala bûyîna Mîr Celadet wekî 1897 şaş e. Ji ber ku Mîr Celadet birayê mezinî Mîr Kamiran e... Me ev yeke jî ji Joyce Blau pîrsî û li gorî gotina wê jî sala bûyîna Mîr Celadet 1893 ye.)

(Joyce Blau, di pêşgotina pirtûka Malmîsaniyê ya bi navê "Cizira Botanî Bedirhanîler, -r. 7-" da cihê bûyîna Mîr Kamîran Şam ni- vîsiye... Axir ca an Jarablos an jî Şam be, herdu jî bajarên Suriyê ne. Tiştê xûyayî ew e ku Mîr Kamîran li Suriyê hatiye dinyayê!)

Wî xwendina xwe ya sereta û navînî li Stanbolê timam kir. Digel birayê xwe Celadet ji bo xwendina bilind çû (1922) Elmanya û di zanîngeha hiqûqê da xwend. Kamîran Bedir-Xan doktora hîquqê jî li Leipzigê wergirt û vegerya rojhilata navîn ku kar û xebata ji bo gelê xwe di cihêkî nêzikî Kurdistanê da bike. Pêşiyê li Şamê digel birayê xwe'y mezîna Mîr Celadet tevî karê weşana Hawar û Ronahiyê bû. Paşê jî çû Beyrudê digel karê awukatiyê dest bi weşandina rojnamên Roja Nû û Stêr kir...

1947-ê çû li Franse bi cih bû û di zanîngeha Sorbonnê beşê Zimanên Rojhilatê da dersên zimanê kurdî dan... Di vê xebata hûkariyê da bû profesor. 4-ê Kanûna (Çilê pêşîn) sala 1978-ê li Parisê mir...

Kamîran Ali Bedir-Xan, sala 1954-ê bi Nathalie d'Osovetzky ya Polonî ra zewicî bû. Jina wî jî berî wî, sala 1975-ê miribû...

Kamîran Ali Bedir-Xan ji bilî Kurdî; Tirkî, Erebî, Farsi, Elmanî, İngilîzî û Fransî jî dizanî...

Xebat û têkoşerîya Kamîran Ali Bedir-Xan

Kamîran Bedir-Xan, hêj di 17 saliya xwe da bû leşkerê ertêşa Osmanî û çû ser çeperên şerê Balkan. Piştî şer û di nav mercên hilweşîna Împaratoriya Osmanî da xebata ronakbîr û siyasetkarên Kurd li Stanbolê geş bû. Kamîran Bedir-Xan jî tevî van xebata

bû. Hêj di xortaniya xwe da karên giran hildan ser milên xwe. Di xebata Cemiyeta Tealî ya Kurd û weşana Jînê da cih girt. Di kovara Jîn (hejmarên 3. û 9.) û rojnama Serbestî da nivîsî...

Piştî fermana dewleta nû'y Tirkîyê digel birayê xwe Celadet ji bo xwendina xwe'y bilind çû Elmanya. Paşê jî hate Suriyê û milê xwe da ber milê bira û hevalê têkoşînê Celadet û di damezrîn û têkoşîna Xwebûnê (Xoybûn) da cih girt. Piştî şkestina serhildana Agiriyê dîsa digel Celadet, kovarên Hawar û Ronahiyê derxistin... Bi hevkarîya Mîr Celadet rojnamên Roja Nû û Stêr li Beyrudê weşandin...

Ji 1947 heta 1978ê li Parisê di zanîngeha Sorbonn beşê Zimanên Rojhilatê da dersên kurdî dan û bû profesor û serokê vê beşê... Bi dehan pirtûk û nivîsar li ser ziman û hûkariya kurdî bi kurdî û fransî nivîsîn... Di ber ra jî xebata siyasî û danenasîna bizava gelê Kurd kir... 1948ê çû Amerîka Yêkbûyî û notayek (memorandum) li ser rewşa giştî ya Kurda da sekreterê giştî yê Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî... 1949ê Navenda Lêkolînên Kurdî damezrand û bulteneke informasyonê di derheqa Kurdistanê û gelê Kurd da weşand û xebateke mezîna kir...

Di navbera salên 1961-75ê da digel têkoşîna Kurdistana Başûr û serok Barzanî peywendiyêke xurt danî û wek nimayendeyekî siyasî û dîplomatîkî xebatên hêja anîn cih. Sala 1970 digel jina xwe seredaniya Kurdistanê jî kirin û midehekê li wê derê man...

Lewma ew hem zanyar bû, lê ew herweha jî siyasetkarekî aktîv yê bizava rizgarîxwaziya gelê Kurd bû. Wî digel xebata zanîyê ev aktivîta xwe'y siyasî jî bi awayê dip-

lomatîkî û gelek bi serfirazî heta mirina xwe domand...

Hindek berhemên Kamiran Bedir-Xan yên çapbûyî ev in:

1. Elfaba min, Çapxana Hawarê, Şam 1938, 32 r.
2. Langue Kurde, Paris 1953, 253 r.
3. La Question Kurde, Paris, 1959
4. Destpêka Xwendinê, Paris 1971, 165 r.
5. Çarînên Xeyam
6. Dilê Kurên Min, Kitêbxana Hawarê
7. Xwendina Kurdî, Kitêbxana Hawarê, Damascus 1938
8. Dersên Şerîfetê, Kitêbxana Hawarê
9. Proverbes Kurdes (Metelokên Kurdî) Lucy Paule Margueritte û Kamiran Ali Bedir-Xan, Paris 1937
10. Le roi du Kurdistan (Qralê Kurdistan) Kamiran Ali Bedirxan û Adolphe de Falgerolle, Paris 1937
11. Der Adler von Kurdistan (Eyloyê Kurdistanê) Kamiran Ali Bedir-Xan û Herbert Örtel, Berlin 1937
12. Der Schnee Des Lichtes (Befra Ronahiyê) Şe'rên Kurdî, Kamiran Ali Bedir-Xan û Dr. Curt Wunderlich, Berlin 1937
13. Edirne Sükûtunun İç Yüzü, Kamiran Ali Bedir-Xan – Celadet Ali Bedir-Xan, Çapxana Serbesti
14. Le Dossier du Kurdistan du Sud (Dosya Kurdîstana Başûr) Paris 1971
15. Fêrbûna Xwendina Kurdî, 1968 Paris, 61 r.
16. Türkçe İzahli Kürtçe Gramer, çapa duyemîn, Stanbol 1977, Weşanên Özgürlük Yolu, 60 r.
17. Zimanê Mader, La Langua Maternel-

le, alphabet et lectures Kurdes, Paris 1965

18. Zimanê Kurdî – Gramera Kurdî – Tirkî, Dr. Kamiran Ali Bedir-Xan û S. Şivan, Weşanên Kawa, Stanbol 1976

19. Nivîsa Min, mon livre cours pratique de la langue Kurde, Paris, 1965

20. Livres scolaires Kurdes, Damas 1937

21. Le calveire du Kurdistan (Helbestên Fransî), Paris, 26 r.

22. Ji Tefsîra Qur'anê, Paris 1971, 81 r.

23. Le Kurde Sans Peine, Paris 1989, Institut Kurde De Paris, 208 r.

Ferhenga bi Kurdî–Fransî û Fransî–Kurdî amadekirî, pirtûka Çar «ncil û gelek nivîsar, çîrok û notên di yên Kamiran Bedir-Xan hêj jî çap nebûne... (*Pêşgotina çapa nûyî Roja Nû, Weşanên Jîna Nû, Swêd 1986*)

Rojnamevaniya Birayên Bedir-Xanî di xizmeta têkoşîn û hişyar kirina gelê Kurd da

Gelek endamên binemala Bedir-Xaniya piştî şikestina serhildana Mîr Bedir-Xanê mezin jî dest ji têkoşîna rizgariya gelê Kurd bernedan û têkoşîn bi her awayî û bi rikeke xurt domandin. Di vê xebat û têkoşînê da amûreta rojnamevanî û çapemeniyê jî gelek bi hostahî bi kar anîn. Her meqaleyek wan çawa sûjinek bû di çavê dijmin da herweha çirîskeke ronahiyê bû di çavê mirovê Kurd da. Her rêz û hevokên nivîsarên wan hawar û bangîn û herweha rika têkoşîna gelê Kurd bûn... Wan bi qelemê xwe hem şerê dijminên Kurdistanê dikirin hem jî şerê tarîtiya nezanan û nexwendina di nav Kurda da dikirin... Nivîsarên wan kana ronahiyê bûn...

Vêca li jêr em dê çend pasajan ji nivîsa-

rên Mîkdat û Evdirehman Bedir-Xan ji rojnama Kurdistan û du kurte meqalên Mîr Celadet û Mîr Kamiran jî ji rojnamên Roja Nû û Stêr raberî we xwendevana bikin. Hindî Mîkdat û Evdirehman Bedir-Xan in, mirov dikare bêje ku pêşeng û nîmayendên rojnamevaniya klasîke kurdî bûn. Lê Mîr Celadet û Mîr Kamiran pêşengên rojnamevaniya moderne kurdî ne. Lê belê, herdu ref bira jî çawa dijî dijmin têkoşîne herweha ji bo hişyar kirin û têgihandina gelê Kurd jî bi dilsoziyeke herî bilind xebitîne û têkoşîne... Ji xwe ev çende di naveroka nivîsarên wan da baş xûya dibê... Me jî xwast vê mexseda wan ya hevpar bidin ber çavan...

Mîkdat Mîdhet Bedir-Xan di hejmara pêşîne rojnama Kurdistan da armanca vê xizmeta xwe'y rojnamevaniyê wisa aniye ziman:

"... *Heyfa min têt ji Kurda re. Kurd ji gelek qewma zêdetir xweyhiş û zeka ne, camêr in, dînen xwe da rast û qewî ne, xurt in; û dîsa weke qewmên dî ne xwenda ne, ne dewlemend in; dinyayê da çi dibe... nizanin. Loma, rêya Xwedê de min ev cerîdeya ha nivîsî... Navê vê min kiriyê "Kurdistan".*

Vê cerîdeyê de ezê behsa qenciya ilm û marîfeta bikim; li kîderê mirov dielime, li kîderê medrese û mektebên qenc hene, ezê nîşa Kurda bikim..." (Kurdistan, hj. 1, r. 3-4, wergera M.E. Bozarlan, c.1, r. III-III2)

"... *Ez rêya Xwedê de dixebitim. Min ev cerîde çêkir, vê rê de ez gele pera serf dikim, zehmetê dikêşim. Mexseda min qenciya Kurda ye...*" (Kurdistan, hj. 1, r. 8, w. MEB, c. 1, r. II6)

"... *Gelî mîr û axano, kurmancno! Qenc*

bizanibin xwendin, ilm û marîfet, dinya û axretê rûyê mirov sipî dike, mirov muhtacê tu nabe. Rêya Xwedê de, paş nuho zarîyên xwe bielimînin ilm û marîfeta! Hûn bi xilqeta xwe mêrxas û cesûr in. Heke hûn bibin xwey ilm, hûnê ji dinê hemiya xurttir, dewlemendtir bibin..." (Kurdistan, hj. 4, r. 6-w. MEB, c. 1, r. 150)

Mîkdat Mîdhet Bedir-Xan piştî hejmara 5. ya rojnama Kurdistan, kargêriya rojnamê hêla û zivirî Stanbolê. Piştî wî, birayê wî Evdirehman ji hejmara 6. pê ve bû berpirsiyarê rojnamê. Evdirehman Bedir-Xan jî di destpêkê da mexseda xwe wisa aniye ziman:

"... *Mehebbeta min a ji miletê min Kurmanca re, ez sewq kirim vê cerîdeyê de rêya qenc nîşanê Kurda dikim... Heyfa min têt Kurmanca re, ji miletên dî zêdetir xweyaqil, mêrxas in, ji hemî mileta paşvetir mane.*

Min ji kerema Xwedê teala hêvî ye, paş nuho Kurd jî aqilê xwe binin serê xwe, ji wê xewa giran hişyar bin, ew jî xwey ilm bibin, bi qeweta aqilê xwe bixebitin, ji miletên dor xwe mezintir bibin..." (Kurdistan, hj. 6, r. 7, w. MEB, c. 1, r. 179)

Dema Roja Nû dest bi weşanê dîke ji Mîr Celadet sermeqaleyek têtê xwastin. Mîr Celadet jî bi navê "Merhele" bîr û bawerîya xwe wisa tîne ziman:

"*Di jiyîna miletan de merheleyin hene û miletê ko (Mîr Celadet û Mîr Kamiran li şûna "ku", "ko", şûna "hûn" jî "hon" bi kar anîne. Nota me.) dixwaze bigehe tekûzî û medeniyetê û wan li xwe bike, jê ra divêt bide rêya wan merhelan û bi wan ra derbas bibe. Gelo miletê Kurd daye pey wan merhelan û heke daye îro gihastiye kêjanê.*

Delaletên heno ko mîletê me berê xwe daye vê rêyê û bi gavine giran, bi gavine giraniyê tê re diçe.

Heye ko hon bibêjin ji mîletê me re, ji mîletekî bişûndemayî re, ne gavine giraniyê lê gavên çargaviyê gerek in, da ko ew xwe di ser merhelan re zer bike û rojkê berî rojekê xwe bigehêne mîletên ko di vê bezê de, jê derketine û ew bi şûn de hiştine û ji ber vê bişûndemayîne mîletê me bindestiya wan dike û em bûne rajorên wê. Heke we holê got em jî be we re ne. Lê ev, tiştê gerek e û tiştê gerek xwerû daxwaz e; û ne tiştê destxistî ye...

Daxwaz û Tiştê Hazir

Belê daxwaz ev e, lê tiştê hazir û mewcûd bi awakî din e û silaw li sifra hazir e. Berî sê sed salî Ehmedê Xanî nav di mîletê xwe dida û digot;

*Enwa'î milel xudan kitêb in
Kurmanç bi tenê di bê hesab in.*

Herçî Evdilqadirê Koyî, di pey Xanî re û berî 50-60 salî, gava temasa dinyayê dikir û didît ko her tiştên dinyayê guhêrîne û ji xwendinê re jî awayime nû çêbûne û bi tenê, bi xwendina medresan berê Kurdan naçe serî; dinalî û digot:

*Le dewrî ême roman û cerîde
Egerçî meqsed e zimanî baw e.*

Belê Xanî digot "Bixwûnin"; Koyî li gora wextê xwe, bi ser vê zêde dikir û digot: "Bi awayê nû bixwûnin". Lê me ne xwend, gelo çire?

Ji ber ko mezin û bîrewerên kurdan men-

fehêtên xwe ên şexsê di ser menfeheta mîlet re girtine; ev mîletê belengaz wek kerikî pez dane ber xwe, ew dotine, ji şîrê wî rûn û mast û penîr, ji hiriya wî xeftanine teylesan çêkirine. Xwedê gunehên wan bixefîrîne. Tiştê ko yar û mezinên me kiriye ev e. Lê rojekê derba neyaran em hişyar kirin. Bi vê derbê me bîra her tiştî bir. Me zanî ko xweseriya me, di zimanê me de ye û em bi tenê bi hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê xwe û bi parastina wî, di civata mîletan de, wek miletekî xweser dikarin bijîn û payedar bibin. An ne em ji dara heyîna mîletên çarnîkar re dibin xuşkî, di rayên wî de digerin û wê xurt dikin. Ji ber ko em bi xesletên xwe ên tebiî ji wan xurttir, zeximtir û paqijtir in. Şûr bi qenciya polayê xwe dibire û diçirise. Lê pola tê de winda ye; nav navê şûr û yê xwediyê wî ye.

Belê, me her tişt bîr biriye û îro gava em li hev digehin hev, bi ax û nalîn, ji hev û du re dibêjin:

"Bavo! li dinyayê ji me kêmtir kes ne maye. Heçî mîlet hene tev de bûne dewlet û hikûmet, xudan kitêb û dibistan. Bi tenê em, mîletê kurd; bi şûn da mane; reben, feqîr, nezana, belengaz, di destên xelkê de lehîstok. Xelkê hevsara me kiriye destê xwe, li gora kêf û mesleheta xwe berê me ji bakur dide nîvro, ji roavê dide rohelê. Ji lewre divêt em jî bixebitin xelkê xwe hîni xwendin û nivîsandinê bikin, berê wî bidin tav û ronahiyê.

Li ser vê gotinê jî em yek in. Lê...

Kirin û Gotin

Lêbelê, ji ber ko kirin û gotin ne birayê hev in, di dema kirinê de; destekî xedar me ji hev dike.

Wextê gotinê ye. Em sed peyan in. Di gotinê de em ji hev derdikevin...

Ştexalî li ser "divêtê" ye. Divêt holê bikin; divêt holê bête çêkirin. Ji vî sedî her yek ji ê din xurtir û zeximtir e. Wextê kirinê ye. Ji wî sed peyayî ancax deh peya mane. Ma çire?

Niho ezê rê bidim peyayên ko ji kirinê xwe dane paş. Ew du sebaran şanî me didin û dibêjin:

1. Tu tişt ji min nayê, ma xwendina min jî çi ye ko ez bikarim bi kêr bêm...

2. Ma tu nabînî, herkes neyarê kurd e. Tukes arîkariya me nake. Siyaseta dewletên ewropayî ên mezin hero bi awakî ye. Ji bo xatirê milletên din rûyê xwe ji me badane.

Niho em li wan vedigerînin û dibêjin: Di xebata me ya îro de heçî divê û di xwe re dibîne dikare bi kêr bê.

Çawan?

Bi hînbûn û hînkirina elfubeya me. Yê ko bi sih û yek tîpên kurdî dizane, ew kes mamosteyek e. Ji xwe tiştê ko îro ji me re divêtin mamoste ne, mamosteyên gerok yê ko tîpên me di nav millet de belav dikin, xelkê hîni xwendin û nivîsandinê dikin.

3. Rast e ko siyaseta dewletên mezin hero bi awakî ye û gelek caran ew siyaseta ne bi daxwaza me ve ye. Bivê nevê ew siyaseta bi me re biwa karê me gelek hêsantir dibû û wî karî zûka fêkiyê xwe dida. Lê rexma ko ew siyaseta ne bi me re ye, wê siyaseta tucarana xwendin û nivîsandina zimanê me bend ne kiriye. Heye ko nimînendeyên wan dewletan nav di me dane û gotine: Bixwînin û xelkê bi xwendin bidin.

Heke em li hêviya arîkariya dewletan mane Xwedê dizane ew arîkarî kengê têt. Heye ko yekcar nayê. Ji lewre û herwekî medhelokê

gotiye. Şêr bi lepê xwe, Şêx Adî nayê hawara te.

Herçî merhela ko em îro têt de ne, merhela "a" û "bê" ye. Lê heke me dil kir, em di vê merhelê re zû dikarin derbas bibin. Ji ber ko hînbûna a û beyên me, ji mehekê bêtir najo.

Xwendevanên Delal

Halê me kurdmancan ev e. Û êdî sûc ne yê beg û şêx û axalera, lê yê minewera e. Ji lewre em gazindên xwe ji wan dikin. Herçî beg û axeler heke ew bixwazin jî, li ber xebata minewera rabin, nema ji wan têt. Ji xwe birekî wan hevalên minewera in û bi wan re li hişyariya millet dixebitin.

Mîna Mela Enwerê ko li Amediyê sûxteyên xwe hîni tîpên kurdî dike.

(Celadet Alî Bedir-Xan, Roja Nû, hj. 1, r. 1-2, Gulan 1943)

Mîr Kamiran A. Bedir-Xan jî di sermeqaleyeke Roja Nû ya û bi navê "Em Çi Dixwazin" da wisa nivîsiye:

"Di dinyayê de, da'wa, daxwaz û mirazî ne rast û ne rast, heq û ne heq hene.

Dilê mirovan zehf tiştan dixwazin û gelek caran daxwazker bawer dikin ko da'wa wan heq e û yê ko pê qail na bin, neheqiyê li wan dikin. Gelo da'wa me a kurdan çi ye û têt de daxwazî ne rast hene an ne? Kurdan ev tişt zehf caran dane eglê xwe û neh milyon kurd qail in ko da'wa wan rast û heq e.

Kurd gava karê welatê xwe didin eglê xwe, qeydeyên heq û medeniyetê, bendên kewneyên navnijadî tînin pêş çavê xwe û li gora wan qeyde û bingehan seh dikin ko daxwaza wan heq e. Ev qeydeyên he, li ser heyî û hêbûn û danîna hikumeta û gerandina karên

wan çî dibêjin?! Emê çavê xwe berî her tiştî li destûrên ko miletên pêşkevî, miletên Ewropa û Emerîkayê danîne bigerînin.

Destûrên mezin û bingeîn yên ko bi pîrsa me ve girêdayî ne ev in:

1. Beyana Inqilaba Frensiyê a mezin li ser heq û kewneyên mirovan.

2. Çardeh Şertên Serekcimhûrê Emerîkayê Mr. Wilson.

3. Qanûnên civata Miletan.

4. Şertên Etlentîkê.

5. Qeydeyên ko Hikûmeta Sovyetistanê danîne.

6. Ehidnameyên Navnijadî.

7. Gotarên Serekcimhûr û Serekdewletên Hevalbendan.

Li gora ev heftî esasên bilind û qedirgiran miletên ko xwediyê erdê xwe ne, divê li gora daxwaza xwe ji xwe re hikûmetekê deynin û karê hikûmeta xwe, bi destê xwe bigerînin.

Ziman, xwendegah û dibistan, kovar, rojname, kitêbên her miletî serbest in.

Baweriya miletan serbest e, her kes dikare ji xwe re dînê ko jê hez dike bibijêre û kes nikare têkilî baweriya kesekî bibe.

Xelk divê di mal û welatê xwe de, bê tirs û bi rahetî rûnin.

Azahî û serbestî bê dewlemendî çê nabe; divê pêşiya miletan de deriyê xebat û pêşveçûnê, deriyê dibistan û xwendegahan, destgeh û febrîqan vekirî bin.

Zaroyên her miletî, divê di dibistan û xwendegahên xwe de, hîni zimanê xwe bibi; tu ziman ji ê din ne çêtir e, ji hemî zimanên din şirîntir û çêtir e.

Heqê ne tu miletî ye ko zimanê xwe bi zor û zorkerî ji zaroyên miletên din re bide elimandin. Ji xwe gava miletek dike bi zor zi-

manê xwe têxe şûna zimanekî din, jê qesda vî tu cara ne xeyr e, pîsîti û bêbextî ye, zilm û te'da ye.

Qeydeyên jorîn, bi awakî zelal, pêşçavan dikin ko daxwazên me li gora hemî qeydeyên danî heq rast in.

Ma neh milyon kurd çî dixwazin? Qesda wan ev e ko xwediyê erdê xwe bibin û li gora daxwaza xwe hikûmetekê deynin û karên vê hikûmetê bigerînin.

Zaroyên kurd bikevin dibistan û xwendegahên kurdî, hîni zimanê xwe bibin; bibin xwedî ilm û hiner, hêja û bi kêr hatî. Miletê kurd ji bona azahî û serbestiya xwe her fîdakariyê kiriye, mal û canê xwe da ye û ji ber vê yekê jî, bi heyranî û bi dilekî germ, qedrê mîrxas û camêrên dinyayê digire; yên ko ji bo azahiya welêt û cîhanê, ji bona serbestiya hemî miletên mezlûm û heqşkêrandî, şerê zalim û zorkeran û bêbextan dikin.

Kurên Frensiyê, Ingilistanê, Sovyetistanê, Emerîkayê û hemî miletên Hevalbendan, çî biçûk, çî mezin ev pênc sal in, ji bona dinyayeke çak xwûna xwe direjînin, ev di dilê me de xwedî cih in, xwedî meqameke mezin in û em dixwazin mîna wan xwe birijînin û arîkariya wan bikin.

Em minêkar in ko ev fîrset bikeve destê me û bi vî awayî neh milyon kurd jî minetdariya xwe pêş wan şehîdên rêya azahî û serbestiyê bikin.

Me çavê xwe ber ne daye mal û welatê tu kesî. Heq û kewneyên her miletî, ji bona me miqedes in. Welatên Rohelatê navîn, bê saffîkirina pîrsa Kurdistanê, nikarin bigihin xweşî û kamiraniyê.

Em dixwazin bibin hevalê cîranên xwe, destbirayê cîranên xwe û bi vî awayî bi kêrî

nefs û millet û welatê xwe, dinya û axîreta xwe û cîhanê.

Ev e tiştê ko neh milyon kurd dixwazin."

(Ev sermeqale bê imza ye. Lê ji ber ku Xwedî û Gerinendê Roja Nû, Mîr Dr. Kamiran bû, ev meqale jî temsîla wî û rojnâme dîke. Paşê, têriya naverok û mesaja meqalê û ziman diyar dîke ku ev sermeqale ji destê Mîr Dr. Kamiran derketiye. Roja Nû, hj. 45, r. 1, Nîsan 1944)

Rastnivîsîna paşnavê "Bedir-Xan"îya

Li vê derê em dixwazin li ser rastnivîsîna paşnavê "Bedir-Xan"îyan jî bi kurtî rawestînin.

Ev paşnavê di nivîsarên biyanî û kurdî da wekî hev nayê nivîsîn.

Em çend nimûna bidin: Di hemû nivîsar û lêkolînên biyanî da wisa hatiye nivîsîn: "Bedir-Khan".

Lê belê, di piraniya nivîsarên kurdî da wisa tête nivîsîn: Bedirxan.

Celadet û Kamiran jî paşnavê xwe her wisa nivîsîne: Bedir-Xan.

Vêca gelo kîjan form rast e? Ev pirse di çarçova vê pêşgotinê da detay e, lê dîsa em dixwazin bi kurtî li ser bisekinin.

Wek ku tête zanîn, binemala Bedir-Xaniya ji malmîrekên qedîm in. Gotina "Mîr" unvanê binemalê ye ku wekî xasyeta "esaletê" bi kar tê. Di sîstema feodalîyeta Kurda da binemalên serdest ev unvane (Mîr, Beg, Xan, Axa) bi kar anîne... (Ji xwe dema lêkolîner an jî nivîskarên biyanî jî ji Bedir-Xaniya behs dikin, ew jî bi mana "Mîr" unvanê "Prens" bi kar tînin ku ev unvane jî yê hiyerarşîya monarşiyê ye.)

Wekî hemû malmîrekên di yê Kurdistanê binemala Bedir-Xaniya jî bi gelek unvanan hatine bang kirin. Digel unvanê "Mîr", "Beg" û "Paşa" jî bi kar anîne. Endamên binemalên "Mîrekan" ev xasyete daîm bi kar anîne ku ferqa xwe û xelkê bidîne xûya kirin. Ev xasyete ji bo wan her "imtiyazek" bûye di nav civatê da...

Lê belê, di nav malmîrekan da digel vî unvanî jî; yê welatparêz ku bo xelk û welatê xwe kar kirî, zulm, zor û zehmetî dîtî jî ne kêmtir in. Binemala Bedir-Xaniya nimûneyeke ji bo vê çendê. Di serî da pêşiyê binemalê Mîr Bedir-Xan bi xwe û gelek endamên binemalê (çendek xirab jê derketibin jî istisna qaydê xirab nakin) ji bo Kurdistanê serbixwe serî hildane, şer kirine û ji ber vê çendê jî zulm dîtine, ji welatê xwe hatine dûr kirin û bêdadiyên mezin lê hatine kirin.

Celadet û Kamiran jî wek endamên vê binemalê hem di nav civatê da hem jî di hemû kar û xebatên xwe'y çandî, edebî û siyasî da ev unvanê "Mîr" di pêşiya navên xwe da nivîsîne. Lê belê, wan çu cara ev unvanê xwe wekî nifûz û imtiyaz bi kar neanîne. Lê belê, paşnavê "Xan" jî li her derê gotine û nivîsîne. Ji xwe bi nivîsîna "Xan" wan jî daye xûya kirin ku ji binemala "Mîrekan" in...

Ji ber vê yekê jî xasyeta "Xan" li dawîya paşnavê xwe cûda û tîpa serî jî mezin nivîsîne... Anku heke "Xan" bi "Bedir" ra û bi tîpa biçûk bête nivîsîn, hingê mana tête guhartin û bala "esaletê" ya "malmîrekiyê" nayê kişandin. "Bedirxan" hingê dibe navekî rêzê û sade. Lê belê, Celadet jî, Kamiran jî "Xan" cûda û tîpa serî jî mezin nivîsîne

ku eve balkêşîneke mana esalet û mîrîtiyê ye...

Ev çende li aliyekê; lê divê paşnavê wan herwekî wan nivîsî bête nivîsîn. Gerçî nivîsîna bi awayê pêkve wekî "Bedirxan", nivîsînê bi gîştî gelek hêsan dike, lê wekî li jor hatiye gotin manayê jî diguhêre. Ji ber vê yekê, divê awayê orijînal bi kar bê: Bedir-Xan.

Çend nimûnên nivîsîna paşnavê Bedir-Xan:

Celadet û Kamiran di hemû nivîsarên xwe'y bi zimanê biyaniya -Fransî û İngilîzî- da paşnavê xwe wisa nivîsîne: Bedir-Khan. (Ji ber ku di van zimanan da tîpên -KH- dengê -X- didin). Di nivîsarên kurdî da jî Bedir-Xan nivîsîne. (Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr û gelekên dî).

Ji lêkolînerên berhemên Celadet; Hemreş Reşo di pêşgotina xwe ya çapa nûyî Hawarê da "Bedirxan" nivîsiye. Lê lêkolînerê dî yê Hawarê Mihemed Bekir ev paşnavê rast nivîsiye: Bedir-Xan... Nuredîn Zaza, Osman Sebrî, Qanatê Kurdo û M. Ermin Bozarslan jî her "Bedirxan" nivîsîne... Mehmet Uzun û Cemşîd Heyderî jî di nivîsarên xwe yê kovara Berbangê da û herweha Enstîtûya Kurdî ya Parîsê jî di nivîsên xwe da wisa nivîsîne. Tenê serokê Enstîtûyê Kendal Nezan di pêşgotina xwe ya gramera Kurmancî ya Mîr Celadet û Roger Lescot da (çapa tirkî) "Bedir Han" nivîsiye ku ev awaye -bi tirkî- rast e. Di gelek nivîsarên dî yê li ser Celadet û Kamiran da jî "Bedir û Xan her pêkve (Bedirhan) hatine nivîsîn...

Bi kurtî baweriya me ew e ku divê êdî

paşnavê wan camêra wekî ku wan nivîsî anku "Bedir-Xan" an jî "Bedir Xan" bête nivîsîn... Çiku ji xwe cûda nivîsîna "Xan" xû-ya kirina binyata "Xan û Beg"îtiyê ye ku ew jî Xan û Beg bûne...

Gotina dawiyê

Dil dixwast ku li ser raman, bawerî, xebat, têkoşîn û tevayî jiyana Mîr Kamiran Bedir-Xan lêkolîneke firehtir bikim. Lê belê, eve di çarçova tenge vê pêşgotinê da nedibû. Belê ev binemala birûmet û welatparêz û taybetî jî herdu birayên Bedir-Xanî -Mîr Celadet û Mîr Kamiran- hêjayî hemû rêz û qîmetan e. Wek Mîr Celadet, Mîr Kamiran jî hemû jiyana xwe di ber doza gelê Kurd û welatê xwe Kurdistanê da feda kir.

Kêm mirov hene ku hem malmîtek bin û hem jî di rêza xelkê sade da dîlnizm û rêzdar... Lê ev dîlnizmî û dilsoziye di her rêzên nivîsarên Celadet û Kamiran da têne dîtin. Ev yeke qedir û qîmetê wan zêdetir dike. Mîr Celadet jî, Mîr Kamiran jî di hemû nivîsarên xwe yê tîjî mesaj û şîret da, digel ragihandina pîrsa Kurd û Kurdistanê û kirina şerê dijî dijmin da, her parêzeriya gundî û hejarên Kurd kirine û gotinên herî tûj û dijwar dirêjî perasûyên axa û begên Kurdistanê kirine...

Li dawiyê em dixwazin pêşgotina xwe bi sermeqala Mîr Kamiran A. Bedir-Xan ya bi navê "Ma Ne Wilo Ye?" ku di hejmara dawî ya rojnama Stêr da hatiye weşandin, xilas bikin...

"Gotina çêtir ev e ko kurt û rast e. Pêşiya tu kesî de, pesnê wî ne din. Ko Armanca te rast e, hêvî tu ne be jî dest bi xebatê bike; ko te di vê de, pê da erdê, derî û dergê di pêşiya

te de, vedibin.

Gava qedrê yekî digirî, bine bîra xwe, ko tu jî mîna wî mirovek î; û xwe di pêşiyê wî de zirav me ke. Qedrê mirovên hêja tête girtin; û mirovên hêja, mirovên mezin in; lê ne hewce ye ko emê xwe bikin ebd û xulamê wan. Yê ko canê xwe hêj ne daye welatê xwe, divê dest ji xebata welêt me kişîne.

Xidmet û arîkariya feqîr û belengaza bikin; werin hawar û gaziya wan; xurt û dewlemend bi serê xwe dikarin îşê xwe pêk bînin.

Pir şîrîn me bin; xelk we daqurtîne; pîr tehl me bin; xelk we ji devê xwe davêjin; li gora bihn û can bin.

Heke tu beg an axayek î; tu çi mirovî; ji halê gundî an koçerên te, tête seh kirin; heke ew têr in; maline paqij de rûdinin, cilîne pak li xwe dikin û hinik xwendin û nivîsandinê dizanin; tu mirovekî pîr qenc î; heke gundiyên te, an xelkê eşîra te birçî ne, belengaz in, xaniyên pîs de rûdinin; nezan in; tu mirovekî pîr xerab î; di pêşiya Xwedê û mîlet de, berpîrsiyar î; û bizane ko tu ji dizan kêmtir î; ji ber ko diz diz e; û hew; lê tu xwe dikî mezin û hema xwîn û goştê welatîyên xwe dixwî û vedixwî; û heke te ji xwe pîrsî ez bikêrî çi têm; tu ê bibînî ko tu bikêrî tiştêkî nayî û di nezaniya xwe de, gora kur û neviyên xwe dikolî; û wê demê divê hişyar bibî, tobedar bibî; bibî xulam û xidmetkarê mîlet û welatê xwe; yê ko ev çend sal in kal û kalikên te bi xwedî kiriye û îro jî te bi xwedî dike; û bê qencî û arîkariya wî; her wekî tu nezan î û ji destê te tu xebat nayê, wê bibî perîşan û şerpeze; mîlet ne guhanên çêlekan e; te ewî dot; lê êdî bes e; divê êdî tu bikêrî vî mîlet û welatî bê." (Ma Ne Wilo Ye?

Mîr Dr. Kamiran A. Bedir-Xan, Stêr, hj. 3, r.1, çapa nû, Weşanxana Xanî & Bateyî, Danmark 1992) ■

Gulan 1995

Çîroka bûna min

Bêdeng bibe...
Baş guh bide min...
Bîra min têt...
ew şeş sal bûn
Ji sedî bîst nivî bûbû.
ewî demî
serma û zivistan pîr bûbûn.
Kirasêt spî
di ber zevîkêt gundê me da
heldirua bûn
çir-çir bûbûn.

Mehfûz Mayî

Ez vê helbestê diyarî wê mamostaya swêdî dikem ya ku
ez fêrî zimanê swêdî kirim, herwesa diyarî her kurdekî yê
ku rojbûniya xwe nizane dikim..

Jê fêr bibe...
Bêdeng bibe...
Baş guh bide min...
Da ez bo te çîroka bûna xwe bêjim.

Bîra min têt
hêj ez nebûm
ez her hebûm!
Wekî nuke...
wekî evro...
li gundê xwe
li xaniyê xwe bêgane bûm!

Li derdol û li kendala
kanîbiharîk der bûbûn.
Binefşok û adaroka
li ser givande û lêvcoka
diramûsan roj û hetav!
Bîra min têt...
ji şerma da...
ji kerba da...
befir peqî
...befir bû av!

Bêdeng bibe...
Baş guh bide min...

Bîra min têt eha hîngê
li xanîkê taxê gundî
joreka reş
taristanê kujtibûn çav
nehêlabûn ronahî û reng.

Bîra min têt...
hêj guhêt min ne vebûbûn
nebîstibûn çi pêjn û deng
heku hîngê
tayêt giran

tev êş û jan
berbû bûn giyanê dayika min!
Hîngê nujdar, hemî derman
li xewnêt wê dibûn mêhvan
dema hîngê
nalînêt wê
herdu guhêt min pir kirin
çavêt min jî
bo pencera gelek biçûk
herdu çavêt xwe zil kirin!

Bêdeng bibe...
Baş guh bide min...

Bîra min têt...
mezinêt me
bo zaroka çîrokêt (Efrût)a digotin!
got: (Ejdehak) xwîna zaroka vedxotin.
(Dêwê mezin) goştê mirova dixotin!

Bêdeng bibe...
Baş guh bide min...

Bîra min têt...
bihar zîz bû...
esman şil bû!
barî, barî
li hindav me
asin barî
agir barî!

Bîra min têt...
dûkêla reş
li devêt beş
li gewriyêt me bû parî!

Bîra min têt...
refêt (Teyrêt Ebabîl)ê

ji her lave hatin harî!
li hindav me
wan asin û agir riştin
pez bir kirin
şilxêt mêşa talan kirin
çi nehîştin
... mirov kujtin!

Bêdeng bibe...
Baş guh bide min...

Bîra min têt...
tirsê dilê zaroka dixar
mirovêt me
hewar birin ber esmana
serêt xwe serevraz kirin
beref evraz
beref valatiya tarî û nemiradxaz!

Bîra min têt...
dayika min jar û belingaz
ji tirsê da
çîroka (Teyrêt Ebabîl)
bo min û esmana dixand
lê hêj pitir ji esmana
barî...
barî...
her barî gaz!

Bêdeng bibe...
Baş guh bide min...



GALÎLEO GALÎLEÎ

Di dîroka ramanî û kulturî de pîrr kes û nav hene ku ji bona hinek tiştan bûne simbol. Shakespeare ji bona nivîskarî û edebiyatê, Makyavellî ji bona fen û fûtên desthilata polîtîk, Descartes ji bona felsefa îdealîst, Voltaire ji bona ronahiyê ûhw. Di gotûbêjan de ev nav û fenomen ji nêzîkayî de bi hevdu ve têne girêdan. Weke têtê zanîn Galileo Galilei jî, ji bona azadiya ilm û lêkolîn bû simbola berxwedanê. Li himberî kevneperestiya dînî û polîtîk, Galileo Galilei(1564-1642) tekoşin da û rê ji xebata ilmî re vekir. Kalê heftê salî, ji bona hinek dîtinên xwe yên li ser astronomî û gerdûnê, dihate mehkemekirin. Mehkema engizisyonê ne tenê bi bûyerên dînî lê belê bi bûyerên cîhanî jî dadiket. Otorîta dînî dixwest otorîta cîhanî jî bixebin bandora xwe û bibe hakime erd û ezman.

Baş e, problem çî bû?

Beriya Galilei, astronomekî bi navê Kopernikos teoriyek li ser rojê pêşkêş kiribû. Ev teoriya Kopernikos berî Galilei bi bîst salan dihate naskirin û paraztin. Grubekî pîrr biçûk ev teoriya Kopernikos li ser astronomî û sistema gerdûnê nasdikir û dipejirand. Li gora vê teoriya nû, roj navenda cîhanê bû û erd jî li hawîrdora wê digeriya. Teoriya Kopernikos, di ilmê astronomî de di bin navê Heliosentrîzm de dihat binav kirin. Galileo Galilei teoriya Kopernikos ji xwe re kire bingeş û xebat, lêkolînên xwe jî li gora dîtinên Kopernikos berdewam kir.

Li gora teoriya kevn ya Kludios Ptolemaius jî, erd navenda cîhanê bû û roj jî li hawîrdora wê digeriya. Teoriya Ptolemaius, bi navê geosentrîzm dihat naskirin. Dîtin û teoriya geosentrîzmê li ser hîmê felsefa Aristoteles ava bûbû. Di warê ilmê xweza û civatê de Aristoteles otorîta helî mezin bû. Hemû tevger û xebatên ilmî li ser teorî û dîtinên Aristoteles, xwe meşrû dikirin. Aristotelîzm bûbû pîvan û nêzîka 2.000 sal hakimiyeta xwe li ser hemû babe-

Şerefhan Cizîrî

tên ilm danîbû.

Felsefa ilmî ku dixwest cîhan û gerdûnê, avaniya wana û matematîka astronomiyê îzah bike, di du warên cihê de tevger dikir. Warê yekê ya skolastîk û kevnare bû, warê dua jî ya modern bû û li ser bingehê ceribandînê, helwesta xwe digirt. Bi vî awayî jî, du modelên îzahkirinê û têgihîştinê peyda bûbûn. Dîtinên li ser cîhanê yê klasîk û yê modern, ji bona hakimiyeta ramanî û serfiraziyên li himberî hevdu, bi hemû awayan rêkoşîn didan. Dîtinên klasîk û skolastîk, dîtinên felsefa ilmî ya Aristoteles û teoriya Ptolemaius temsîl dikir û li ser vî bingehî jî, bi rê ve diçûn. Lê dîtinên Kopernîkos û Galilei, hîna jî nebûbûn xwediyê felsefeyek ilmî û sistematîzekirî. Dîtinên wana ji pîr alîyan de ne li ser hevbûn, perçekirîbûn, ne xwedî otorîte bûn, adetekî wan ya ilmî tunebû, ûhw. Felsefe û dîtinên klasîk, ji aliyê bi hezaran tekstên filozofî, edebî û ilmî de dihatin parastin. Pîr huquqzanan, filozofan û papazan ev sîstema klasîk û skolastîk diparastin. Felsefe û dîtinên nû jî, êşkereye ku nû bûn û ji ber vê yekê jî ne xwediyê tu îmkanên maddî bûn...

Helwestgirtina Galileo Galilei li ser teoriya heliosentrîzm, li ser hinek hîpotezên matematîk ava dibû û bi pêş diket. Wê çaxê Galileo Galilei Li Universita Padua Professore Fizîk û Mihendîziya Arteşî bû. Wexta ku Galilei teoriya Kopernîkos bihîst merqa wî şiyar bû. Galilei bala xwe baş da wan dîtinên nû.

Di tevgerêdana ilmî de keşîfîkirina Teleskopên, pîr îmkanên nû çêdikirin. Bi Teleskopê re xebata ilmî diket demeke nû. Teleskop û gelek aletên din ku di vê demê de hatin keşîfîkirin, ilmê xwezayê û zanebûna rastî pêşdixistin. Deme ku nûçeya keşîfîkirina Teleskopê belav bû, Galilei wê saetê jî xwe re yek ava kir. Piştî çend ceribandi-

nên astronomîk Galilei dikarîbû bi hêsanî bigota: dawîya sîstema Aristotelîst hat. Li gora ceribandînên Galilei bi Teleskopê, navenda cîhanê roj bû û planet (gezegen) jî li hawîrdora wê digeriyan. Di van ceribandînan de Galilei hinek planet û stêrkên nû keşîf kirin. Ji bona ku karibe wana biparêze jî, navê van stêrk û planetan firotin şah û mîrekên Florens, Fransa, Hollanda û Spîniya. Armanca firotina navan peyda kirina parêzgerên xurt bû.

Galileo Galilei dixwest ku tiştê wî ku bi xwe keşîf kirine, hêdî hêdî bike malê xelkê. Diviyabû ku ev keşîf ilmî ji malê kesan derkevin û bibin malê giştî. Hinek jî ramanê xwe Galileo Galilei, cara pêşî di sala 1610 de, bi navê Siderius Nuntius (Qasîdê ji Stêrka) weşand. Mehkema engîsîzyonê piştî 24 salan destpêkir ku Galilei mehke-me bike. Dîtinên Kopernîkos jî, jî aliyê mehke-me engîsîzyonê, di sala 1618 de hati-bûn qedexekirin.

Ev dîtin û teoriyên nû pîr tişt serûbino kiribûn. Bahweriya Aristotelîsta û parazgerên sîstema kevnare, bi dîtin û teoriyên nû nedihat. Mekanîzma adetî pîr xurt bû. Hemû pîrs û bersiv li ba mamostê mezin Aristoteles hebûn. Pîr kesên milîtan yê hevalbendên Aristoteles nedixwastin li teleskopê jî binerin. Digotin ku; "ji bona mirov zanibe li ezmana çî heye, aqilê mirovan besî mirovan bû." Li vir gotina aqil jî, li gora felsefa Aristotelîst dihat tarîfîkirin. Bi kurtî, ji bona rastiya ilmî neyê pejirandin, li mahna digeriyan û ji bo vê yekê jî, ji heft bîran av dikişandin. Hata roja ku ceribandîna ilmî û aqil ji hevdu dûrbûn û jiyaneke cihê û serbixwe dijiyan, zêde problemên mezin pêknehatin. Lê wextê ku ceribandînan ilmî û aqil, bi hev re sentezekî mezintir çêkirin, wê çaxê ava Aristotîlîzmê û teoriyên wê germ bû.



Galileo Galilei

Ev ceribandinên nû ku di warê astronomî de pêkhatibûn, bi alikariya ilmê matematîkê hêsantir dibûn. Galilei, ji pîrr aliyan de dixwest problemên astronomî hêsantir bike, ev yeka jî bi alikariya matematîkê û mekanîkê çareser dikir. Sîstema nû hêdî hêdî dest davête hemû disiplinên ilmî û bi vî awayî jî, sistema kevnare û sistema nû şerê hegemonî bi hev re dikirin. Reaksiyon li himberî dîtin û teoriyên nû pîrr xurt bû. Kevneperestiyê xwe di pîrr aliyan de nîşan dida. Yek ji van hîmê kevnepereştiya bingehîn, pîrsa zimanê ilmî û akademî bû. Weke tê zanîn zimanê ilmî wê çaxê zimanê

Latînî bû. Hemû xebatên ilmî û dînî bi zimanê Latînî dihatin nivîsandin. Çawa di nav misilmanan de zimanê Erebî demeke dûr û dirêj weke zimanê muqaddes dihate pejirandin, Latînî jî ji bona welatên filehan wusa bû. Galilei, ev adete akademîk û dînî şikand û bi zimanê xelkê xwe, yanî bi zimanê Îtalî pirtûkên xwe weşandin.

Beriya Galileo Galilei, pîrr kesên din teorî û şoreşa Kopernîkos diparaztin û dipesinandin. Di navbera wan de yê bi nav û deng Giordano Bruno û Tommaso Campanella bûn. Ji dîtin û teoriyên Kopernîkos, mirovan dikarîbûn pîrr netîceyan der-

xînin. Giordano Bruno û Tommaso Campanella jî, ji teoriyên Kopernîkos helwestên dînî, exlaqî û siyasî derxistin. Dewlet, der û dewlemend rexne kirin. Ji bona dîtinên xwe Giordano Bruno hate îzolekirin û şewitandin. Giordano Bruno bû şehîdê azadiya ilmî yê yekemîn. Di nav agirê daran de laşê Giordano Bruno dişewitî û bi laşê wî re jî azadiya ilmî gazî mirovantiyê dikir. Tommaso Campanella, xwediyê pirtûka bi nav û deng "Dewleta Rojê" jî, ji bona dîtinên xwe yên li ser wekhevîyê, dewletê û civatê dihate îzolekirin û otorîteya dîni campanella jî davêtin zîندان.

Ji aliyê din de mirov dikare bêje ku rewşa Galileo Galilei hinekî cihê bû. Galilei xwedî prestîjeke ilmî bû. Galilei profesor bû. Dostê wî yê xurt û navdar hebûn. Tu kesî nikaribû şuphe ji Katolîkbûn û dîndariya Galilei bikira.

Hîn di sala 1616'an da mehkema engizisyonê biryar dabû ku dîtinên Galileo Galilei qedexe bike. Li gora biryara mehkema engizisyonê, Galileo Galilei nikaribû teorî û dîtinên Kopernîkos biparazê, fêr bike û behs bike. Argumentên xwe yên helî xurt Galilei di sala 1632'an de, di pirtûka bi navê "Diyalog li ser du sîstemên cîhanê" kom kiribûn. Pirtûk zû populer bû û gelekî dihate firotin. Lê serokatiya dîni li Vatîkan jî, bi carekê re biryar da ku belavkirin û weşana pirtûkê bide sekinandin. Pirtûkên mayî jî dest danîne ser wan. Dûra bangkirin Galileo Galilei ku zû were Romayê. Galilei dê li mehkemê guneh derxista. Biryar jî hati-bû dan ku protokolên mehkemê bi dizî bimîne. Ji ber ku hakimê mehkemê ji xelkê ditirsîyan. Hakim ditirsîyan ku xelk ji wan re bibêje; we cezayekî nerm daye Galilei!

Li gora tekstên Teoloji dîtinên Galilei çewt bûn. Ev yeka jî wezîfa mehkemê bû ku îspat bike. Di mehkemê de heqê Galilei

tûnebû ku xwe biparazê. Mehkemê emir dikir ku, Galilei dev ji dîtinên xwe yên "çewt" berde, wana fêrî kesî neke, neparêze û wana bi kesî re guftûgo jî neke. Heger Galilei li gora biryarên mehkemê nemeşîya, dê ew bavêtina zîndanê. Galilei weke tê zanîn cezê zîndanê negirt, lê belê mehkemê cezayekî din dabû Galilei: Li gora biryara mehkemê ewê Galilei di sê salan de, her roj heft duayên efûkirinê bixwendina! Xwedeyo min efû bike!

Galileo Galilei bi xwe dibêje ku "ez li mehkemê ditirsîyam ku dîtinên xwe vekirî bêjim". Galileo Galilei wê çaxê kalekî heftê salî bû. Ji aliyê fizîkî de Galilei zêde nikaribû li ber xwe bidaya. Mercên zîndanê pîrr giran bûn û mehkema engizisyonê jî pîrr zalim bû. Ji ber vê yekê jî Galileo Galilei sûtê xwe li mehkemê pejirand. Sût hati-bû pejirandin, lê belê rastî dîsa weke pîrr caran li cem kesên sûtदार bû. Ma îro jî rewş ne wuha ye?

Galileo Galilei ne tenê li ser ilmê xwezayê xebat dikir. Galilei ji nêzîkayî de bi muzîk, edebiyat û helbestê jî dadiket. Pîrr nivîskar û helbestvanên klasîk weke Virgilius, Ovidius, Horatios, Petrarca û gelekên din dixwendin. Li gora pîrr dostên wî yên wê demê, Galilei helbest bi keyf û eşk dixwendin. Dîsa li gora dostên wî Galilei xwediyê zekayekî mezin û fantaziyeke dewlemend bû. Ji aliyekî de jî Galilei xwediyê zanyariyeke pîralî bû û dikaribû sentezên pîrr kûr û hêja pêk bîne. Bi hemû awayî Galilei, tîpîk mirovê renesansê bû... ■

JI WÊ RE

Tu şevan nas dikî
Şev bi siran tijî ne
Loma tarî ne
Loma kêr venake devê wan
Tu dizanî?

Şev mehzena evînê ye
Li wir e Ferhad û Şîrîn
Tahîr û Zihre
Û Mem û Zîn
Gurzê Ferhad e
Li ezmana dibiriqê
Ew tiştê ku tu stêrk dizanî...

Tu şevan nas dikî
Te dîtîyî tu caran
Ew xêzika zirav
Di nava tarî û roniyê de
Tu bînfetiskî bûyî qet ji kêfan
Betilîyî ji ramanan
Tu şevan nas dikî
Şev bi siran tijî ne
Loma tarî ne
tu dizanî?

Can Gülşenoglu

EHMEDÊ XANÎ Û RAMANA DEWLETÎ

Felat Dilgeş

Di dîroka siyasî û ramanî ya Kurdan de, kesê ku cara yekemîn li ser pirsava avakirina dewleta Kurdî rawestiye û pêwistiya vê yekê bi nêrînek zanistî raxistiye ber çavan, bêguman Ehmedê Xanî ye. Ehmedê Xanî di berhema xwe ya bi nav û deng Mem û Zînê de, di beşê Derdê Me de bi awayekî gelek zeled dest avêtiye û pirsê. Em dikarin bibêjin ku beriya Ehmedê Xanî, kesekî ku di nav Kurdan de li ser mesela avakirina dewleta Kurdî rawestiye û tê zanîn tune.

Nêrîna Ehmedê Xanî ya li ser dewletê çi bû? An Ehmedê Xanî dewletek çawa dixwest? Ehmedê Xanî çima û ji ber çi sedema avakirina dewletek Kurdî diparast? E. Xanî di daxwaza avakirina dewleta Kurdî de, di bin bandûra kê de bû şeklê karbidestiya dewleta ku diparasat çi bû? Çima Ehmedê Xanî Kurdistanek yekbûyî dixwest? Gelo E. Xanî dewletek netewî diparast? Di dewleta ku E. Xanî dixwest de rolê perwerdeyê çi bû? Çima E. Xanî girîngiyek mezin dida perwerdekirina zarûkan? Di jiyana civakî, zanistî û karbidestiya dewleta E. Xanî de

rolê ziman çi bû? Çima E. Xanî, nemaze li ser girîngiya zimanê Kurdî radiwestiya? Ji bo ku mirov bikaribe bersîva pirsên bi vî awayî bide û daxwaz, mebest û ramana E. Xanî fêr bibe, pêwîst e ku mirov li nêrînên li ser dewletê yê filozofên beriya Ehmedê Xanî bisekine. Bêguman di vê yekê de nêrîna filozofên wekî Platon, Îbnî Haldûn, Machivêlî, Thomas Mor û Thomas Hobbes ginîng in. Nêrînên van filozofan ên li ser dewletê di roja me bi xwe de jî tîn munaqesekirin. Bi rûbirûkirina nêrînên van filozofan û E. Xanî, em ê bikaribin bigihîjin encamên berbiçav û rasttir û hingê E. Xanî jî çêtir binasin. Çimkî nêrînek felsefî çiqas xweser û balkêş be jî, heta ku bi nêrîna filozofên din re neyê rûbirûkirin û di serada rexneyan re derbas nebe, cihêti û xweseriya wê baş nayê fêmkirin. Bêguman her nêrîna felsefî, divê li gor dem û mercên ku hatiye ziman bê nirxandin û şertên civakî û dîrokî yê demê jî bîn hesabandin. Di xebata zanistî de ev metod girîng e.

Di dîroka felsefî û siyasî de kesê ku cara yekemîn bi awayekî gelek dorfireh dest

avêtiye pirsê dewletê û di gel ramanên xwe yê pirralî, bi nêrînên xwe yê li ser vê yekê jî ji mirovatiyê re bûye mal Platon e. Ev filozof di cihana Îslamî de bi navê Eflatûn tê zanîn û naskirin. Berî Zayînê (BZ), di navbera salên 427-347'an de jiya û ew bi xwe şagirtê Sokrates (468- 400) bû. Hemû berhemên xwe wekî diyologên tiyatroyê nivîstî û tevê berhemên wî, bêyî ku hunda bibin gihîştin dema me. Mirov dikare bibêje kitêb û diyalogên Platon bingeha tiyatroya hemû deman û dema me bi xwe jî amade kirin. Gava ku memosteyê wî Sokrates, di 68 saliya xwe de, ji ber ramanên xwe cezayê îdamê sitand û bi jehrê hat kuştin, hingê Platon 28 salî bû. Ew şagirtê herî baş ê Sokrates bû; li ser kuştina Sokrates terkelat bû, piştî donzdeh salan, di çîsalîya xwe de vegeyriya welatê xwe. Li gor hin dîtinan di vê navê de li Misir, Îtalya, Ene-dol û Hîndistanê digere⁽³⁾. Mumkun e ku ev filozofê hemû deman li Kurdistanê jî ge-riya be an jî di çûna van ciyan de di ser Kurdistanê re jî derbas bûbe.

Dîtînen Platon ên li ser dewletê gelek balkêş in. Kêm zêde, Îdeolojiya hemû dew-letên ku di dema me bi xwe de jî hatine avakirin, dikare di nêrînên wî de bê dîtîn. Platon filozofek pirralî bû û Ehmedê xanî bi xwe jî di berhema xwe de wî bibîr tîne. Platon di berhema xwe ya bi navê Dewletê de li ser pirsên dewletê radiweste û ew dewleteke ku kar û îdareya wê di destê filo-zofan de ye diparêze. Li gor dîtina wî, heta ku filozof dewletê nekin dest, ne derdên dewletê û ne jî derdên hemwelatiyan dê neqedin⁽⁴⁾. Filozofî zanîn û hêza aqil e; ger ku ev zanîn û hêza aqil bi hêza dewletê re

nebe yek û filozof neyê serê dewletê, der-dên dewletê naqedin. Di gel ku di gihîştî-na filozofan de rolê perwerde û sporê gi-rîng e jî, filozofî di tebîtê de bi afirandina mirov ve girêdayî ye. Li gor Platon herkes wek filozof nayê dinyayê. Di nav mirovan de, ancax ji hezaran yek dikare wesfên filo-zofiyê pêk bîne û ev di nav civatê de hindi-kaniyek biçûk in⁽⁵⁾. Çimkî li gor Platon, "Tebîet hinek mirovan filozof û mirovê dewletê, hinekan jî bêyî ku bifikirin tiştên ku tînin gotin bînin cih, diafirîne"⁽⁴⁾. Herçî Arîstoteles e ew di pirsê newekhev hatina dinê ya mirovan de ji Platon gelek tûjîr difikire. Platon ji yê ku "Ji bûyina(zayina) xwe ve xerat û goşkar in" qal dike; lê Aris-toteles pêşvetir diçe û li ser ji yê ku ji bû-yina xwe ve kole tînin dinyayê radiweste.⁽⁵⁾ Li gor Arîstoteles Hellenî azad tînin dinyayê û ew hovan îdare dikin.

Di dewleta ku Platon difikire û diparêze de jin û zarûk şîrîk in û jin jî wekî mêran di nobetdariya dewletê de cih distînin. Pla-ton weha dinivîse: " Dê jinên notirvanên me di nav hemûyan de şîrîk bin; dê tu yek ji wan bi tu mêrî re cihê rûnenê. Dê zarûk jî şîrîk bin. Dê bav bi kurê xwe, kur bi bavê xwe nizanibe"⁽⁶⁾. Di dewleta Platon de pa-rastin û nihartina zarûken li ser heyetek taybetî ye. Divê jin zarûkên xwe nas nekin û jinên ku şîrê wan heye zarûkan bimêjî-nin⁽⁷⁾. Destûra bi hevrebûna jin û mêran jî dewlet dide. Jin ji emrê xwe yê bîstan heta çilan dikarin zarûkan bînin. Mêr ji dema xwe ya ku herî xurt e heta sala pêncî û pênc-an dikare bi jinan re bê ba hev. Ev yek li gor destûra dewletê çêdibe û yê ku di ser an di bin vî temenî re zarûkên wan çêbi-

bin, li hember dewletê û dîn sûcdar tèn hesibandin⁽⁸⁾. Zarûkên ku bê nîşan û bê merasîma dînî bèn dinyayê pîç tèn hesibandin. Di vê dewletê de zarûkên hemçax bira ne û mêr û jinên ku di temenê dê û bavê wan de ne, ji bo wan dê û bav in.

Ji bo Platon tiştê herî girîng yekîtiya dewletê ye. Xerabiya herî mezin jî parvebûna dewletê ye. Qedera dewletê û hemwelatîyan yek e. Hemwelatî ji êş û şahiyên dewletê re hevpar in⁽⁹⁾. Çimkî li gor Platon, “Dê bi jin û zarûkên cur bi cur re êş û şahiyên cur bi cur çênebin. Ewê berjewendî, armanç û hîsên wan heta ku bibe yek be. Di vê rewşê de jî dê tu sedem nemînin ku dewlet parve bibe”⁽¹⁰⁾. Di vê dewleta Platon a ku ji bedenên mirovan zêdetir hemû tiştê wan şîrîk in de, hewcedarî bi mehkemeyan jî namîne û şerên ku ji ber pere, zarûk û eqrebayan jî derdikevin ji holê radibin⁽¹¹⁾.

Di dewleta Platon de, di dema şer de dê jin jî bi mêran re herin şer; di aştî û cengê de bi mêran re bin. Dîsa li gor Platon, “Afirîna jinê jî wekî ya mêr ji notirvaniya dewletê re dest dide. Lê bi tenê ev afirîn di nav mêran de xurt, di nav jinan de qels e.”⁽¹²⁾. Ago Platon di navbera jin û mêran de ferqek dereceyî nabîne.

Di jiyana û karbidestîya dewletê de Platon girîngiyê dide çar hêmanî. Ev li gor rêza xwe pîvan, mêrxasî, zanayî û rastî ne.⁽¹³⁾. Hêmana yekemîn, rîknê pêşîn ê di avakirina dewletê de zanyarî ye. Ev zanîna ku di birêvebirina karê dewletê de rolekî esasî digire, bi hemû endamên civatê re tune. Di nav civatê de kêmkar dikarin bibin xwedî vê zanîne. Karên nav dewletan, siyaseta dewletê ya derve bi saya vê zanîne tê me-

şandin. Ev zanîna zanîna demezirandinê ye⁽¹⁴⁾. Bi saya vê zanyariyê biryarên li cih tèn girtin. Yên ku xwediyê vê zanebûnê ne dikarin hemû civatê bifikirin û karê dewletê bimeşînin. Qanûnên dewletê jî ev zanar, ango dê filozof çêbikin. Rîknê duwemîn mêrxasî ye. Wêrekî û newêrekiya dewletekê bi kesên ku di riya wê dewletê de şer dikin ve girêdayî ye. Mêrxasî hêza parastina dewletê ye û ev jî li gor perwerdekirina qanûnçêkiran tê pê. Bi riya perwerdekirinê ewê ji çî bê tirsîn û ji çî neyê tirsîn bê hînkirin. Mêrxasî, wê baweriya ku bi perwerdeyê hatiye çêkirin, di hemû rewşan de parastin e. Şervanên dewletê yên ku ewê li gel perwerdekirinê bi muzîk û jimnastîkê bèn gihandin, ewê bi bawerî li dewletê xwedî derkevin. Li gor Platon, ku mêrxasî tune be mirov nikare bibe mirovê dewletê⁽¹⁵⁾. Pîvan, pêşilêgirtin û gemkirina daxwaz û meylan e. Bi xwe karîn û li nefsaxwe, bi vênaya xwe hakimbûne. Hêza xwe ragirtinê ye. Pergal û ahengek e. Di dewletê de pîvan, aliyê xerab di bin emrê aliya baş de girtin e. Li gor Platon rîknê herî dawî rastî, encama zanyarî, mêrxasî û pîvanê ye. Rastî, “Xwediyê malê xwe bûn û karên xwe bi xwe kirin e”⁽¹⁶⁾ Rastî bingeha edaletê ye.

Platon hê di dema xwe de bi hesteke netewî şerên navxweyî û şerên ku bi xerîban re tèn kirin ji hevdû diqetîne. Ew weha dibêje, “Çawa ku wekî şerkirin û lihavxistinê du pey hene, di nav mirovan de jî du cure pevçûn hene. Yek pevçûna bi nêzik û hemnîjadan re, yek jî pevçûna bi yên ku bi xwîne û nîjadî ji mirov dûr in re ye. Gava ku ev pevçûn bi nêzikên me re be lihevxis-

tin, bi biyaniyan re be şer e”⁽¹⁷⁾. Li gor Platon ger ku lihevxiştineke di nebera Yûnaniyan de çêbibe jî divê Yûnanî kole neyên girtin. Heta ku ji dest bê, divê dewletên Yûnanî li hevdu nexin⁽¹⁸⁾. Ev raman welatperwerî ye û di vê ramanê de bingeha neteweperestiyê jî heye. Tovên neteweperestiyê hemdem, bi awayekî servekirî di vê ramanê de hene.

Li gor Platon aşî, azadî û huzûr ancax di dewleta ku filozof îdare dikin de dikare pêk bê. Ne aristokrasî, ne olîgarşî û ne jî demokrasî nikarin vê yekê pêk binin. Çimkî, “ Gava ku te li bajarekî parsek dîtin, bizanibe ku li wir rêbir, diz, bédîn û katîlên bi xwîn jî hene”⁽¹⁹⁾.

Li serê dewletê rûniştandina filozof, qedir û rûmeta zanîne hesabandine. Di dewleta Ehmedê Xanî de jî filozof, angû zanîn û zanyarî hîmekî esasî ye. Herçiqas ew serokê dewletê bi filozofiyê bi nav neke jî, ji bo kesê ku ewê seroktiya dewletê bike li wêşên filozofiyê digere. Dê rêzên jêrîn de ev yek gelek aşkera ye:

Ger dê hebûya me jî xwedanek
Alîkeremek, letîfedanek
Îlm û huner û kemal û îzan
Şêir û xezel û kitêb û dîwan
Ev cins bi bûya li ba wî mamûl
Ev neqedî biba li nik wî meqbûl
Min dê elama kelamê mewzûn
Alî bikira li banê gerdûn
Bîna ve rihê Melê Cizîrî
Pê hey bikira Elî Herîrî
Keyfek wê bida feqiyê Teyran
Heta bi ebed bimayî heyran⁽²⁰⁾

Ew xwedanê ku E. Xanî li ser wêşên wî disekine serok û rêberê dewleta wî, angû filozofê Platon e. Çawa ku filozofê Platon hêza xwe, zanîn û şehrezatiya xwe ji kitêban, ji xwendin û nivîsînê distîne, wusa jî divê ku serokê dewleta E. Xanî jî ji kitêban hes bike, li ba wî qîmet û rûmeta xebata zanistî hebe. E. Xanî jî di avakirin û îdarekirina dewletê de, zanîn û filozofiyê hîmekî bingeşin dibîne û ew jî wekî Platon pê bawer e, heta ku yên ji kitêb, helbest û dîwanê hes dikin neyên ser hukum, ewê derdên gel, angû derdên dewletê neqedin; alozî û tevlihevî jî holê ranebin. Çawa ku li ba filozofê Platon rûmeta berjewendiyên madî tune û filozof qîmetê nade vê yekê, ji zanîne hes dike û li rastiyê digere, wusa jî divê serokê dewleta E. Xanî bi pey menfaetên şexsî nekeve, kitêb û zanîne ji xwe re bike pîvan û rêber.

E. Xanî jî wekî Platon bingeşa hemû neçeyî û xerabiyên ji zanîn û ji felsefeyê dîrketin dibîne. Bi ya wî dema herî xerab, wexta ji felsefeyê dîrketin û xebata zanistî û felsefî nehesibandin e. Gava ku menfaet bi ser heskirina xebata zanistî û felsefî ket, êdî pergala civakî xera dibe û nîrxên exlaqî cîyê xwe ji pûl û pere re dihêlin. E. Xanî weha dinivîse:

Xasma di vê esrê da ku himyan
Maşûq û hebîbê bo me hemyan
Yanê ji timayê dirav û dînar
Heryek ji me re we bûne dîldar
Ger ilmê tamam bidî bi pûlek
Bifiroşî tu hikmetê bi solek
Kes nakete mîterê xwe camê
Ranagirtin kesek nîzamê.⁽²¹⁾

Erê ji bo E. Xanî dema herî xerab, dema herî aloz û tevlihev ew dema ku qedr û qîmeta felsefê nayê girtin, nayê zanîn û bi gotina wî “Êdî felsefe bi solekê tê firotin e.” E. Xanî ji bo guhartina vê demê û vê rewşê, ji bo ku gel û civat nekeve rewşeke weha xerab li serokên dewletê yên ku rûmetê didin felsefê digere. Bi rastî hema ew jî dike ku wekî Platon filozofan bîne ser hukum û serê dewletê.

E. Xanî bi girîngî ji “qedrê qelemê” behs dike; heta bextê civata xwe ya reş bi qedirnegirtina qelemê re girêdide. Tê zanîn ku ‘qelem’ xebeta fikrî û felsefê ye; ked û berhema ramanî ye, serkeftina zanistî ye, desthilatdariya zanîne ye. Di vê sazûman û desthilatdariyê de xweşî, şahî û dilgeşî heye. Li gor E. Xanî sitêrka civatê dikare di pergalek weha de bibiriqê û gel bigihîne ronahiyê. Ronahî bi serkeftina zanistî û felsefî, bi desthilatdariya qelemê ve girêdayî ye. E. Xanî weha dom dike:

Da kaşîfê bibit li ber me ehwal
 Kanê dibitin miyesser îqbal?
 Îbdarê me wa giha kemalê
 Aya bûye qabilê zewalê?
 Ya her weha dê li istîwa bit
 Hetta weku dewrê mînteha bit?
 Qet mumkun e ev ji çerxê lewleb
 Tali bibitin ji bo me kewkeb
 Bextê me ji bo me re bibit yar
 Carek bibitin ji xwabê heşyer
 Şûrê hûnera me bête danîn
 Qedrê qelema me bête zanîn
 Derdê me bibînit îlacê
 Îlmê bibînitin rewacê⁽²²⁾.

Di dewleta E. Xanî de bextê reş ancax bi qedrê qelemê girtin û zanîne dikare sipî bibe. Çareseriya derdan, aştî û aramî; gava ku ilim rewac dît dikare pêk bê. Derd bi rewacê dîtina îlim dikarin bigihîjin îlacê. Di avahiya dewletê de ji bo Platon, çar hêmanîn girîng zanîn, mêrxasî, pîvan û rastî bûn. Di dewleta E. Xanî de jî zanîn rikê pêşîn e. Gava ku zanîn bi pîvan bi mêrxasiyê re hat ba hev, wê gavê dikare bigihîje rastiye. Wekî Platon ji bo E. Xanî jî rastî encam e. Bi tenê mêrxasî, şûrê rût ê bi serê xwe di gihîştina armancê têr nake. Heta şûr ku bi zanîne nehat tûjkin nikare bibire û her her ko dimîne. Di baweriya E. Xanî de şûr dikare bi zanîne bê tûjkin. Şûrê ku bi zanîne neyê tûjkin, ew şûrê ku bi zanîne neyê hêsankirin xesarê dide xwe, xwediyê xwe dibire. Di avkirina dewletê û di parvekirina dinê de ku mêrxasî bi zanîne re ne bû bira, gihîştina armancê diwar e û carna jî ne mumkun e. Ji ber vê yekê E. Xanî weha dibêje:

Pirsî ji dinê min ev bi hikmet:
 “Mehra te çi?” Gote min ku: “Hîmmer”
 Hasil ku: Dinê bi şûr û îhsah
 Teksîrî dibit ji boy însan
 Ez mame di hikmeta Xwedê da
 Kurmancî di dewleta dinê da
 Aya bi çi wechî mane mehrûm?
 Bîlcimle ji bo çi bûne mehkûm?
 Wan girtî bi şûrî şehre şuhret
 Teksîrê kirin bîladê hîmmer
 Her mîrekî wan bi bezlê Hatem
 Her mîrekî wan bi rezmê Ristem⁽²³⁾

Ristemê Zal li Rojhilata Navîn sembol û nîşana egîtî, fêrisî û mêrxasiyê ye; ala têkneçûnê ye. Kurdên ku bi mêrxasiya xwe wekî Ristem in, bi şerên xwe destanên mêrxasî û serfiraziyê nivîsîne, dîsa jî bêdewlet in; bindest û sitûwxar in, di bin nîrê Tirk, Ereb û Farisan de ne. Ev rewş bawermendekî wek Ehmedê Xanî li ber Xwedê dike serhildêr û gunehker; ew E. Xaniyê ku di tesawûfê de hempayê Mewlana Celaledînî Romî ye, berhema wî ji xwe re model girtiye(24) û bi tu awaya ji wî ne kêmtir e. Lê belê E. Xanî vê yekê dijberî nabîne; çimkî ew dizane di dinya ku bêrê wê li pêş e de, mêrxasî û zanîn cêwî (zo) ne. Ew jî wek Platon mêrxasiyê bi serê xwe nahêle.

Di dewleta Platon de yekîtiya dewletê armançek bingeîn e. Ew ji bo ku vê yekîtiyê zeximtir bike şîrkîtiya jin û zarûkan pêwîst dibîne. Di nav hemû mensûbên civatê de 'yekîtiyek xwînî' diafirîne; şîn û şahiya dewletê dike şîn û şahiya gel û dihêle. Heta qumandarên ku di şer de bi ser dikevin bi jinên rind xelat dike(25). Platon di vê yekê de wusa pêş ve diçe ku dixwaze pergala civatê li gor yekîtiya dewletê ava bike.

E. Xanî ji di pirsê yekîtiya dewletê de gelek hasas e. Ew jî wekî Platon yekîtiya dewletê, bi hev re bûn û di yekîtiya gel de dibîne. Lê riyên yekîtiyê pêkanîna Platon û E. Xanî carna ji hev gelek cuda ne. Berî her tiştî Platon di demeke pîrxwedayî de dijiya û ramana yekxwedayiyê hê pirr pêş ve neçûbû. Lê E. Xanî rêber û bawermendek ola Îslamî bû. Di nêrîna wî de, ango li gor baweriya Îslamî şîrkîtiya jin û zarûkan gunehkarî bû û nikaribû bihata munaqesekirin jî. Yekîtiya ku Platon dix-

west bi hevpariya jin û zarûkan pêk bîne E. Xanî dixwest bi ziman û neteweperestiyê pêk bîne. Ji bo E. Xanî hevîrê yekîtiyê neteweperestî û hesta netewî bû. Ger ku mensûbên civatê bi hesteke netewî bihata na rû hev, dê bi vî awayî riya yekîtiya dewletê vebibûya û yekîtiya dewletê bi hêsanî bikaribûya bihata parastin. E. Xanî di vê mijarê de gelek zelal û biryardar bû.

Di gel ku li dinya hemdem, li reşahiya Ewrûpayê ramana netewetiyê piştî şoreşa Firansîzan a sala 1789'an dest pêkiribû û hêdî hêdî belav bûbû, ev raman hê sed sal berê bi Ehmedê Xanî re çêbûbû. Di sala 1695'an de gava ku E. Xanî vê berhema xwe, ango Mem û Zîn temam kiribû, di cymî salê de ala neteweperestiya Kurdî jî vekiribû. Ji ber vê ramana xwe ya ku E. Xanî bavê neteweperestiya Kurdî tê pejirandin(26). Di çekirina xaniyê ku wî dixwest ava bike, dewleta ku wî dixwest damezirîne de xerc û hevîrê wî neteweperestî bû. Di yekîti û avakirina dewletê de ramana Platon a li ser hevpariya jin û zarûkan tu car jiyana nedît, le belê neteweperestiya E. Xanî bû hîmê gelek dewletî.

Hem Platon û hem jî E. Xanî girîngiyek mezin didan perwerdekirina zarûkan. Di dewletên herduyan de jî zarûk pêşeroj bûn û herduyan jî bi vê hestê dest diavêtin pirsê perwerdekirina zarûkan. Platon hê jî bûyînê ve zarûk ji dê û bavê wan dikirin û di malên taybetiyên ku dewletê berpirsiyariya wan digirt ser xwe de mezin dikir û digihandin. Ji bo Platon perwerdekirina zarûkan ji roja bûyîna wan ve dest pê dikir. Di wê dewleta ku Platon dixwest ava bike de êdî peyva "zarûkên min" an "zarûkên te"

tişteki nedianî ziman; çimki êdî “zarûkên me” û “zarûkên dewletê” hebûn. Hem ji Platon û hem jî ji bo E. Xanî perwerdekirina zarûkan armançek hevpar bû, lê di vê yekê de rê û wasitayên wan ji hevdû gelek dûr bûn.

Di mijara perwerdekirina zarûkan de sistema E. Xanî bi norm û jiyana ola Îslamî ve girêdayî bû. Ango E. Xanî, beriya ku temenê xwendina zarûkan bê nikaribû wan ji malbata wan bistanda; dibistana pêşîn a zarûkan malbata wan bû. Piştî ku zarûk bigîhîştina temenekî dikaribûn dest bi xwendinê bikirana. Di pirsxa xwendina zarûkan de jî malbatên wan biryar didan. Normên Îslamî bi vî awayî bûn, bi tenê E. Xanî dikaribû daxwaza daxwendina zarûkan jê dê û bavên wan bikira. Lê E. Xanî bi kirinek xwe zincîra adetên îslamî dişikandin. Ew jî ev bû: Bi zimanê dayika xwendin. Diviyabû dersên dînî jî bi zimanê dayikî bihatana dayin û xwendin. Ev ji bo dîne Îslamê remform dihat hesabandin. Bi vê helwestê em dikarin bigîhîjin encamekê: Quran dikare bê wergerandin û ew gelên ku Misilman in, lê zimanê wan ne Erebi ye, ancax bi wergerandina Quranê dikarin wê fêhm bikin. Ev yek hewcedariyek bû; di nivîsana Nûbarê de - ku ferhenga Erebi û Kurdî ye - armançek ev bû. Wê gavê em dikarin bibêjin, di dewleta ku E. Xanî dixwest ava bike de ewê dîn bi zimanê ku gel pê dipeyive bê fêrkirin. Ev helwest encamek ramana neteweperestiyê ye.

Di destpêka Nûbarê de E. Xanî weha digot:

Ji paş hemd û selewatan

Ev çend kelîme ne ji luxatan

Vêloxistine Ehmedê Xanî

Navê Nûbara Biçûkan lê danî!

Ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkê di Kurmancan⁽²⁷⁾.

E. Xanî ewqas ji zarûkan hes dikir ku navê kitêba xwe Nûbara Biçûkan danî. Nûbara Biçûkan belkî di dinyayê de ferhenga yekemîn e ku bi helbestkî hatiye nivîsandin. Di dewleta E. Xanî de perwerdekirina zarûkan siyasetek mîlî ye. Gava ku ew dibêje, “Ne ji bo sahibrewacan, Belkî ji bo biçûkê di Kurmancan,” êdî ew karê xwendin û perwerdebûnê dike malê hemû civatê û dihêle. Ji vê demê bi şûn de xwendin û zanîn wek îmtiyazekê di destê tebeqeyên jorîn û çînen serdest de jî namîne; dibe malê hemû civatê, dibe malê gel. Perwerdekirina ku ewê bi zimanê gel çêbibe, ji xwe êdî ewê ji gel re bibe mal. Hîmekî bingehîn ê dewleta E. Xanî jî ev e.

Di cîhana îslamî de Îbnî Haldûn filozofek pirralî ye. Bi qasî ku di mijarên civakî û dîrokî de pispor e, ewqas jî bi nêrînên xwe yê li ser dewletê balkêş e. Îbnî Haldûn di sala 1334'an de li bajarê Tûnûsê hat dinyayê. Di zarûkîtiya xwe de ji bavê xwe ders sitand; gava ku Quran xetim kir hê zarûk bû. Bavê wî Muhemmed Vabilî ji bajarê Îşbiliya Îspanyayê hatibû Tûnûsê. Îbnî Haldûn ne bi tenê li Rojhilat û di civata Îslamî de, ew li Rojava û di nav civatên Ewrûpî de jî tê naskirin. Ji alimên herî mezin ên dema xwe ders sitandibû û ji sultan re şewirmendî kiribû. Îbnî Haldûn bi ilmê Yûnanî, bi filozofên wekî Arîstoteles û Platon jî dizanibû. Îbnî Haldûn wek damezrênek ilmê sosyolojiyê tê pejirandin.

Di nêrînên xwe yên li ser dewletê de jî İbnî Haldûn çavdêrek gelek baş e. Li gor wî avakirina dewletê hewcedariyek jiyana civakî ye û ji bo mirov zarûrî ye.⁽²⁸⁾ Mirov bi afirîna xwe, bi aqil û hêza xwe meylawan li ser qencyê ne. Mirov bi hêzên heywanî yên ku bi wî re ne meyla xwe didin ser xerabiyê. Lê ji ber ku mirov mirov e, bêtir meyla wî li ser qencî û xêrê ye. Ji ber vê yekê, "Dewlet avakirin û bi siyasetê re bilîbûna wî ji mirovbûna wî tê"⁽²⁹⁾. İbnî Haldûn avakirina dewletê vaqiyek mirovî dibîne. Her qewmê ku bigîhîje vê zanîne û li dor vê bîr û baweriyê were ba hev û vê hêzê pêk bîne dikare dewletê ava bike. Li gor İbnî Haldûn exlaqê xweş û taybetî guliyên dewletê ne û avahiya dewletê tamam dikin. Dewleta bêexlaq wek mirovê tazî îpella ye⁽³⁰⁾. Herçiqaş avakirina dewletê mafek mirov be jî, gelên ku li ber tadeyên mezin û bacên giran serî deynin, ew tu car nikarin dewletê ava bikin⁽³¹⁾.

Di avakirina dewletê de İbnî Haldûn rolekî girîng dide pêkanîna edaletê. Ancax dewlet dikare di nav mirovan de edaletê pêk bîne û pêşî li êrîşên wan ên li hember hev bibire. İbnî Haldûn weha dinivîse, "Ji bo domandina jiyana xwe ya civakî gava ku mirov li hev dicivin, mecbûr dibin ku bi hev re têkilî deynin û hewcedariyên hevdû temîn bikin. Lê bi tesîra tebîeta heywanî, ji bo bidestxistina hewcedariya xwe, her yek dest dirêj dike mal û eşyayê yê din û dibe. Çimkî zilim û dijminatî pêwistiyek tebîeta heywanî ye. Kesê ku li hember tecawizê maye, dê bi dijminatî û handana hesta şerefê rabe ku xwe biparêze. Ev parastin û pevçûna ku bi handana hêza mirovî dest pê

dike, şer, tevlihevî û xwînretîne tîne û rîya tunebûna nîjad û hundabûna nifûsê vedike. Xwedayê mezin nemaze parastina nijada mirov emir kiriye û xwîn retîne qedexe kiriye. Ne mumkun e ku mirov, bêyî hebûna qedexekar û hakimekî ku rîya êrîşkirina wan a hevdû bigire, di tevliheviyên bi vî awayî de bikaribin bijîn. Ji ber vê yekê mirov hewcedarî qedexekar in, ev qedexekar li wan hukum dike."⁽³²⁾ Li gor İbnî Haldûn ev qedexekar jî ew e ku sînoran diparêze, bacan dicivîne û nûneran dişîne ciyên din. Ango ev qedexekar dewlet bi xwe ye. Ev qedexe jî ewê di lîterator û dewleta hemdem de bibin qanûn.

Li gor İbnî Haldûn sînor, firehî û mezinahiya dewletan bi qûdret û hêza dewletan re girêdayîye. Dewlet di navenda welat de li gor hawirdorê bêtir bi hêz e. Ger dewletek di navenda xwe de tîk here, der û dor û sînorên xwe di dest de girtin feyde nake. Gava ku dema pîrbûna dewletekê hat, di sînorên dewletê û di der û dora welat de biçûkbûn dest pê dike⁽³³⁾.

İbnî Haldûn, dewletê avakirina Ereban jî gelek dijwar dibîne. Çimkî Ereban ji hemû qewmên din bêtir koçer in, wek heywanên hov li çolan digerin û ji hev re serî danaynin. Li gor İbnî Haldûn ancax pêxemberek ji alî Xwedê ve bê şandin û Ereban bîne ser hev, yektiya wan pêk bîne, ewê bikaribin dewletê ava bikin û di vê xebatê de bi ser bikevin. Bi awayên din, gava ku qebîleyek wan hinekên din tîxe bin serweriya xwe, armanca wê ya yekemîn malên wan sitandin û ji van malan îstifade kirine. "Çimkî Ereban ji ber tebîetên xwe yên wehşî talankar in û li ser rûyê erdê qewmek xe-

rabkir in”⁽³⁴⁾. Adetek Ereban ê nebaş jî ji bo dîtina serok û serokatîyê, avêtina wan a berhev û hemberiya hevdû kirine. Ji wan hemû kes dixwaze bibe serok û karbidestiyê têxe destê xwe.

Li gor Îbnî Haldûn di jiyana dewletekê de ji dîn, zanyarî, bazirgan û xerîban re hûrmet nîşandan gelek girîng e. Kesên ku li serê dewletê ne vana nehesibînîn û ji wan re hurmet nîşan nedin, tê wê manê ku dewlet li ber hilweşînê ye. Herweha li pey zewkan çûyin û di nav nîmetan mayin jî dewletê kevin dike û hêdî hêdî ji holê radike⁽³⁵⁾. Li gor Îbnî Haldûn di karbidestîya dewletekê de bi bazirganiyê re bilîbûna hukumdar û karmendên dewletê, dê xesarê bigîhîne gel, riya zulmê vebike û pergela jiyana civakî xera bike. Dê ev yek riya medeniyetê jî bixitimîne, bi xwe re ji bo gel bacên giran û xizmetên zarûrî bîne. Dê vê rewşa xerab a ku ewê zilmê bi xwe re bîne, dê daxwaza xebitîna gel jî bişikê û jiyana civakî xesar bibîne⁽³⁶⁾.

Îbnî Haldûn xerabî û zalimiya dewletê ji bo hemwelatîyan baş nabîne. Li gor wî başiya dewletê di dilovaniya wê de ye⁽³⁷⁾. Ger dewlet tedayê li gel bike, li sûc û kêmasiyên biçûk ên ku nayên dîtîn bigere, gel di nav tirs û xofê de dimîne û ji bo ku ji cezayan azad bibe dest bi derew û hîleyan dike. Di encama vê yekê de exlaqê gel xera dibe û gel jî di qada şer de hesabê vê yekê ji hukumdarê dipirse. Heta ev gelê ku di bin zilim û tadayê de maye dikare hukumdarê xwe bikuje. Hukumdarê ku gelê xwe bixêşîne û bi wan qenciye bike, ji alî gel ve tê heskirin û gel xwe di ber wî de feda dike⁽³⁸⁾.

Wek avabûn, pêşveçûn û bi şûn ve mayîna dewletan, Îbnî Haldûn li ser hilweşîna dewletan jî radiweste. Bi ya wî pîştî ku dewlet pîr bûn, êdî wexta hilweşîna wan tê. Ew emrê dewletekê di dora 120 salan de dimîne; ev dikare piçekî kêman dirêjtir jî be⁽³⁹⁾.

Gelo haya Ehmedê Xanî ji kitêba Îbnî Haldûn hebû? Bi rastî, bi qasî agahiyên ku di destê me de ne em nikarin di vê yekê de bigîhîjin encamekê; lê belê herduyan jî di avakirina dewletê de rolê zorê dîtine û li ser rawestîne. Heta hin taybetiyên ku Îbnî Haldûn ji bo Ereban rêz dike -pirsa ku her kesî xwe ser û serok didît- Ehmedê Xanî jî wek taybetiyên Kurdan nîşan dide.

Çawa ku Îbnî Haldûn koçerîya Ereban di riya dewletê de wek astengekî dibîne, wusa jî E. Xanî bêtifaqî û hevdû nehesibandina qebilên Kurdan di avakirana dewletê de astengek sereke dibîne. Ev bêtifaqî ye ku qebilên Kurdan ji tîrê qezayan re dike armanc û wan dike leşkerên Rûm, Ereb û Eceman. E. Xanî weha dinivîse:

Bifikir ji Ereb heta Gurcan
Kurmaniye bûye şihbê bircan
Ev Rûm û Ecem bi wan hesar in
Kurmançî hemî li çar kenar in
Herdû terefan qebilên Kurmanç
Bo tîrê qeza kirine amanc
Goya ku li serhedan kilid in
Her taife seddek in sedid in⁽⁴⁰⁾.

Navê ‘ji tîrê qeza re bûna amancê’ bêdewletî ye. Heta ku dewleta mirov tune be, mirov ji tîrên tunekirin û qirkirinan re hedef û armanc e; ji xelqê re mertal e; keleha

Rûm, Ecem û Ereban e.

Bi qasî Îbnî Haldûn ji bo E. Xanî jî edalet girîng e. Ew jî wekî Îbnî Haldûn ji bo pêkanîna edaletê avakirina dewletê hewce-dariyek zarûrî dibîne. Ji bo E. Xanî nebûna dewletê bêedaletî, alozî û tevlihevî ye. Nebûna dewletê di destê viya û wiya de ji vî şerî bazdana wî şerî ye.

Di îdarekirina dewletê de E. Xanî rolekî girîng dide çîna karbidest. Bi ya wî mîr, ango gava ku serokê dewletê alîkar, wezîr û şewirmendên xwe baş nebijêre, dê di îdarekirina dewletê de qusûr û kêmasî her hebe. Karê dewletê rast û adil nemeşe. Çimkî ji bo mîrekî (serokê dewletê- hukumdar) jîrî-tî û ronakbîrî bi serê xwe têr nake; divê mîr dilsaf mebe û bi hêsanî bikaribe karan ji hevdû biqetîne, çêyî û neçêyiyê ji hev cuda bike. Gava ku mîr di îdarekirina dewletê de vê zanîn û qabilyeta xwe nişan nede, ewê di destê wezîr, şewirmend û alîkarên xwe de bibe pêleystok û bimîne. Ew kesên ku nêzikên mîr in û xwediyê xerazê ne, dê her tiştên xwe wek rastî bi mîr bidin bawerkerin û ji merheleyekê bi şûn de, êdî ewê hewce nebînin ku bi mîr jî bişewirin. Di îdarekirina dewletê de ji bo ku mîrek nekeve rewşeke weha xerab, di vê di serî de xwe ji van kesên çikûd, bênîjad, kêmaqil, niyetxerab, exlaqnebaş biparêze; wan ji xwe re neke heval, rêber, pêşeng û wezîrê dewletê. E. Xanî weha dibêje:

Mîrin hene aqil in, ezîz in

Lê sadedil in, di bê temîz in

Ew sade ji bilh û natemamî

Dil nadine menşea kelamî

Wan dil guh e, guh bi dil ve nîne

Raşçav in û merdimek sîpt ne

Herçî ku dibêjine xerazdar

Bawer dikin ew bi rastiyê xwar

Nabên: Eve qenc e ya xirab e

Nabên: Eve xet e ya sewab e

Qasirnazer in di bê teemmil

Hazirxezab in di bê tehemmil

Exlad dibin ew bi aqlê mexrûr

Ekser digerin ji danişê dûr

Bedxab û bexil û bedsekalan

Bedesil û sefîh û bedfîalan

Tînin dikine refik û rehber

Bednamê dibin wezîr û serwer

Disipêrine wan kesan umûrê

Ew êdxine dewletê qusûrê(41).

E. Xanî baş dizane ku dewlet ji serî de tê îdarekirin; gava ku nexweşî ket serî, ewê hêdî hêdî tevahiya laş jî bigire. Çimkî ew dizane ku serî rizî bû, ewê laş genî bibe. Li gor nêrîna E. Xanî ji bo mîrekî, di kargerîya dewletê de hebûna guh û hebûna çav; yanê dîtî û bihîstin tu car têr nake; divê dîtî û bihîstin bi hîskirinê re, ango bi hîskirina dil re bibe yek. Çimkî kargerîya dewletê, îdarekirina mirovan bi tenê bi guh dayînê, bi dîtî û bi fermanan dayînê nabe; divê deriyê dilê mîrê dewletê vekirî-be. Ev yek ji bo E. Xanî pîrr girîng e ku dibêje, “ Wan dil heye, guh bi dil ve nîne.” Divê guh û çav bi dil ve, dil jî bi mêjtî ve girêdayî be ku kar bi duristî bimeşin. Ew mîrê ku nikaribe vê yekê pêk bîne karê dewleta wî baş nameşe û bi gotina Îbnî Haldûn, an mîrîtiya wî û an jî dewleta wî li ber têkçûnê ye. Lê herçî mîrên ku jîr in û bi rastî jî mirovê dewletê ne û xwedan siyaset in, hemû tiştên wan bi pîvan e. E. Xanî weha didomîne:

Mîrêd bi dewlet û feraset
 Sahib şefaquet û xwedan siyaset
 Ew her kesekî xwedan nakin
 Hetta wekû îmtihan nakin
 Cil carî dikin yekê miccerreb
 Paşê ewî dê bikin miqerreb
 Ev mîr û wezîriya cihanî
 Ev bergîw kizîriya zemanî
 Herdû bi mîsalê yek dilîzin
 Herdû di betal û bê temîz in
 Hetta weku ger nebê tu "exlaq"
 Kengî dibiyê wezîrê mitlaq(42).

Di dîroka mirovatîyê û jiyana civakî de, qet şik tune ye ku organîzasyona herî pirralî û dorfireh dewlet e. Belkî jî dewlet - bi çêyî û neçêyiyên xwe- îcada herî mezin a kurê mirov e. Gelên bindest, çiqas bi hêz û çiqas xurt bin jî, ger ku bê dewlet û bê sazgehên netewî bin, nikarin hêza xwe ya afirênêr nîşan bidin û di dîroka mirovatîyê de mora xwe li îcad û xebatên mezin bixin. Ji ber E. Xanî bi vê yekê baş dizanibû û ev rastî dîtîbû pêwîstiya avakirina dewleta Kurdî dianî ziman û bi girîngî li ser vê yekê radiwestiya. Rast e, E. Xanî dewlet, dewletek Kurdî diwest; lê dewletek çawa dixwest jî bi aşkerayî radixist ber çavan. Di rêzên jorîn de jî xuya dike, modelê dewleta ku E. Xanî dixwest gerdûnî bû. Di rêzên jorîn de, ji bo dewletekê çend peyvên ku bi ber çavê mirov dikevin ev in: Mîrîtî, pêşengî, şewirmendî, wezîrî, serwerî, siyaset, dilovanî, exlaq, jîrîtî, ronakbîrî (ezîzî), dilsafî, dildarî, dem(wext), cihanî, yek (wekhev) xwedantî, kehyatî, paqijî, xerezî, rêberî, têgihîştinî (kemalî), xwedîkirin, îmtihan (ceribandin), dûrînedîtî, bêramanî, hêrsokî,

bêtehemulî, mexrûrî, bêbextî, betalî, niyet-xerabî, çikûdî, bēnîjadî(bēeslî), kêmaqilî, niyetxerabî, qencî, qusûr, xerabî, rastî, çewtî, nêzî û dûrî. Ev hemû ancax dikarin di kargerîya dewletekê de werin rû hev; peywendî û tēkiliya navbera van tiştan zivirîna çerxa dewletê ye. Çerxa dewletê, aşê dewletê bi vana digere.

Di gel vê yekê tercîha E. Xanî zelal e. Di çerxa dewletê de ji bo wî dilovanî, exlaq û îmtihan(ceribandin- dîsîplîn) girîng e. Nema-ze ev yek xwe di tēkiliyên navbera gel û dewletê de nîşan didin. Siyaseta dewletê ya rastîn dikare li ser vê bingehe ava bibe. Dewlet avahiyek ciddî ye û ji dilbûnê dixwaze. Kesê ku ewê di kargerîya dewletê de cih bistîne, bi gotina E. Xanî divê çil caran bê ceribandin; çil caran di îmtihanê de derbas bibe. Bi rastî ev hesasiyeta E. Xanî ya di îdarekirina dewletê de pê re filozofê Platon tîne bîra mirov. Di dewleta Platon de filozof dikaribû bihata ser hukum; lê di dewleta E. Xanî de jî ji bo hatina ser hukum çil îmtihan, çil ceribandin li pêş mirov hene. E. Xanî wekî Platon deriyê kargerîya dewleta xwe bi tenê ji filozofan re venake, deriyên wî ji hemû kesî re vekirî ne, lê bi şertê ku mirov di van îmtihanên zor û dijwar de derbas bibe. Bêguman ev yek jî qet ne hêsan e û hemû kes jî xwe nêzikî vê îmtihan û ceribandîne nake.

Ew dilovaniya ku Îbnî Haldûn ji bo hukumdarê dewletê pêwîst didît di kargerîya dewleta E. Xanî de jî esas e. E. Xanî jî ji bo mîrîtiya dewletê dilovaniyê pêwîst dibîne.

Îbnî Haldûn ji bo dewletekê salên jiyane dihesibîne û wî temenî di dora sed û bîstan de dibîne. Ew bi pirranî dewletên dema

xwe û berî xwe yê nêkêmemir nimûne dibîne ku digihîje vê encamê. Lê ji bo E. Xanî temenê dewletê bi salan nayê hesibîn û dewlet heta ku ji armanca xwe dûr nekeve dê her bijî.

Bi qasî Platon nebe jî yekî ku bi dîtînen xwe yê nê li ser dewlet û hukumdariyê ji mu-naqeseyan re bûye mijar jî Machîavelî ye. Machîavelî di sala 1469'an de li Floransayê hat dinyayê. Gava ku Machîavelî vê berhe-ma xwe ya bi nav û deng nivîstî, Îtalya ji ye-kîtiya xwe ya siyasî dûr bû. Li nîvgirava Îtalya karbidestîya siyasî di nav pênc dewle-tên bajarî de parve bûbû. Ev dewletên baja-rî jî Floransa, Mîlano, Napolî, Roma û Ve-nedîk bûn. Çi heye ku ev dewletên biçûk jî di bin tehdîta dewletên mezin de bûn. Bê-guman vê rewşa siyasî Machîavelî gelek aciz dikir; çimkî Machîavelî Îtalyayek yek-bûyî û serbixwe dixwest. Ehmedê Xanî jî du sed salî piştî Machîavelî li Kurdîstana bindest û parvebûyî vê daxwazê dianî zim-an. Di bîngê de tu cihêtiyek esasî di navbera mîrîtiyên Kurdîstanê û bajarên dewletî yê nê Îtalyayê de tunebû. Herdû welat jî ji otorîteyek netewî û navendî bêpar bûn. Ji ber tunebûna otorîteyek navendî û netewî herdu welat jî ji êrîşên derve re di-bûn armanc û diman.

Kitêba Machîavelî ya bi navê Hukum-dar ji bo serok û rêberên dewletan, ji bo wan gelên ku dixwazin bibin dewlet, ji bo wan dewletên ku dixwazin axa xwe mezin-tir bikin, ji bo hukumdarên ku dixwazin karbidestîya xwe firehtir û bihêztir bikin wekî şîretan e. Bi kurtî felsefa Machîavelî bi vî awayî dikare bê beyankirin: " Ji bo gi-hîştina armancê her wasita meşrû ye." Ew

di îdarekirina dewletan de vê yekê rast di-bîne û ev yek ji bo wî vaqiyek e. Di nêrî-na Machîavelî de şîddet rolekî girîng digi-re. Heta li gor wî pêxemberên çekdar digi-hîjin armanca xwe, lê pêxemberên bêçek bi ser nakevin⁽⁴³⁾.

Di felsefa Machîavelî de hêz rolekî esasî digire. Bîngê hêzê jî ordiya netewî ye. Li gor Machîavelî, " Divê hukumdarek ji şer û ji bisazkirin û dîsîplîna ordiyê zêdetir tiş-tekî nefikire û bi karekî din re bilî nebe. Çimkî karê yekî ku fermandariyê dike bi tenê ev e'⁽⁴⁴⁾. Divê hukumdarek ji karên leşkerî dûr nemîne û ji demên şer zêdetir di demên aştîyê de bi vî karî re bilî bibe. Machîavelî jî xerabiyê di afirîna mirovan de dibîne; bi ya wî mirov ji bûna xwe ve xerab tîn dinyayê. Ji ber vê yekê ye ku ew li hember menfaetê pê re heskirina xwe hunda dikin. Heta ew wusa pêş ve diçe ku pêvegîrêdana mal derdixe ser pêvegîrêdana xwîni. Machîavelî weha dinivîse," Gava ku pêwîst be mirov dikare bikeve xwîna yekî. Tiştên ku ji vê yekê re bûne sedem bi aş-kerayî bî nê beyankirin pirs tune ye. Lê divê nemaze mirov dest nede malê yekî. Çimkî mirov hundakirina bavê xwe ji bîr dikin, lê hundakirina malên xwe ji bîr nakin"⁽⁴⁵⁾.

Di sazûmnek bi vî awayî rola tirsê jî ge-lek e. Li gor Machîavelî gava ku tercîha mirovekî ku jê tê heskirin û yekî ku jê tê tirsîn derkeve pêşîya mirov, divê tercîh yê ku jê tê tirsîn be. Çimkî, " Mirov bi pirra-nî nankor, guhêrbar, durû, ji ber xeteran revok û bi berjewendiyên xwe ve girêdayî ne"⁽⁴⁶⁾. Ger ku hukumdarek bixwaze gelê xwe di nav yekîtiyê de biparêze, divê ji bê-dilovaniyê netirse û nereve. Herweha divê

hukumdar bi tu awayî comerd jî nebe; çimkî, “di dinyayê de tu tiştêkî ku bi qasî comerdîyê mirov diqedîne tune⁽⁴⁷⁾. Divê hukumdarek ji timahiyê netirse. Xizanî ji timahiyê xerabtir e. Ji alî hukumdar ve şêlandina gel jî dê bêitibariyê bi xwe re bîne. Machîavelî weha dinivîse: “Gava ku yek derkeve û bibêje Sesar bi comerdîya xwe bû hukûmdar, gelek kes jî bi comerdîya xwe hatin ciyên baş; ezê vê bersivê bidim wî: An hûn hukumdar in û an jî hûn di riya hukumdarbûnê de ne. Di rewşa yekemîn de tu feydeyek comerdîyê tune. Gava ku mirov di riya hukumdarbûnê de ye feyda comerd xuyabûnê heye”⁽⁴⁸⁾.

Li gor Machîavelî ji bo hukumderkî daxwaza fetihkirinê normal û tebîî ye. “Ger mirov dikaribin vî karî bikin, divê neyên gunehkarkirin, peznê wan bê dayin”⁽⁴⁹⁾. Ji bo dewletekê ji şer revîn tiştêkî nebaş e. Şer vaqîyeyek zarûrî ye. Bi tenê mirov dikare şer li gor berjewendiyên xwe texîr bike⁽⁵⁰⁾. Herweha dagirkerî ji daxwazek gelek normal û li cih e. Dagirkirina welatekî ku gelê wî hînî jiyana serbixwe nebûye hêsan e. Ger ku zimanê dagirkeran û gelê welatê ku hatiye dagirkirin yek be, karê dagirkeriyê hêsanîr e. Bi vî awayî Machîavelî di dagirkirina welatan de rolê ziman jî radixe ber çavan. Ziman û awayê jiyane faktorek girîng in. Di bûyera dagirkirinê de nuqteyek girîng jî li ciyê dagirkerî bi cih bûyin e. Wekî Machîavelî jî beyan dike ev metodê Tirkan e⁽⁵¹⁾. Di dagirkirinê de çareyek din jî li nûqteyên girîng ên welatê dagirkerî koçeran bicihkirin e. Çimkî koçer ji leşkeran kêmtir dibin mesref. Bi ser vana hemûyan jî Machîavelî weha dinivîse, “Tiştê ku divê

mirov li ser raweste ev e: Divê an mirov bi dest bèn xistin û an jî koka wan bê rakirin; mirov li hemeber tadeyên biçûk radibin ku tol bistînin, lê li ber tadeyên giran di ber xwe nadin. Gava ku li mirovekî tade hat kirin, divê wusa bê kirin ku ew careke din keys nebîne ku tol bistîne”⁽⁵²⁾. Di gel van hemûyan, dîsa jî dagirkirina gel û dewletên ku fêrî jiyane azad bûne gelek dijwar e. Machîavelî sê riyên vê yekê dibîne: “Riya yekemîn hilweşandin e. Riya duwemîn li wî welatî bi cih bûn e. Riya sêwemîn jî welatê dagirkerî bi qûnên wê yên berê hêştin e”⁽⁵³⁾. Di gel van riyan jî tercîha Machîavelî li ser hilweşandinê ye; çimkî li gor wî, “Yek, gava bajarekî ku hînî azadiyê bûye bi dest bixwe hilweşîne, divê li benda ku ewê ew bajêr wî hilweşîne bisekine”⁽⁵⁴⁾.

Machîavelî li ser sîtema Tirk û Osmanîyan jî xebitiye û di kêtêba xwe de gelek çaran ji Tirk û Osmanîyan nimûne daye; çarê wan kiriye. Li gor dîtina wî hukumdariya Tirkan bi dest xistin gelek dijwar e, lê gava ku hat bi destxistin jî di dest de hêştina wê gelek hêsan e. Berevajiyê vê yekê bi destxistina Melîkiya Fransayê hêsan, lê belê wê di dest de hêştin dijwar e. Bêguman tesbîta wî ya herî girîng a li ser Osmanîya ev e, “Her kî ku êrîşî dewleta Osmanî bike, divê bihesibîne ku ewê wan di nav yekîtiyê de bibîne”⁽⁵⁵⁾.

Machîavelî vê kitêba xwe ji bo Lorenzo De Medici, bi armanca diyariyekê dinivîse. Lê bi rastî armanca Machîavelî ji nû ve pêkanîna yekîtiya Îtalyayê ye. Ji bo ku ev yekîtiyê pêk bê jî, di serî de şer, her rê meşrû ye. Di dawîya kitêbê de ew weha daxwaza xwe tîne ziman, “... Her şerê ku zarûrî ye mafdar

e. Li ciyê ku ji tiştêkî din hêvî nemîne çek pîroz e.”⁽⁶⁶⁾ Di riya avakirina yekîtiya dewletê de, piştî ku Mavhîavelî ji hêz, jîrîti û mêrxasiya Îtalyayîyan behs dike, kêmasiya nebûna ordiyek netewî tîne ziman. Machîavelî weha dibêje; “Ger ku hûn jî dixwazin li ser şopa wan mirovên mezin ên ku welatê xwe azad kirin herin, divê berî her tiştî, hûn bibin xwedî ordiyek netewî ku bingeha hemû seredanan e. Çimkî ji vê ordiyê ewletir, rasttir û çêtir tune”⁽⁶⁷⁾.

Di navbera mercên Îtalyayê yên ku Machîavelî jê gazin dikir û mercên Kurdistanê yên E. Xanî jê gazin dikir de pîrr cihêti rûnebû û heta em dikarin bibêjin ku dirûvê wan bi hev dixist. Lê pêş Machîavelî bajarên dewletî yên wekî Floransa, Mîlano, Napoli, Roma û Venedîkê, li ber E. Xanî jî mîrekiyên Kurdistanê yên wekî Colemêrg, Bilîs, Diyarbekir, Riha, Finik, Hesenkêf, Egil, Erdelan, Baban, Botan, Farqîn, Qulp û hwd. hebûn. Heta li pêş E. Xanî bi ser van mîrekiyan de jî eşîr û qebileyên Kurdan hebûn ku ji hev tar û mar bûn. Vê rewşa aloz û tevlihev, vê rewşa ji hev belavbûyî û tar û mar a Îtalya û Kurdistanê Machîavelî û E. Xanî ji bo avakirina dewletek yekbûyî rakiribû ser lingan.

Machîavelî ji bo avakirina Îtalyeyek yekbûyî Lorenzo De Medici wek hêvî didit û berhema xwe ya bi navê Hukumdar pêşkêşî wî dikir. E. Xanî jî di nav mîrekiyên Kurdistanê de li ser mîrekiyê radiwest û wê wek hêvî nîşan dida. Bêguman ev mîreki mîrekiya Botan bû. Ancax mîrên Botan dikaribûn yekîtiya mîreki û qebileyên Kurdistanê pêk bînin û riya dewletek Kurdî ya yekbûyî vekin. Çawa ku li Îtalyayê hêzek

siyasî û aborî ya malbata Medici hebû, wusa jî li Kurdistanê hêzek siyasî û aborî ya mîrên Cizîrê hebû- ku ev malbat di dîrokê de wek Bedirxaniyan tê naskirin. Floransa li Îtalyayê herêmek kulturî û hunerî bû; herweha Cizîra Botan jî li Kurdistanê herêmek kulturî, zanistî û hunerî bû. Li Îtalyayê Floransa bi rûmet, li Kurdistanê jî Cizîra Botan giranbûha bû. Cizîrê ji alî rê, avahî û piran de jî gelek pêş ve çûbû û bi tenê di dema Emeviyan de li Cizîrê û hawirdora wê 360 camî û 90 medrese hebûn⁽⁶⁸⁾. Cizîre navendek kulturî û zanistiyek wusa ku alimên wekî Ebûlîz Îsmâil Bîn Rezaz El Cezerî (1153-1233) û Melayê Cizîrî gihandibû. Bi ser vana hemûyan de Cizîr di navbera Rojhilat û Rojava de pîrek bû û li ser Riya Îpekê bû. Ango Cizîr navendek bazirganî jî bû; Ewrûpayê bi Asyayê ve Asyayê jî bi Ewrûpayê ve girêdida.

Gava ku mirov van taybetiyên Cizîrê bîne ber çavê xwe, hingê dê mirov bikaribe tê bigihîje ka çima E. Xanî peznê mîrên Botan dida. Li vir ev pîrs dikare bê pîrsîn? Ciyê ku bûyera Mem û Zîn lê derbas bûbû ne Cizîr bû? Erê rast e, bûyera Mem û Zînê li Cizîrê derbas dibe, lê gavê ku Mem û Zîn ji naceroka xwe ya siyasî bê dîrxistin wê gavê ewê bibe çîrokek an jî destanek evîne û bimîne. Lê em dizanin ku E. Xanî bi naverokek wusa ev bûyer xemilandibû û kemilandibû ku destana evîne di siya mesajên siyasî de heştibû. Di vê nuqtê de ew tiştên ku E. Xanî digot wusa balkêş bûn ku, piştî dused û pêncî salî dê Celadet Alî Bedirxan, di nameya xwe ya ku ji Mustefa Kemal re şandibû de weha digot, “Ehmedê Xanî di berhema xwe ya ku mijara xwe ji

efsaneyek gelî distîne de, ji serî heta binî ji neteweperestiya Kurdî û Kurdistanê qal dike. Şexsên ku dide peyivandin bi tevahî sembol in. Ew kesê ku nûnertiya miletê Kurd dike, bi dîmîtû dike zîndanê û riyên rizgarkira wî bi gel dide gerandin û nîşan dide”⁽⁵⁹⁾.

Bi rastî jî gava ku E. Xanî van rêzên jêrîn li ser kaxizê dinivîsî armanca wî çi bû?

Sazê dilê kul bi zêr û bem bit
Sazendeyê Işqê Zîn û Mem bit
Şerha xemê dil bikim fesane
Zîne û Memê bikim behane
Nexmê we ji perdeyê derînim
Zîne û Memê ji nû ve vejînim.

Mirov pê re dikare li vir bipirse? Gelo derdê dilê E. Xanî çi bû? Bêguman derdê E. Xanî yê herî mezin yekîtiyek Kurdan pêk anîn û avakirina dewletek Kurdî bû. Derdê xwe, daxwaz û merama xwe kêm kesî bi qasî E. Xanî zelal û bêfikare anîbû zîman. Ji xwe E. Xanî zelalî ye. Bi rastî jî wî derdê dilê xwe kir efsane û Zîn û Mem jî ji vê yekê re kir behane. Hem Machîavelî û hem jî E. Xanî li ser riya rast bûn; riya avakirina dewleta ku Machîavelî dixwest ava bike di Floransayê de, riya dewleta Kurdî ya ku E. Xanî dixwest ava bike di Cizîra Botan re derbas dibû. Herdû jî li ser riya rast bûn û di vê nûqtê de dirûvê wan bi hev dixist.

Qet şik tune ye ku E. Xanî di Mem û Zîne de avahiya dewletê bi mîrîtiya Botan re

yek dibîne. Mîrîtiya Botan protîpa dewletê ye. Di vê mîrîtiyê de Mîrzeydîn serokîtiya dewletê, begên Botan alîkarî û wezîrî, Bekoyê Awan şewirmendî, tacdîn û birayê xwe hêza leşkerî temsîl dikirin. E. Xanî bi vî awayî salixê Mîrê Botan dida:

Go: Padîşahek zemanê sabîq
Rabû di hukûmeta xwe faîq
Encasê milel mitfû minqad
Neslê wî Erebb, Emîrê Ekrad

Textê wî Cizîr û bextî mesûd
Tahî qewiy û meqamî mehmûd
Rom û Erebb û Ecem di ferman
Meşhûrê bi navê “Mîrê Botan”
Abaê izam û cedd û walid
Mensûb û miselselêd Xalid
Cebare felek ji wî hezar kar
Meslûle ji sellê seyfê Cebbar
Zibendeyê milk û zeynê dîn bû
Navê wî Emîrî “Zeynidîn” bû
Mîrî ji wî re bi dîni marûf
Zînet ji wî re bi dîni marûf
Asarê şecaeta wî şahî
Dagirtî ji mahê ta bi mahî
Mahiyetê wî medarê dinya
Şahiyetê wî şîarê uqba
Mihtacê sexaweta wî Hatem
Mexlûbê şecaeta wî Ristem
Hatem ji kemalê hîmmeta wey
Tomarê sexaweta xwe kir tey
Aql û huner û sexa û meydan
Zebr û neseq û nîzam û dîwan
Dîndariyû dewlet û diyanet
Serdariyû sewlet û siyanet
Meşhûnê ji her yekê xezînek
Meknûnê ji her yekê defînek

Bê usri ji bo wî ra miyesser
 Bê xusri ji bo wî ra miqedder
 Enwaê newadir û cewahir
 Elwanê nefâs û zewahir
 Mecmûeyê mimkinatê meqsûd
 Wacib kiribûn li nik wî mewcûd
 Hasil bi wî middea û medûb
 Wasil bi wî mişteha û mehbûb
 Sehna heremê ji nazenînan
 Cennet tujîbû ji horînan
 Horî wî di cennetê gelek bûn
 Xilman wî di hezretê melek bûn(60).

Li vir bi aşkerayî tê dîtin ku Mîrê Botan heyî, padîşahî, desthilatdarî, comerdî, sazûman, dîndarî, dewlemendî, yekîtî, zanyarî, huner, hunermendî, mêrxasî, serdarî, serwerî, ronahî, şarezayî, bedewî, meqam, nîjad, bext, text, biryar, hêz û dewletê temsîl dike. Mîrê Botan dewlet e; dewlet mîrê Botan e. Dîsa E. Xanî ji Tacdîn û birayên xwe yên ku hêza dewletê temsîl dikin, çek û şûrê dewletê ne weha qal dike:

Tacdîni digotîne ciwanek
 Guhderzê zemanê pehlewaneke
 Nesl û neseb û hesab eyan bû
 Serdefter û serwerê kuran bû
 Babê wî digotîne Sikender
 Lêkîn Ereban digo Xezenfer
 Lewra ku bi şêrî şîhbê şêr bû
 Roja şêrî ew hezari mêr bû
 Tacdîn du bira hebûn di qellaş
 Manendê du şahîbazê cemmaş
 Daîm dilê dijminan disotin
 Yek Arif û yek Çeko digotin
 Emma wî ji cimle xas û aman
 Ji ew çende bira û bab û maman

Lawek kiribû bira ji bo xwe
 Nê... Ez xelet im... Çira ji bo xwe
 Roja ku ewî bira nedîta
 Teşbîhê şeva çira nedîta
 Dinya li wî tîk dibûye tarî
 Roj bû ku li wî dikir tewarî
 Enbazê fereh, şerîkê xem bû
 Sergeşteyê xem bi navê Mem bû
 Mem ji wî aşîqek tamam bû
 Ne şîbhê bira û bab û mam bû
 Her çendî birayê aîret bû
 Te digo ku dinê û axîret bû
 Tacdîn weledê Wezîrê Dîwan
 Mem jî xelefê Debirê Dîwan(61).

Em di van rêzan de rolên bavê Tacdîn û Mem ê di avahiya dewletê de jî fêr dibin. Herweha Tacdîn kurê Wezîrê Dîwanê, Mem jî kurê Katibê dîwanê ye. Rûyê dewletê yê tal û tirş, gerîna çerxa dewletê di şexsê Bekir de bêtir tê dîtin. Bekir rûyê dewletê yê resmî û rastiya dewletê ye. Rûçîkê dewletê yê veşartî di kirinên Bekir de bi aşkerayî tîn dîtin. E. Xanî weha didomîne:

Elqîse: Bi iqtizayê xîlqet
 Mîrê bi kemal û izz û rifet
 Ragirtî ji bo xwe dergevanek
 Fettanê zemmanê, sey pîsanek
 Daîm li derê wî qapûcî bû
 Qella û qelaş û qehwecîbû
 Emma bi neseb ne ferdê Botan
 Belkî kitewellidê ji buhtan
 Eslê wî dibên ji Mergever bû
 Mehza wî beşer bi sor û şer bû
 Navê wî minafîqî Bekir bû
 Belkî ji Belûqîya betir bû

Menna û mizebzebîn û îblîs
 Xedda û xeberbezbîn û teblîs
 Şagirtê şeameta wî şeytan
 Şermende ji gotina wî Botan
 Bedçehrê ji rengê dêwê kabûs
 Bedfîl û sitzekar û salûs
 Tacdîn digote Mîr eyanî:
 "Mîrim! Bi der ke vî dergevanî
 Ev laiqê dergehê te nîne
 Ev kelb e, nehînder e, bi kîn e
 Herçend se û dergevan bira ne
 Eksêr se bi mihr û biwefa ne"
 Evrengê ha mîr digote Tacdîn
 "Fîlê di Bekir meger nizanîn?
 Em qismê emîri qismê aşin
 Pir fetl û ger in û pêş û paş in
 Naçare ji bo me aşivanek
 La bide ji bo me dergevanek
 Hindê bi hikûmetê dikin dewr
 Geh edle ji bo me kar û geh cewr
 Her çendî Bekir weled zina ye
 Aşê me jî wî bi fetl û baye
 Ev zumre ku zalim û ewan in
 Sûbaşîy û şehnew dergevan in
 Aşê di me zaliman digêrin
 Dextlêd me zaliman dihêrin
 Aşê me eger çi weqfê am e
 Gewrî tijî garisê heram e(62).

Dewlet û zilim du birayên cêwî ne. Ciyê
 ku dewlet lê hebe li wir tada, kedxwarî û
 zilim jî heye. Di xerc û hevîrê dewletê de,
 di avahiya dewletê de zilim heye. E. Xanî
 bi devê Mîr vê rastiya dewletê tîne ziman.
 Edalet û zilim çiqas du peyvên dijber bin jî
 di navbera wan de yekîtiyek heye. Edelet
 encamek zilmê be, zilim sedemê edaletê ye.
 Bervajiyê vê yekê jî ras e. Mîr ji aşê zilmê

qal dike. Baş e ev aşê zilmê çawa digere?
 Herwekî ku E. Xanî bi devê Mîr jî tîne zi-
 man aşê zilmê bi "garisê herem" bi keda
 neheq, bi wî berê ku bi neheqiyê tê bidest-
 xistin digere. Xwediyê vî "garisê herem"
 ango berê ku bi neheqiyê tê bidestxistin kî
 nê? Wekî ku Mîr jî dibêje gel e; karker,
 karmend, karsaz, gundî, cotkar, rezvan şî-
 van û gavan in. Ew dixebitin, ew tînin pê,
 ew diajon, ew diçînin, ew ji xwarinê re
 amade dikin; lê belê dewlet dixwe. Çerxa
 dewletê bi vî awayî difetile. E. Xanî ji şûba-
 şî (leşker-ordû), ji kehya û ji dergevanên
 dewletê wekî zumra zilmê ye ewane qal di-
 ke. Di her cûre dewletî de ordû zumra zil-
 mê ye; çimkî ordu di tu cûre dewletê de
 pêneyne, zihê dike û dixwe. Ev yek ji bo
 kehya û dergevanên dewletê, ango ew ke-
 sên ku xwedênegravî parastina dewletê li
 ser wan e, ji bo wan hemûyan wahe ye. Kar
 û barê dewletê bi vî awayî dimeşe.

Ev rûçikê dewletê yê ku E. Xanî bi aşke-
 rayî radixe ber çavan, ewê di sedsala nozde-
 han de avakarên îlmê marksîzmê bi awaye-
 kî rêk û pêk li ser bixebitin û teoriyên pê-
 wistiya ji holê rakirina dewletê bînin pê.

Machîavelî bi giranî li ser rolê zorê dise-
 kinî û serkeftina pêxemberan jî bi çekdar-
 bûna wan ve girê dida. Li gor nêrîna wî çawa
 ku pêxember nikaribûn bê çek bigihî-
 jin aramca, wusa jî dewlet bêçek û bê zor
 nedihatî avakirin. Di pêkanîna yekîtiya
 gel de jî rolê esasî diket ser zorê. Gelê ji
 hevbelavbûyî, ancax bi zora zorê dikaribû
 bihata ser hev. Machîavelî guhartina sihû-
 dê jî bi hêza zorê ve girêdida û weha di-
 got; "Çimkî sihûd mê ye, ji bo ku mirov
 wê bi dest bixê divê bi şid bilebite. Di ciyê

ku ewê xwe bi bîhnfirehan re berde, xwe bi yên weha re berdide. Ji ber tebîeta xwe ya mêyî, sihûd dostê xortan e. Çimkî xort hindik bi tedbîr, lê bêtir bi şipil in⁽⁶³⁾. Bi kurtî Machîavelî ji tûjîtiya şûr, ku pêwîst be ji kuştin û qirkirinê jî behs dikir. Ji bo hukumdariyê bi dest xistin û li ser hukum mayê zorê zarûrî didît.

Gava ku E. Xanî digot:

Herçî bire şûrî destê hîmmet
Zebtkir ji xwe re bi mêrî dewlet

Lewra ku cihan wekî erûs e

Wê hukmê di destê şûrê rûs e

Bê ceng û cidal û bêtehewwir

Qet vê şixulê mekin tesewwir⁽⁶⁴⁾.

Di pîrsa avakirina dewletê de ji Macnhîavelî pîrr cihêtir nedifikirî. Wî bi xwe jî baş dizanibû ku avakirina dewletê, bê dest avêtina şûr, bê dest avêtina çek ne mumkun e. Lê belê E. Xanî şûrekî dugulî dixwaze; ev şûre dugulî şûrê zor û zanîne ye; bi gotina roja me, top û qelem e; atom û qelem e. Zor û zanîn ku bûn bira, tu astengekî ku ji heq neyên der namîne. Tercîha Machîavelî ya di pîrsa zor û zanîn de zelal e; gava ku tercîhkirinek pêwîst be, ewê Machîavelî xwe bide ber zorê, zorê bibijêre; lê belê E. Xanî di vê yekê de naxwaze xwe bide ber tercîhekê. Ew yekîtiya zor û zanîne diparêze û di navbera van herdu mefûman de têkiliyek diyalektîk dibîne; naxwaze dubendiyê têxe navbera zor û zanîne. Heta li gor E. Xanî divê zanîn rê nîşanî şûr bide; şûr tûjîtiya xwe ji zanîne bistîne; zanîn nîşan bide şûr bibire. E. Xanî şûrê xwe bi zanîne, bi hîmmetê tûj dike. Herwekî tê zanîn ji

çar rîknên Platon jî yê yekemîn zanîn bû; di pey zanîne de mêrxasî, ango bi gotina E. Xanî şûr dihat. Bêguman hukumdariya şûr bi zorê ava dibû û zor û zilim jî hergav bira bûn. Di sedsala nozdehan de filozofên marksîst bi dorfirehî li ser teoriya zorê radiwestîn. F. Engels di vê mijarê de weha digot, "Zor, îro ordû û keştiyên şer e. Û herdu jî wekî em hemû xesara wê dibînin bi buhayî dibe mal. Lê zor pere nayne, yê ku berê pere bi dest xistiye dişêlîne û rût dike"⁽⁶⁵⁾.

Filozofekî ku bi nêrînen xwe yên li ser dewletê, nemaze ji avabûna dewletên sosyalîst re bûye nimûne Thomas More'ye. Thomas More di sala 1478' de li Londrayê hat dinê. Ji rahîbiyê bigire heta qazîrî, endamtiya parlementoyê, şewirmendiya qiral, serokatiya Qameraya Avamê û nivîskariyê, gelek kar kirine. Berhema wî ya herî bi nav û deng, qet şik tune ye ku Utopîa'ye. Thomas More di dîtînen xwe de bêtawîz bû. Di gel ku mirovê herî nêzik ê Qral Henrî yê Heştêmîn jî bû, ji ber ku li dîjî qanûnek ku Henry derxist rabû (Henry dixwes jina xwe berde û bi Anne Boleynê re bizewize), di sala 1535'an de serê wî hat jêkirin⁽⁶⁶⁾. Gava ku bi mêrxasî serê xwe danî ber kêra celad, rihê xwe da alî û gotina xwe ya dawî got; "Çawa be rihê min ji welat re îxanet nekir. Qene bila ew jî neyê îdamkirin."

Thomas More bi navê Utopîayê giravê difikire û li ser avahiya dewletê ya vê giravê û jiyane gelê giravê dîtînen xwe tîne ziman. Li Girava Utopîayê aşî, azadî û wekhevî heye. Pêncî û çar bajarên Utopîayê hene û gelê Utopîayê; jin û mêr bi tevahî di karê çandiniyê de pişpor in. Li

Utopîayê karbideştî bi hilbijartinê tê be-
yankirin. Serok heta ku dest bi zordariyê
neke li ser karê xwe dimîne⁽⁶⁷⁾. Gelê Utpî-
ayê bi zorê naçin şer û li vir beşdarbûna
ordiyê li ser daxwazê ye. T. More li ser şer
weha dinivîse, " Utopîayî ji şer jî, ji pevç-
ûnê jî nefret dikin û vê yekê wekî tişteki
heywanî dibînin. Di gel vê yekê, bi qasî ku
mirov vî karî dikin tu heywanek nake. Be-
revajiyê hemû neteweyên din Utopîayî,
şerefa ku di şer de bi dest dixin, bêşerefiya
herî mezin dihesibînin"⁽⁶⁸⁾. Di şer de Uto-
pîayî jî kuştinê direvin û heta ku ji destê
wan rê, kesên ku êrîşt wan dikin dîl digi-
rin. Şerên xwîdar bi serkeftin jî hatibin bi
dest xistin ev Utopîayîyan gelek xemgîn di-
ke. Utopîayî di şer de ber kuştina leşkerên
kirêkirî nakevin. Li gor dîtina wan gava ku
dinya ji van leşkerên kirêkirî azad bibe, ewê
bigihîje huzûrê⁽⁶⁹⁾. Utopîayî cezayê mirinê,
îdam û kuştinê rast nabînin; sûcê cezayê
herî giran koletî ye. Di şer de, yên ku li dijî
wan şer dikin, gava ku tevî çekên xwe bèn
girtin wan dikin kole⁽⁷⁰⁾.

Li Utopîya Thomas More kar û xaniyê
her hemwelatîyî heye; li vir birçîbûn û bê-
karî tune. Gava ku di berhemdariyê de zê-
deyî çêdibe, hemû kes bi hev re riyan çêdi-
kin. Wexta xebarê ji alî dewletê ve tê beya-
nikirin û dewlet naxweze ku kes bi karên
bêkêr re biweste. Thomas More weha dini-
vîse, " Li utopîayê armanca damezrenêrên
civatê, berî her tiştî, pêkanîna hewcedari-
yên gel e; di pey de ji koletiya bedenê azad-
kirin, bi awayekî azad bikaranîna ramanê,
ji bo ku mêjî li ser huner û zanyariyê pêşve
here, heta ku ji dest bê wextê zêde qetandin
e. Ji bo Utopîayîyan dilgeşiya rastîn pêşve-

çûna ramanê ye"⁽⁷¹⁾.

Cihêtiya herî girîng a di navbera E. Xanî
û Thomas More de ev e: Thomas More
daxwazê, E. Xanî rastiye tîne ziman. Dax-
waz û rasti bi qasî ku nêzikî hevdû ne ew-
qas jî ji hev dûr in. E. Xanî dixweze welatê
xwe ji bindestiyê azad bike, Thomas More
jî dixwaze aştî û wekhevîyê bîne welatê
xwe. Thomas More şer û kûştinê nemirovî
dibîne û dixwaze di dewleta ku ava bike de
vana ji holê rake; lê E. Xanî şer û kuştinê
wek rastiye dinyayê dihesibîne. Loma di-
bêje,

Hasil ku: Dinê bi şûr û îhsan
Texsîrî dibit ji boyê însan.

Rastiya dinyayê ev e û E. Xanî vê rastiye
digire pêş çavê xwe. Bêguman E. Xanî ne
alîgirê vê rastiye ye û ew dixwaze ku ev
rewş biguhire; lê ew dibîne ku şûr û zanîn
bira ne û ev biratiya han jî, ewê hê demeke
dirêj hebe. Çimkî biratî tişteki wusa ye ku
mirov nikare birayê xwe bibijêre; ev sihûda
mirov tune; biratî tebiî ye û nayê guhartin.
Mirov dikare dostê xwe bibijêre, lê nikare
birayê xwe bibijêre. Qanûna biratiyê weha
ye.

Dîsa filozofê Îngiltz Thomas Hobbes
(1588-1679), di ilmê siyasî de bi dîtînen
xwe yên li ser dewletê gelek bal kişandîye.
Thomas Hobbes kitêba xwe ya bi Leviat-
nan di sala 1651'an de, ango tam sala ku
Ehmedê Xanî hat dinê çap kir. Leviathan
hûtek e; quwet, hêz û desthilatdariyê bi bîr
tîne. Dewleta ku Thomas Hobbes dixwaze
ava bike jî divê wekî hût, yanê wekî Leviat-
han bi hêz be da ku bi hemû awayî ji karê
selahiyetê bê der. Bêguman bingeha vê hê-

zê jî tirs e, ewê tirs dewletê ji hêza wê bê. Ji Leviathan armanca T. Hobbes ev e: Hûtek(cinawirek) feciyê yekserî yê ku laşê wî ji yekîtiya gelek tebaretan pêk hatiye. Bi vê dirûvdanê jî T. Hobbes dixwaze beyan bike ku ev tebarete destkir(sûnî) ye⁽⁷²⁾. Serê her tiştî ev hût(dewlet)e. Welat, dêr û unîversîteyê ew îdare dike û li ser navê hemû civatê dipeyive. Hêza serwer, hêza ser hemû hêzan ew e.

Thomas Hobbes beriya ku dîtînen xwe yên li ser dewletê bîne ziman, ew ji rewşa tebiî qal dike. Li gor wî mirov wekhev tên dinyayê; lê belê ji vê wekheviyê bêitibarî, ji bêitabariyê jî şer derdikeve. Thomas Hobbes di tebîeta mirov de sê sedemên bingehîn ên şer dibîne. Ev reqabet, bêitibarî û şan û şeref in. T. Hobbes weha dinivîse: "Ya yekemîn, ji bo qezancê; ya duwemîn, ji bo ewlekariyê; ya sêwemîn jî ji bo nav û deng mirov tam dide tekoştinê"⁽⁷³⁾. T. Hobbes van sedeman jî weha beyan dike: Ya yekemîn, ji bo serweriya li ser jin, zarûk, û heywanên mirovên din şidetê bi kar tîne. Ya duwemîn, ji bo parastina xwe; ya sêwemîn ji biçûkdîtîne bigire heta neyartî û sedemên din şidetê bi kar tîne.

Thomas Hobbes rewşa tabîî ji bo mirov rewşeke tevlihev û bêserûber dihesibîne. Vê rewşa ku dewlet tune ye, rewşeka wusa ye ku mirov hemû bi hev re di nav şer de ne. T. Hobbes weha dom dike, "Li vir ev bi aşkarayî tê dîtîn ku, dema hêzeke giştî ya ku tevê mirovan di bin tirsê xwe de bigire tunebe, mirov di jiyana xwe de di nav wê rewşa şer de ne û ev şer şerê hemû kesî yê li hember hemû kesî ye. Çimkî şer bi tenê ji cengê û lihevixistinê pêk nayê"⁽⁷⁴⁾. Herweha

T. Hobbes şer bi bêitabarî û tevliheviyê ve jî girê dide. Mirovên ku îtibara wan bi hev neyê, ji hev bitirsîn, nikarin li ba hev, li rû hev di nav sulh û aştîyê de bijîn. T. Hobbes peyva xwe ya bi nav û deng, "Homo hominî lupus"(Mirov gurên hev in) ji bo vê demê bi kar tîne. Li gor wî mirov çiqas wekhev bînin dinê jî, ji bûyina xwe ve ji hev re neyar in; gurên hev in.

Şerê hemû kesî yê li hember hemû kesî rewşeke wusa xerab diafirîne ku mirov nikarin ji hêza xwe ya afirîner îstifade bikin. Li gor T. Hobbes di vê rewşê de ji xebatê re îmkân tune; çimkî bergîdana xebatê ne malûm e. Ji çandina erd, ticaret û deryavaniyê re jî îmkân tune. Ne ji avakirina xaniyan û çêkirina rîyan re, ne jî ji zanîn, xwendin û xebata hunerî re îmkân heye. "Ji hemû tiştî xerabtir hergav tirsê şidet û kuştinê heye û jiyana mirov xizan, xerab, hov û kurt e"⁽⁷⁵⁾.

Di şerê hemû kesî yê bi hemû kesî re tu tiştek ne li dijî edaletê ye. Çimkî êdî li vir, rast, çewt, edalet û bêedaletî tune. "Li ciyê ku hêza giştî tune be qanûn tune; li ciyê ku qanûn lê tunebin bêedaletî jî tune. Şidet û hîle di şer de du armancên herî mezin in"⁽⁷⁶⁾.

Baş e, rîya ji vê tevlihevî û bêserûberiyê rizgarbûnê çî ye? Bêguman dewlet e. Ewê dewlet mirovan ji tirsê hev û êrîşên derve biparêze. Gava ku hemû mensûbên civatê tevê qudret û hêza xwe sipartin kes an heyetê û ev kes an heyet bû îradeya giştî, dewlet pêk tê. Êdî ev kes an heyet ji aştî û ewlekariya giştî berpirsiyar e. Dewlet peymanî bi hemû kesî ya bi hemû kesî re ye; yekbûna hemû kesî ya bi şexsiyetekê re ye.

T. Hobbes weha dinivîse,” Gava ku ev hat kirin, êdî civata ku wek şexsekî bûye yek; DEWLETEK, bi Latînî wekî CIVÎTAS tê binavkirin. Ha ev HÛT (ejderha), an em parî bi hurmet bipeyivin, di bin Xwedayê Bêmirin de, hatina dinê ya Xwedayê Bimirin ê ku em aştî û parastina xwe deyndarê wî ne weha çêdibe”⁽⁷⁷⁾. Li gor T. Hobbes ji bo jiyaneke bêtirs, bi rûmet û di nav aştîyê de, dewlet hewcedariyek zarûrî ye. Di avahiya dewletê de hêza şûr esas e. T. Hobbes weha dibêje;” Heke zora şûr nebe peyman ji gotinan pêk tên û têr nakin ku ewlekariya mirov pêk bînin”⁽⁷⁸⁾. T. Hobbes aştî û hûzûrê di tirsê hût û hêza şûr de dibîne. Ciyê ku hêza dewletê lê tunebe, dizî, kuştin, talan û xerabî lê heye.

Hem ji bo Thomas Hobbes û hem jî ji bo Ehmedê Xanî dewlet desthilatdarî û otorîte ye. Padîşahê ku Ehmedê Xanî lê dipirse, lê digere û bangî wî dike ev otorîte ye; ango dewlet e.” Ger dê hebûya me serfirazek” an “Ger dê hebûya me jî xwedanek” ger dê hebûya me otorîteyek e; ger dê hebûya me otorîteyek netewî ye.

Bavê neteweperstiya Kurdî qet şik tune ye ku Ehmedê xanî ye. Tu kesî beriya wî bi nêrênê netewî li pirsê Kurdistanê nenihartîye û li riyên azadbûna gelê Kurd nepirsîye. Tovên welatperweriya Kurdî di xebat û berhemên helbestvanên wekî Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran de bê dîtîna jî, ev meyl bi şitûreke netewî nehatiye hunandin. Melayê Cizîrî di dîwana xwe de dikare bibêje, “Turkên xwînrêz me kirin zêr û zeber”⁽⁷⁹⁾ an “Gula baxê îremê bohtan im/ şebçiraxê şebê Kurdistan im”⁽⁸⁰⁾. Lê belê li ser sedemên vê yekê nasekine û rîya ji vê bindestî û koletî-

ye rizgarbûnê ji gelê Kurd re nişan nade. Bêguman bi Kurdî nivîsîn helwestek e û ji bo gelê Kurd karek gelek pîroz e. Ev yek bi serê xwe jî pirr hêja ye; lê ji rewşa gelê Kurd, ji kambaxiya gelê Kurd re çareyên esasî divê. Di vê nûqtê de E. Xanî serhil-danek e; çimkî E. Xanî sedemên her cure daxwaza xwe bi aşkerayî beyan dike; pê-wist nabîne ku tiştêkî veşêre. Ji bo xwe ri-yekê rast bijartîye û di wê riyê de dimeşe. Armanç azadbûna gelê Kurd e; rîya vê azadiyê ji di avakirina dewleta Kurdî re derbas dibe. Ji bo gihîştina vê armançê jî pêşvebi-rina hesta netewî û pêkanîna giyana netewî pêwîst e.

Celadet Alî Bedirxan Mewlana Celaledî-nî Romî û E. Xanî weha dide ber hev, “Mela Camî di heqê Mewlana Celaledî-nî Romî û kitêba wî ‘Mesnewî’ de gotiye:

Men çedn gûyem wesfî an alicenab
Nîst pêxember welê dared kitab.

Yanê: Ez di heqê wî alicenabî de çî bibê-jim, ne pêxember e, lê kitêba wî heye.

Ev peznêkî bilind û hêja ye û bi her awa-yî li bejna Mewlana têt.

Di heqê Ehmedê Xanî û kitêba wî ‘Mem û Zîn’ de, bi min be, mirov dikare jê bêtir jî bibêje. Belê Xanî jî xudan kitêb e. Lê Xanî pêxember e jî. Pêxemberê diyaneta me a mîlî, pêxemberê ola me a nijadî.”⁽⁸¹⁾

Bi hesteke netewî ew cara yekemîn li zi-manê Kurdî xwedî derket, bi giyanê ne-tewî wî yekîtiya Kurdan parast û pêwîstiya avakirina dewletek Kurdî anî ziman.

Sed xwezî bi wan gelan ku Ehmedê Xa-niyên wan hene. ■

JÉRENOT:

- 1)Platon, "Devlet" Çev. Necla Arat, Remzi Kitabevi, İst. s.14
- 2)Platon, Berhema ku navê wê derbas bû(bhd),r.188
- 3)Platon, bhd. r.178
- 4)Platon, bhd. r.162
- 5)Cassirer Ernst, "Devlet Efsanesi" Çev. Necla Arat,Remzi kitabevi-İstan. r.107
- 6)Platon,bhd.r.46
- 7)Platon, bhd. r.149
- 8)Platon, bhd. r.149
- 9)Platon,bhd. r. 151
- 10)Platon,bhd. r.153
- 11)Platon, bhd. r.153
- 12)Platon, bhd. r.144
- 13)Platon, hhd. r.122
- 14)Platon, bhd. r.118
- 15)Platon, bhd. r.119
- 16)Platon, bhd. r.123
- 17)Platon, bhd. r.159
- 18)Platon, bhd. r.158
- 19)Platon, bhd. r. 236
- 20)Xanî Ehmedê, "Mem û Zîn" werg. M. Emin Bozarslan, Weş. Hasar-İst. r.62
- 21)Xanî Ehmedê,bhd. r.64
- 22)Xanî Ehmedê, bhd. r.54
- 23)Xanî Ehmedê, bhd. r.56
- 24)Nikitin Bazil, Kurder, weş. Dneg. r.49
- 25)Platon,bhd. r.157
- 26)Dilgeş Felat, Li ser şopa E. Xanî, Welat, hej. 16
- 27)Xanî Ehmedê, "Nûbar", weş. Firat, r. 8
- 28)İbnî Haldûn, "Mukkadime", Cild 1. MEB yay. r. 162
- 29)İbnî Haldûn,bhd. r.363
- 30)İbnî Haldûn, bhd.r.363
- 31)İbnî Haldûn, bhd. r.361
- 32)İbnî Haldûn,bhd. r.472
- 33)İbnî Haldûn, bhd. r.412
- 34)İbnî Haldûn, bhd. r.379
- 35)İbnî Haldûn, bhd. 374
- 36)İbnî Haldûn, bhd. r.21 pêşgotin.
- 37)İbnî Haldûn, bhd. r.475
- 38)İbnî Haldûn, bhd. r.476
- 39)İbnî Haldûn, bhd. r.435
- 40)Xanî Ehmedê,Mem û Zîn, r.56
- 41)Xanî Ehmedê,bhd. r.372
- 42)Xanî Ehmedê, bhd.r.372
- 43)Machiavelli, The prince, Translated with an introduction by George Bull, Penguin Books, 1964, r.52
- 44)Machiavelli,bhd. r.87
- 45)Machiavelli, bhd. r.97
- 46)Machiavelli, bhd. r.96
- 47)Machiavelli, bhd. r.94
- 48)Machiavelli, bhd. r.93
- 49)Machiavelli, bhd. r.42
- 50)Machiavelli, bhd. r.43
- 51)Machiavelli, bhd. r.36-37
- 52)Machiavelli, bhd. r.37
- 53)Machiavelli, bhd. r.47-48
- 54)Machiavelli, bhd.r.48
- 55)Machiavelli, bhdb r.45
- 56)Machiavelli, bhd. r.134
- 57)Machiavelli, bhd. r.137
- 58)Yaşin Abdullah, "Cizre" Yucel Mat-1983, r.7
- 59)Bedirxan, Celadet,"M. Kemal'e Mektup, weş.Doç. r.21
- 60)Xanî Ehmedê, bhd.r.80-82-84
- 61)Xanî Ehmedê, bhd. r.96
- 62)Xanî Ehmedê,bhd. r.214-216
- 63)Machiavelli, bhd. r. 133
- 64)Xanî Ehmedê, bhd. r.54-56
- 65)Engels Friedrich, "Anti Duhring" Çev. Kenan Somer, Sol yay. r. 277
- 66)More Thomas, "Utopia" cem yay. Çev. S Eyuboglu -Mine Urgan- Vedat Gunyol r. 8 pêşgotin
- 67)More Thomas, bhd. r.56
- 68)More Thomas, bhd. r.101
- 69)More Thomas, bhd. r.106
- 70)More Thomas, bhd. r.92
- 71)More Thomas, bhd. r.63
- 72)Akin,İlhan F. "Kamu Hukuku" Beta yay. İst. 93, r.103
- 73)Hobbes Thomas, "Leviathan" Yapi. K. yay. çev. Semih Lim r.94
- 74)Hobbes Thomas, bhd. r.94
- 75)Hobbes Thomas, bhd. r.94
- 76)Hobbes Thomas, bhd. r.96
- 77)Hobbes Thomas, bhd. r.130
- 78)Hobbes Thomas, bhd. r.127
- 79)Cizîrî Melayê, "Diwan" weş Firat, r.94
- 80)Cizîrî Melayê, bhd. r.236
- 81)Bedirxan Celadet,"Hawar" Hej. 33

AGAHDARIYEK JI BO ABONEYÊN NÛDEMÊ

Gelî abone û xwendevanên hêja!

Mîna hûn dizanin, ev nêzîkî çar salan e Nûdem jiyana xwe ya weşanê didomîne. Gava me dest pê kiribû, me gotibû ku em ê bi kêmanî pênc salan Nûdemê derxînin. Ji qewlê me re sal û tiştê maye. Bi gotineke din pênc hejmarên me mane. Piştî pênc hejmarên din bîst (20) hejmarên me diqedin. Di zik hev de zêdeyî 2300 rûpel dike. 2300 rûpelên kulturî, hunerî û edebî. Em ji we re behsa girîngiya wê nakin, lê ger hûn çavekî li dîroka Kurdistanê bigerînin, hûn ê bi xwe bi girîngiya vê xebatê bihesin. Em jî bi vê girîngiyê hesiyane ku me dest avêtiye vî karî. Yên ku li Ewrûpa dijîn, bi giraniya çapê dizanin. Dibe ku çapa Nûdemê ji ya gelek weşanên din girantir be. Ji ber ku hem bergên wê bi reng in, hem kaxezên wê buha ne, hem jî em gelek resim bi kar tînin. Em dixwazin Nûdem di pîvana kovarên edebî yên cîhanî de be. Ma çiyê zimanê kurdî ji yê xelkên din kême? Bi tenê xwendevan... Gava em rewşa kurdan û ya xelkên din didine ber hev, em dibêjin divê kurd ji xelkên din bêtir li zimanê xwe xwedî derkevin. Ji ber ku zimanê kurdî nîşana hebûna kurdan e.

Gazina me ji hin aboneyên me ew e ku wan heta niha abonetiya xwe bi rêk û pêk nedane. Nemaze aboneyên Almaniyayê... Yên ku abonetiya xwe nedabin, em ê mecbûr bimînin ku abonetiya wan bibirin.

Û tiştêkî din jî... Nûdem pênc salên din jî li weşana xwe zêde dike. Kî zane, dibe ku Nûdem jî bibe mîna kovareke Ewrûpayî ya bi dîrokeke dirêj. Em hêvîdar in ku em ê di van pênc-şeş salên pêşiya me de li gora dilê we derkevin. Bifikirin û di demeke dehsalene de ji bo pêşdestina ziman û edebiyata kurdî rola kovareke kurdî bi bîr bînin. Em alîkariyeke mezin ji we naxwazin, bi tenê abonetiya xwe bidin, bes e. Divê Nûdem bikaribe bi alîkariya aboneyên xwe bijî. Ji 190 Kronên abonetiye nêzîkî 60 Kronî li mafê posteyê diçe. Yanî ji bo salekê bi tenê 130 Kron dimîne.

Ji bîr nekin, Nûdem ya we ye jî! ■

PÊJNÊ DERYA YAN TÎBÛN Û SÎNORÊN AMEDÊ

Mervanê Keleş

Derya: xewnek bi pêl e
Kûr e wek rûpelên

axê...

Hespek kimêt bê serî
tê...

Hawarê diçîne

bi hatina

şevê re...

Zaroke û qendexa

çiyê

didrû

bi

şûjîna rokînî

û

tayê avê...!!

Tirsê bi zingil: dilorîne

Hêviyê bi heyvanê ewran: distirê

Balindan dajo ser

xefkên

x

w

e

dê...!!

bi stêrkan re

ba û şewqê bêjingî

êvarê dike

Wê kî min bi te bide nasîn û bo te xewnên min şirûve bike, ka derya minê rûnê:

xwe bide
bin tacê
nehîniyên dilên
saza pêşîn
vede
tîran girêd
kevan berde
rengên
winda
yarê ji dîrokan
werîn
Hinna sorî sosinî ji gula
ergewan çêke...!!
Bêhna şimamokan lêke
şeva guhestinê tu lê
m
e
k
e

Bera zave di nav xwêdana
xwîna te de bijîn bibe...!!

Were derya min:

xaniyên herîni
bi pêlan
bişo
û
bi êvara heyvê zuha ke;
Eniyên deryên girtî bişkin
û çend masiyên biroqankî
bişîn bera livîna bokê vedin
Kirasê reşahiyê
zîvar-zîvarî bik
bera pîrebok

jê DERIN

Û

morîkên

Kehreman bi ta vekin

bo

gerdena

BERFÊ

babîsokan li qamîşan

-Qamîşlokê-

rake

Qulingan ji nav lepên dojehan

bistîn, wan bi baskên agirîn

berde

ezmanên

Welêt...!?!?

LÊ

Min bihîstî

agir te kir

destên mezin te li ser

kir

lê av li ber destan

ne

b

û

ji ber vê te bi AR

dest

mê

ja

xwe kir

Merşek nebû bo limêjê

rabû te got "ERD TAHIR E"

lê te ne kir

Te got: xeftanê min

spî ye

gava ax lê bigre

av tune ye!!!!

Derya minê de ka were EM şevên dirêj bi
çîrok û
çîvanokan
bihûnin

Qermîçokên tofana te em ê bi destgehên kevnar, rast, dût û gurr
bikin, bera gemiyên bêdeng avjeniyê li ser bikin...!! Lê dibêjin ku hesp jî
li ser pêlên te diçerixin!! Ka gemiyên bê bask û melevan wê çawan xwe bi
qûnaxên reşahiyê xin?!!!

Ka were

de ka:

hêlanoka li bin dara hejîrê
ji çivîkan dawşîn û min tê
de bi nermînî bihejîne ta ez
di newalên
xewa bê xewn de bigirîm ta
ber "azana melê" û ketina
xwinavê di nav periyên "ordeka
Çemê Xêbûr" û "Qitîkên delavên
Simoqiyân"...!
Lê ez têngahêjim bo çî tu
dixwazî ku ez bi lez û
dilşahî nama te: "Bera
Qamişlo
ji ser Hemrîn silavekê ji
Berzan
re
vede, destê
Qadî
li
Mehabadê
bihejîne
Û
eniya
Mêrdînê
ramûse"... bigihînim

ÊZÎDIYÊN ÇIYAYÊ SINCARÊ *

Ingmar Karlsson

Wergêr: Mehemed Dehsîwar

Ger rêwingiyek here herêma tixûbên Gnavbera Turkiye, Îraq û Sûriyeyê, dikare ji nişka ve rastî gundekî, ku ne dêr û ne jî camî lê hene bibe û ecêbmayî bimîne. Ger meriv bi destpêka avêtina tavê re, yan jî êvarê, heyamê tav diçe ava bigîje wir, dê meriv rastî hinek kesên berên wan li tavê, ji hişçûyî, li dora kevirekî çikandî û di nav duayan de bibe. Gava yek ji nêzik ve li dora xwe binêre, wê ew çav bi rengê şîn, ku ji xeybê ve şewqa xwe dida ser avahî û cilan bikeve. Meriv zilamên ku îşilkên wan ji piştê ve qefaltî û dora qirika wan bi awayekî fireh qewartî didît.

Divê rêwingî xwe di nav serpêhatiyên "Tîntîn" de nebînin; lê ji dêl ve, bira ew xwe li nav Êzîdiyên ku belkî jî ecêbtirînen wan gelên piçûk, ên Rojhilata Navîn a ku jê hêla olî û etnîkî ve pîrr dewlemend e, bihesibîne.

Îro Êzîdî, ku hejmara wan di dora 100-150 hezaran de ye, di nav herêmeke mezin, ku di navbera bakurê Îraqê, başûrê rojhila-

ta Turkiyeyê, bakurê Sûriyeyê, Ermenîstanê û Gurcîstanê de dimîne, hatine belakirin. Li gorî texmînan, hinek grûbên piçûk jî li bakurê rojavaya Îranê hene.

Êzîdî bi eslê xwe Kurd in. Ew bi çend zaravayên kurdî yên cuda diaxifin û wek Kurdên sunnî, bi şeklê qabîletî û di bin serokatiya axa yan jî mîran de hatine organîzekirin. Cîhê wan ê herî mezin li bakurê Îraqê, di nav çiyayên "Cebel Sincar" de ye ku firehiya wê deh, dirêjîya wê jî 80 kîlometre ye û bi 15 mîlan dikeve nêzî rojavayê Mûsilê. Cîhê Êzîdiyan ê herî pîroz, li Şeyxan e ku nêzî heft mîlan li bakurê Mûsilê dikeve.

Li Turkiyeyê (bakurê Kurdîstanê-MD) Êzîdî li rojhilata Dîyarbêkrê dijîn; ew li cîhên Asûriyên ortodoks ku ji wir koç kirine û hatine li Swêdê bicîhbûne, dimînin. Di destpêka salên 80-yî de, nêzî 2000 malbat li vê herêmê hebûn ku bi texmîni nêzî 15-20 hezar kes dikin. Li herêma Mêrdînê, pênc gundên xirrû ji Êzîdiyan hene. Her

wiha li dora Sêrtê (di navbera Batman û Qubînê de-MD) ku bi qandî deh mîlan dikeve bakurê Midyadê û li dora Ruhayê, cîhê destpêka mesîhîtiyê Edesayê, ku bi 15 mîlan dikeve rojavayê Mêrdînê jî, Êzîdî dijîn. Piştî salên 85-an hima bêje piraniya Êzîdiyan ji vir koç kirine û di gavê yekem de li Elmanyayê bicîhbûne. Di bihara 1990-an de, ne kêmi 18 hezar penaberên ku ji Turkiyeyê hatine vir û xwe wek Êzîdî dane nivîsandin. Anagorî rêxistinên penaberiyê yên Elmanî, niha nêzî 1500 kesên Êzîdî ku piraniya wan pîr û zarok in, li ser axa bav û kalên xwe dijîn.

Li Sûriyeyê, Êzîdî li du herêmên ji hev cuda, beşek nêzî tixûbên Turkiyeyê, beşek din jî li bakurê rojava, li herêma Cizîrê dijîn. Ew li wirê, li bakurê Heseke, riya ku diçe Qamişloyê, di navbera Amûdê û Heseke de û her wiha li ber gola Chatuniyê (Xarûniyê -MD), nêzî tixûbê Îraqê ku ne dûrî Çiyayê Sincarê (Djabal Sindjar) ye, dijîn. Tevaya hejmarên Êzîdiyên ku li Sûriyeyê dijîn di nava 15 û 20 hezaran de ne. Wek li Turkiyeyê (bakurê Kurdistanê), li vir jî Êzîdî ji hev bela-wela ne. Ew li gundên cuda dijîn, bi piranî jî di nav misilman û mesîhiyan de belabûyî ne; ji ber wê jî zûtir asîmîle dibin. Niha li van herêman meriv rastî hinek kesan tê ku dibêjin bav û bapîrên wan Êzîdî bûn, lê niha wan bi xwe, agahdarî û zanebûna di derheqa koka dîne xwe de jibîrkirine.

Ola Êzîdîtiyê bi texmînî nêzî 900 salan kevn e. Ji ber sedemên ku ew tenê di van heremên dûr î nepenî de bû, heyameke dirêj ji dinyayê re veşartî mabû. Ji bo gelên Ewropayê, nivîsa pêşîn li ser Êzîdiyan, cara yekem ji aliyê rahîbekî Îtalî yî nenas ve, bi

navê sernivîsa "Vero descrizione della Turchia" di sala 1674-an de li Romayê, ji bo xatirê melîke Krîstîna, hatiye weşandin.

Ancax piştî salên 1800-an, ji bo di destê yekem de, di nav Nesturiyên mesîhî de kar bikin, pêwendiyên pêşîn bi riya mîsyonerên Ewropayî, bi vê herêmê re tên danîn.

Li ser binyata Êzîdiyan, dîtinên curbicûr hatine pêşkêşkirin. Li gorî piraniya van, ku cara yekem ji aliyê rojhilatnasê Îtalî M. A. Guîdî ve hatiye pêşkêşkirin, ew bi eslê xwe ji Kurdên alîgir ên Emewiyan hatine ku piştî pelîşandina bandoriya wan bi çendsed salan jî (piştî Mesîh nêzî salên 750-yan) ew bi vê Xanedanê bawerî bûne. Ev alîgir, carek din li herêmên başûrê Kurdistanê xwe nîşan didin û li gorî texmînan sazgerê vê olê sofîyekî mîstîk Adî bîn Musafir, ku bi navê Şêx Adî tê nasîn, bûye û ew di destpêka sersalên 1100-an de derhatiye holê. Wî li deşta Lalesê, li başûrê rojavayê Mûsilê dest bi sazgeriya xwe ya vê ola tevlihev kiriye ku motîfên xwe ne tenê ji misilmanî û mesîhîtiyê, her wiha ji cihûtî, zerdûştiyê û agirperestiyê (manîkeîsm) jî girtiye.

Li gorî toreyên Êzîdiyan, çaxê ew hat dinyayê, dê û bavê wî pîr pîr bûn. Wî hê di 15 saliya xwe de dev ji malê berda û pênc sal piştê jî, dema ew tenê di rastekê de, di bin şewqa heyvê de diçû, wehiya xwe ji Xwedê digre. Li ber mezelekî kevn rûhaniyek ji nav erdê hildikişe. Mezel jî pê re bilind dibe û heta digihîje ber heyvê hildikişe. Ew dikeve şeklê minareyekê û diheje. Adî ji tirsan bi ser cerekî avê ve ku li kêleka wî bûye dikeve. Rûhanî wê hingê dikeve şeklê xortekî bedew û bi cilên Teyrê Tawis, jê re wiha dibêje:

"Netirse! Ev minare dikare biqelibe û

dinyayê jî xira bike, lê Tu û yên ku li pey Te werin, zerar nabînin û dê ew bibin hukumdarên van kavilan. Ez Melek Tawis im û min Te, ji bo ku li dinyayê bibî pêşevanê ola rastî, hîlbijartiye.”

Piştî vê yekê, ew giyanê Adî dibe asîmanan û heft salan, ta ku laşê wî di mezê de hesayî dibe, perwerde dike. Çaxê ruh û laşê wî car din gihan hev, hê jî ew ava di nav cerê şikestî de hemû nerijiyabû.

Li ser navê Êzîdîyan jî gelek dîtinên cuda hene. Li gorî yeke jî van, wan navê xwe jî bêjeya farisî “Îzêd” (melek), li gorî yekî din jî navê xelîfeyê Emewîyan Yezîd ku di nivîsên Êzîdîyan de nayê bahskirin, tê. Li gorî gotinên bi devkî, sazgerê vê olê, Şahîdê kurê Adem bû. Ew piştî bi alîkariya hevghîştina ruh û laş, pêşî weke Yezîd, piştî weke Şêx Adî û careke din dê weke Şahîd bi xwe derkeve ser rûyê erdê.

Êzîdî bi xwe, xwe jî koka Şahîd dihesibînin. Li gorî baweriyê, ew piştî neh mehan jî toximê Ademê ku di nav sewîlekî de bû, tê dinyayê. Di nav sewîlekî din de jî, ku tê de hêkên Hawa hebûn, tenê jahîrî dihat çêkirin. Ev paşbingeh jî dike ku Êzîdî, xwe jî aliyê Xwedê ve taybetmend û hîlbijartî dihesibînin. Ew lewma jî nikarin xwe tevî gelên din, ku ji azbata Adem û Hawa hatine dinyayê, bikin. Ji bo Êzîdiyekî, çarenûsa herî xerab û tiştekî ku li ser ruhê qedera wî nayê guhartin jî ew e ku, meriv jî aliyê gelê xwe ve, ji nav civakê bê avêtin û herûmkirin.

Êzîdî bi vî awayî bawerdikin ku, tenê yek Xwudayekî vê dinyayê ava kiriye. Ewê, ku bi Kurdî, bi navê Xwuda jê re tê secdekirin, têkilî tiştên bînîrx ên ku di dilên me de disêwirin, nabe; lê berpirsiyarî daye wan her

heft melaîketên ku beşdarî damezrandina kar û barên gerdûnê bûne. Navê yekî jî wan Sultan Ezî ye ku mexsed jî wî Xelîfe Yezîd e. Di nav firîşteyan (melaîket) de yê pêşî û baştirîn, Melek Tawis e, ku wezîfedarê îradeya Xwedê ye û weke şeklê Xwedê derdikeve ber çavan. Ji Melek Tawis re, ku bi awayekî nayê qetandin bi Xwedê ve girêdayî ye, Şeytan jî tê gotin û her wiha ew bi Lucîfer (Tê maneya “stêrka şevqê”, lê di Încîlê de bi maneya “melekê xirîfî” yan jî jî bo Şeytan hatiye bikaranîn-MD) ve tê qiyaskirin. Piştî ku ew 7000 sal di dojhê de, bi giryanên poşmaniyê her heft sewîlên mezin jî stêrên çavên xwe tije dike û pê agir difîne, ne tenê tê beşandin, lê her wiha dibe wekîlê Xwedê jî.

Perestina Melek Tawis, fikreke şaş weke ku ew Şeytan dihebînin, xistiye nav hawîrdor û cînarên Êzîdîyan. Qedexkirina yekcarî, ya axaftina bêjeya “şeytan”, bêjeyên ku dişibin wê û her wiha yên bi “ş” yê destpêdikin jî, alîkariya van şikên ne dicîh de kirine. Şeytan bi xwe, ji bo gunehên xwe bide efûkirin agirê dojhê tefandiyê; ji xwe yek jî wan dîtinên Êzîdîyan ên esasî jî, înkarkirina hebûna dojhê ye. Ji pêla wê ve, Êzîdî bi gera rûhanî bawer dikin. Li gorî vê baweriyê ew kesên ku baş in, careke din weke mirovan têne ser rûyê erdê. Lê kesên xerab jî, bi şeklê heywanên curbicur têne cîhanê. Dirêjî û kiniya jiyana bi vî awayî, li gorî şeklê gunehên meriv yên berê ye. Xwepêşkirina herî berbiçav a Êzîdîyan ku Melek Tawis û melaîketên din dihebînin, peykerên (pût) ên ku ji bronz û hesin çêbûne ku ji wan re “Sancak” tê gotin. “Xelîfeyê Sancakan” yê herî mezin timî li Laleşê, li ber gora Şêx Adî tê parastin û yên din salê ca-

rekê li herêmên Êzîdiyan tên gerandin û alîkarî bi vî awayî tê civandin.

Di şahiyên olî de zimanê kurdî tê bikaranîn. Lê herdu pirtûkên wan, Kîtab al-Cilwe (Pirtûka wehiyan/herîqeyan) û Kîtab al-Aswad (Pirtûka/Mishefa Reş) ku Êzîdî wan pîroz dibînin, bi erebî hatine nivîsîn. (1) A pêşîn gelek kin e, Şêx Adî berî ku bimre li gora toreyan, wê bi feqiyê xwe daye nivîsandin; di beşa pêşgotinê de ew weha dibêje:

“Melek Tawis berî afirandinan teva hebû; wî xîzmetkarê xwe şand dinyayê ku gelê xwe yê bijare ji şaştiyan biparêze û wan ji nexweşî û xeteran rizgar bike. Ev pêşî bi devkî, piştî jî bi rîya vê Pirtûka Wehiyan ku tu biyanî nizanin û nikarin bixwînin, hat şandin.”

Li pey vê îlahiyeke bi erebî ku ji 80 beytan û li ser şerefa Şêx Adî pêk hatiye, tê; û pirtûkeke pîroz tê qebûlîkirin. Ji ber ku ew bi tîpên erebî hatiye nivîsîn, sir û nihênîyên dînî xwanê nakin, lewra jî dibe ku ew di şikê de bin. Ji pêla vê ve, urf û edetên dînî bi toreyên devkî tên bicîhanîn. Heta 15-20 sal berê jî tenê mafên malbatên şêxan hebû ku xwe fêrî xwendin û nivîsandinê bikin. Lewra jî ev doktrîn û seremoniyên dînî, roj bi roj bêtesîr mane û kêmbûna zanyariya pîraniyên Êzîdiyan a di derheq ola wan de, bûye sedem ku ol bûye efsaniyeke veşartî û kêmazadî.

Hejmarên mecbûrî yên bicîhanîna olî kêm in. Duaya şexsî her roj, bi derketin û wendabûna tavê yan jî heyvê tê kirin. Di dema duayan de, Êzîdiyek berê xwe dide tavê yan jî heyvê û di vê demê de ji bo armanca xwe, li dora kevir digere. Duaya mezin ji bo Melek Tawis tê kirin; her weha

ji firîşteyên din re jî tê duakirin, lê ne ji bo Xwedê.

Peyva “Şeytan” weke ku li jor jî hat gotin, ji bo Êzîdiyekî bibawer tabû û qedexeye. Di Pirtûka Reş a pîroz de, çend xetên qedexeyan ên ecêb tên rêzkirin:

“Ji bo me xwarina xas, nok û fasûliyan û her wiha lixwekirina cilên rengê şîn î tarif qedexeye. Em masiyan, ji ber hurmeta Yûnis Pêxember û xezalan jî ji ber ku ew keriyên pêxemberekî me bûn, naxwin. Şêx (di grûba rahiban de yên herî giring, li xwarê binêre) û şagirtên wan, ji ber hurmeta Teyrê Tawis, ku ew yek ji Xwedayê me ye û dişibe dîk, nikarin goştê dîkan bixwin. Em nikarin kundir jî bixwin û her weha ji bo me şîpya av rijandin, rûniştî cil lixwekirin û bikaranîna tûwaletên misilmanan jî qedexeye ye.”

Di nav xusûsiyetên berbiçav de, dikare bêgotin ku roja şemiyê betlane ye û çarşem jî roja pîroz (cejn) e. Sersal dikeve çarşema pêşîn a Nîsanê. Demjimartina Êzîdiyan bi serê xwe û taybetî ye û ji ber sedemên ku kes nîzane, 292 sal piştî Mesîh dest pêdike. Di pîrozkirina sersalê de, meriv mezêlên malbatên xwe ziyaret dike û li wirê ji bo rêwingiyan xwarin tê rêzkirin; xênî di vê rojê de bi rengê gulên sor tên xemilandin û hêk tên boyaxkirin. Li gor baweriyê, melaîket nêzî nivê şevê di nav gundan de derbas dibin.

Dema salewextî ya herî pîroz, ku dikeve heftiya dawî ya meha Îlonê, ew heyamê salvegera wehiya Şêx Adî ye ku li ber mezêlê wî li Lalesê tê pîrozkirin. Hingê peykerên Teyrê Tawis di ava çem de tên şûştin, nav li zarokan tên kirin û mûsîka kemaçe, bi def û daholan ve dikeve dorê, stranên bi şe-

wat tèn gotin û govend li pey hev tê gerandin. Bi sedan lembeyên donê kunciyên tèn pêxistin, xwarinên taybetî tèn pêşkêşkirin û gayek ji bo qurbanê tê serjêkirin. Di nav mezelan de şahiyên olî, ku tu kesên biyanî nikarin beşdar bibin, tèn çêkirin. Deriyê vir, ji şeklên kevîran ên navqulkirî hatiye girtin. Di nav van de ê herî mezin, şeklê marê bejinzilam e û ji reş hatiye boyaxkirin. Gustîl, xencer, gopalen keşeyan, şamdanên heftmil, dest, kevçî û şeh jî ji sebebên ku nayên zanîn, hatine şekildan.

Her wiha Melek Ezî jî di destpêka Çileyê Pêşîn de, bi şahiyêke taybetî tê bibîranîn. Piştî vê şahiyê, sê roj rojî tê girtin ku piştê bi vexwarina şerabê tê şikandin. Navdanî û şuştina zarokan, bi awa ku toza pîrozgeha Şêx Adî ya ji Laleşê biser ve hatiye reşandin, çêdibe. Sunneta lawikan, yek ji wan ayinên herî giring û navendî ye.

Di pîrsa zewacê de, Êzîdî pîrê hişk û diwar in; zewaca wan ancax di nav malbatê yan jî di nav qebîleyê de tê qebûlkirin. Pîr-zewac û ji hev veqetin, serbest e lê gelek kêr diqewime. Zewac li gorî lihevkerîna dê û bavên çêdibe. Şahiya dawetê pîrê hêsan e. Şêxek nanekî dike du şeqan û perçeyekî dide zave, yê din jî dide bûkê. Bûk cilên sor li xwe dike û divê ji malê ta cihê dawetê ziyaret û dêrên mesîhiyan ên ku dikevin ser rîya wê, ziyaret bike. Dema du kesên nuh zewicî, di ber sîvdera deriyê malê de derbas dibin, zave kevîrekî davêje bûkê, daku bûkê re serînim be. (Li gelek cihên Kurdîstanê, zave li serê xênî sêvekê davêje bûkê.-MD) Xiyaneta nav zewacê, wek tore bi kuştinê tê cezakirin. Di nav xusûsiyetên zewacê yên din de, ev tiştên xwarê balkêş in: Jinebî û mêrebî dikarin heta şeş caran bize-

wicin, Êzîdiyekî ku zêdeyî salekê li dervayî welêt bimîne, nikare bi jina xwe re bimîne û her weha nikare careke din bi jineke Êzîdî re bizevice.

Her weha şahiyên (seremonî) definkirinê jî cuda ne. Laş hima piştî mirinê herdu mil çeperast li ser hev, di nav cilên sipî de pêçayî û berê serî bi hêla rojhilat ve tê veşartin. Toza ziyareta Şêx Adî bi ser çav, guh û devê mirî ve tê reşandin. Seriyê mirî bi axê nayê veşartin, lê bi kevîrên pahn (du kevîr di kêlekên serî de û yek jî di ser herdu kevîran de-MD) tê parastin ji bo valehiyekê de bimîne ku ruhê mirî karibe ji wir derkeve û bi jor ve here. Piştî definkirinê, şêxek li gora kar û barên mirî, dixwaze bide famkirin ka dê ew bi kur ve biçê. Ger mirî di nav civakê de mezin û naskirî be, cilên wî bi şeybûkekî (şeklê darik) ve tê daleqandin û sê rojan bi şahî û mûsikê tê gerandin. Piştî mirinê, bibîranîna mirî ya ji bo Xwedê, di rojên sê, heft û çardemîn de û her weha di salvegerê de tê çêkirin.

Strukturên Êzîdîyan ên civakî jî, bi sistema xwe ya teokratîk ku herkesê tê dinyayê, mezin dibe û li gora cihê xwe yê civakî dizewice, bi serê xwe cuda ne. Grûba herî pîr, "murîd" in ku feqîr û zengînen civakê himbêz dike. Grûba duyem ji rahîban (rûhaniyan) pêk tê ku ew jî bi dorê dibin şeş grûbên piçûk. Grûba herî giring şêx in ku ji heft malbatan pêk tê û tê gotin ku ew nebîçirkên melaîketan e û ji bo meriv bibin ser rîya heq, çêbûne. Her murîd bi şêxekî ve girêdayî ye ku her roj destê şêxê xwe maçî dike û mecbûr e pê re taet û duayan bike û piştî rojiyê, pê re bi şerabê rojiya xwe bişkîne. Niha nêzî 300 malbatên şêxan hene ku endamên wan, meletiya wan murîdên

di nav wan de parvekirî dikin.

Herî nêz piştî şêxan, “pîr” tên ku wezîfeya wan, di şahiyên dînî de cîhgirî û alîkariya şêxan e. Lê ew ji kar û barên îdarekirinê azad in û piraniya wextê xwe bi dua û medîtasyonê derbas dikin. Ev grûb jî nêzî zoo malbatan tên hejmartin. Di nav pîran de, ji yê herî pêş “Baba Xawûş” (dergevanê herî bilind) tê, ew berpirsiyarê ziyareta Laleş e û qet nikare bizewice .

Li gora vê rêzika civakî, “feqîr” grûba herî binî ye ku ji ber rengê kum û şoqeyên xwe, bi “serreşî” tên binavkirin. Feqîrên ku ji eşîr û malbatan tên hîlbijartin, wezîfeya xwe ya terîqetê, bi dil û can dikin. Her çiqas ne tu wezîfedarên olî bin jî, lê dîsan ji ber wezîfe û cilên wan, ku mînane cilên Şêx Adî, ji wan gelek tê hezkirin û pîr bi qedir in. Feqîr, îşilk an jî blûzên reş î kêleksor û qayîşeke sor î sipî û lihevpeçayî, ku digîje ser singa wan, li xwe dikin. Di serî de turbanek reş û di stû de jî gerdeniyek sor û sipî heye. Her çendî li ser gotinê herkes karê bibe feqîr jî, lê di rastiyê de feqîrtî weke mîrate, ji bav derbasî kur dibe.

“Kilambêjî” (kawalî), bi dereceya xwe keşetiyek piçûktir e; kilambêj di şahiyên olî de distirên, bilûr, def û elbane lêdixin. Ew bi awayekî, serkarên mûsîka Êzîdîtiyê ne. Her wisa ew peykerên Teyrê Tawis jî xwedî dikin û di şahiyên salewextî de, wan li herêmên Êzîdiyan digerin. Kilambêj dikarin beşek ji wan tiştên ku di şahiyên de hatine civandin, ji xwe re hilînin. Her peykerê anagorî wê herêma ku jê re tê şandin, nav distîne: Sûriye, Zozan, Tebrîz, Misqof, Sincar û Şeyxan. Gerên nav Êzîdiyên Îranê û Sovyetê niha hatine sekinandin, lê klambêj ji pêla wan ve, ji bo ziyaretên salewextî

diçin Elmanyayê; Êzîdiyên ku ji Turkiyeyê çûne û li wir bicîhbûne jî, peykerên Teyrê Tawis li vir ziyaret dikin.

Piştî pêpelûka van, “kotçak” (ên piçûk) tên ku ji aliyekî ve li ber gora Şêx Adî kardikin û di vî gerî de, alîkariya kilambêjan dikin, ji aliyê din ve jî tevî porên xwe yên dirêj, di şahiyên olî de govendên olî digirin. Gelek ji wan piştî ziyareta Laleş, dibûn hecî û li wir biryara seknê didan. Hinek ji van kotçakan weha digotin: “Hinek qabiliyet û xusûsiyetên wan hebûn ku karibûn bi Melek Tawis re têkevin pêwendiyê” Tê gotin ku: “Qedexebûna bikaranîna rengê şîn, ji pêwendiyek wisan tê,” li gor vê di salên 1800-an de, kotçakek ji Xwedê xeber digre ku rengê şîn bi xwe re bêoxiriyê tîne.

Di herî binê hiyerarşiyê de “awan”, ku li ber gora Şêx Adî kar dikin û “şawîş” ku meriv dikare wan wek dergevanên mizgeftê qebûl bike, tên. Her gundekî şawîşekî xwe heye ku xweyîti li van cîhên pîroz dike.

Li Laleşê rutbeyek din jî heye ku ji feqîrat, jinebî û jinên ciwanên sonda xwe ya cînsî xwarine (qet nezewicîne) pêk tê. Ew bi cilên xwe yên sipî, ji bo lembeyên rojên pîroziyê, donê kunciyên derdixin.

Yek ji wan xusûsiyetên ola Êzîdîtiyê jî ew e ku gere qîz û xortên xamebûyî bi yekî ji xwe mezintir û murîdê şêxekî din re, xwişk û biratiyê bikin. Ew “xwişk û birayên axretî” tên hesabê û wisa tên binavkirin. Di vê cîhana me de, ji girtina diyariyên ku temsîla hevaltî û biratiyê dikin pêştir, tu wezîfeyên wan tune ne. Li gel vê, meriv dikare wan kesên ku xwişk û biratiyê kirine, li axretê alîkarê şêxê malbatê jî bibîne. Her wiha dê ew dema ber mirinê jî li wir bên û bi dengêkî nizim, bahsa derbasbûna can a piş-

tî mirinê, derketina wî ya dinyaya wî alî û vegeza li jiyane, bikin.

Di serê vê civaka totalîter de serokekî olî û yekî cîhanî heye. Hêza siyasî ya herî bilind, di destê Mîrza Begê ku jê re "mîrê mîran" jî tê gotin, de ye. Ew li Baadreya, ku dikeve bakurê Mûsilê, dijtî û tenê ew dikare li ser navê Êzîdiyan bi derva re pêwendî deyne. Serokê olî Mîrê Şêxan e ku ol û pirtûkên pîroz, bêşafîti şirove dike û dide famkirin. Ew dikare biryara cezayê derxistina ji nav jiyana tevayî, ku ji Êzîdiyekî re cezayê herî xerab û dawiya çarenûsa wî ye, bide.

Dîroka Êzîdiyan ji serî heta dawî eziyet, perîşanî û sitemkarî ye.

Ev dîne nuh, piştî mirina Şêx Adî ya sala 1160-an, zû belabû. Rûniştevanên çiyayê Hekaryayê -ku îro dikeve rojhilatê başûrê Turkiyeyê (Kurdistanê-MD) û wextekî cîhê dêra Nestûraniyan bû, zû derbasî ser dîne wî bûn û piştî wan jî di salên 1200-an de gelên Çiyayê Sincarê -ku çawa li jor jî bihûrî îro navenda Êzîdiyan e- gelek beşên mezin ji Kurdîstana Îraqê ya îro jî diçin ser dîne wî. Di dawiya sedsala 12-yan de ev dîne nuh gihîşt bakurê rojhilatê Sûriyeyê û di sedsalên piştî vê de jî, ji jor ve gihîşt Gola Wanê û Ermenîstanê.

Beg û mîrên herêmê, pêşveçûna vî dîni jî îdareya xwe re xeterek mezin dihesibînin û ji bo vê yekê, êrişên leşkerî yên mezin birin ser Êzîdiyan. Her weha ew weke olperestên bêpirtûk hatin îthamkirin û ji ber vê yekê, wek gelên meshî û cihûyan, nikaribûn bi rewşa "olên xwedî pirtûk" bihatina parastin.

Di sala 1414-yan de li hember Êzîdiyan şerekî olî dest pêkir. Gora Şêx Adî hat xera-

kirin û hestiyên wî hatin şewitandin. Ev êriş ji bo Êzîdiyan bû sedem ku ew bi paş ve gav bavêjin û her ku çû wan roj bi roj xwe bi paş ve kişand û ketin parastinê. Piştî demekê, Êzîdiyan bala Osmaniyan jî kişand û li hember hebûna van kesên "bêbawerî", "şerekî pîroz" dest pêkir. Êrişên Osmaniyan bi taybetî çûn ser cîh û warên Êzîdiyan ên herî biqewet, ciyên herî pîroz mîna Çiyayê Sincar û Şeyxan. Di sala 1647-an de Şeyxan hat zeftkirin, mîrê Êzîdiyan ê wir bi Wanê ve hate şandin û ew piştî li wir hat bidardekirin; çend sal şûnde Sincar jî hat talankirin. Di 1792-yan de dîsa êrişek ji aliyê waliyê Tirk yê Mûsilê ve diçe ser vê herêmê û du sal piştî vê jî waliyê Bexdayê vê êrişê didomîne. Sala 1799-an dîsa dora Şeyxan hatibû. Di destpêka salên 1800-an de ev êriş û sitemkarî hê jî zêdetir bûbûn. Di sala 1832-yan de Şeyxan hat vegirtin, mîrê Êzîdiyan hat zeftkirin û bidardexistin. Herêm bi tevayî hat talankirin û rûniştevanên herêmê bêînsaf hatin kuştin. Beşek ji gelê wir xwestin ku derbasî Sincarê bibin, lê li ber Mûsilê ji ber lehiyên Dîcleyê, asê man. Kêm kes ji wan dikaribûn bi avjenî derbasî hêla din a Dîcleyê bibin, yên mayî ta yek ji wan hebû jî aliyê Kurdên sunnî ve hatin kuştin; her wiha Sincar jî ji ber wan nefilitî. Waliyê Diyarbekrê di sala 1838-an de û yê Mûsilê jî di 1846-an de, du êrişên mezin birin ser vî cîh û çiyayan hişk û asê.

Di derdora salên 1850-yan de, hêja nû hebûn û qirkirina Êzîdiyan bala Ewrûpayîyan kişand ser xwe. Mîsyonerên meshî bi wan re ketin pêwendiyê û sefirê Îngîlistanê li ber Deriyê Bilind, li ser hesabê wan çend caran axaftin kir. Piştî wê 20-30 salî Êzîdî karibûn hinek rihet bibin, ta ku di sala

1892-yan de êrîş û qirkirina belkî di dîroka wan de ya herî xerab, hate ser wan. Generalê Osmaniyan Wehbî Paşa ku ji bo bac û xezîneyan çûbû Mezrabotan, fermaneke nuh derxist. Li gorî vê fermanê, ger Êzîdiyan dev ji dînê xwe bernedana û derbasî ser dînê Îslamê nebûna, dê ew bi tevayî bihatina qelandin. Çaxê ku Êzîdiyan bi ya vê fermanê nekir, hingê êrîşên mezin çûne ser wan û Sincar û Şêxan tev hatin talankirin û şewitandin. Cihê herî pîroz, gora Şêx Adî, bi tamamî hat xerakirin û di dewsa wê de, ji bo çend salan, dibîsteneke Îslamî hat avakirin.

Ev bûyer ne tenê di nava Ewrûpayiyan de, her wiha di Rojhilatê de jî reaksiyoneke mezin kişand ser xwe; Wehbî Paşa bi paşve hat girtin û yekî ji wî nermtir hate dewsa wî. Waliyê nuh îşka ser Êzîdiyan hinek sist kir û ew ta şerê cihanê yê yekem, heyamekî aşî û rihetî jiyân.

Piştî ku şer dest pêkir, Êzîdiyan xwest ku vê rewşê bikar bînin û xwe ji bin nîrê Osmaniyan derxin. Dema Turkiye êrîş bir ser mesîhiyan û dest bi qetlîaman kir, rûniştavanên Sincarê ji Ermenî û Nestûraniyan re cihekî azadkirî hazir kirin. Tevî zirt û pîkoliyên dewleta Tirk jî, Êzîdiyan, penaberên Sincarê teslîmî wan nekir. Dema hatina Îngilîzan a herême eşkere bû, hingê mîrê Êzîdiyan ê wê çaxê çû Bexdayê û gelê xwe xist bin emrê wan.

Piştî lihevhatina şerê cihanê, Êzîdiyan têkiliyên xwe bi koloniyên Îngilîz û Frensiyan ên li Îraq û Sûriyeyê ve girêdan. Ji bilî serhildana ku di sala 1935-an de li Bexdayê dest pêkir û zû hat perçiqandin, tam dikaribûn baweriya xwe ya olî bi rihetî bi cîh bianîna.

Li Turkiyeyê ev tade û zorî, her berdewam kir. Gelek Êzîdî di navbera her du şerên cihanê de li hember hukûmeta Enqereyê piştgiriya serhildanên Kurdan kirin û hatin qetilkirin; ên ku sax filitîn, koçî Îraqê, Sûriyeyê; û hinek ji wan jî derbasî Sovyetê bûn. Ew di nav gelên din de, weke gelekî piçûk û mazûr hatin dîtin, her weha ji ber kêmasiyên xwendinê û têkiliyên bi derve re û qedexebûna xwe fêrkirina xwendinê û nivîsandinê jî bûn sedem ku Êzîdî li Turkiyeyê kêmbûn. Zordestiyên ji derdora misilmanan, kêmasiyên zanebûnê a di derheqa ola wan de, awayên coxrafîk û ji navenda xwe ya li Îraqê dûrketina wan, anî rewşeke wisa ku di van pênc salên dawî de weke ku di jor de jî hat gotin, tevayî Êzîdiyan dev ji Turkiyeyê berdan û ji bo jiyaneke nuh, çûn li Elmanyayê bicîh bûn.

Ew gundên Êzîdiyan, ên ku li hember van bûyeran herî zêde ber xwe dabûn, di vê sîstema feodalî de, xwe gihîştandibûn axayekî ji yên herî bi hêz -çî misilman, çî mesîhî- û ketibûn bin parastina wan.

Ev hoyên li jor rêzkirî, bûne sedem ku Êzîdiyên Sûriyeyê, bi taybetî jî ew herêmen bakurê rojhilata Helebê ku nêzî tixûbên Turkiyeyê ye, gelek kêmbûne. Li wan herêman, ku di destpêka vî sedsalî de bi tevayî Êzîdî bûn, çawa ku li jor jî hat gotin, tenê çend gundên Êzîdiyan mane û yên din derbasî ser dînê Îslamê bûne.

Ger bi vî awayî berdewam bike, bi texmînî dê piştî çend salên din çîroka Êzîdiyan li Sûriyeyê jî biqede. Lê li hember vê, ji ber ku sîstema siyasî ya li Îraqê nikaribû rê bide fundamentalîzma Îslamî, îmkanên wan ên bi ola xwe jiyîn ferehtir bû. Lê ev tenê ji bo Êzîdiyên Sincarê derbas dibe; bes

ev çiyayên asê ku di nav deşt û çolan de mîna Welatê Pîroz bejinbilind e û li gorî baweriya Êzîdiyan cihê danîna Keştiya Nûh e, her îro jî navenda Êzîdîtiyê ye. Li gorî texmînan îro nivê Êzîdiyan li wir dijîn û li ser axa xwe, di herêmê de, piraniyê temsîl dikin û bi vî awayî karin huviyeta xwe biparêzin. ■


* Ev nivîs ji pirtûka lêkolîngerê Swêdî, Ingmar Karlsson a bi navê "Xaç û Nivheyv"; pirtûkeke li ser eqaliyetên olî, yê Røjhilata Navîn, hatiye wergerandin.

1= Her du pirtûk jî bi tîpên erebî hatine nivîsîn, lê maneya her du pirtûkan jî bi kurdî ne û ew kevntirîn pirtûkên bi kurdî tîn hesabandin. Binêre: Abdulraqîp Yûsuf; Şairê Klasiq ên Kurd, rûpel 25. Weşanên Jîna Nû.

Li gorî lêkolîner Qanadê Kurdo jî, zimanê nivîsê yê Êzîdiyan xweser bû û bi gelek tîpên xwe, jî tîpên erebî cuda bûn. Gelek rojhilatnasên Ewropî û Kurd li ser ziman û bin-yata Êzîdiyan lêkolîn kirine û dîtinên jî hev cuda anîne zimên. Li gorî Qanadê Kurdo, Êzîdiyên Şexan û Sincarê bi zaravayê soranî diaxifîn û pirtûkên ku li jor tîn binavkirin jî bi vî zaravayî û her weha bi tîpên Êzîdiyan ê taybetî hatine nivîsandin. (Binêre: Çarçira; 4,5,6 M. Dehsîwar)

M i b e m e d

Dehsîwar ev ferhenga xwe ji bo zarokan çêkiriye. Armanca ferhengê, fêrkirina maneya bêjeyan a rastnivîs û rastxwendina



wan û bînbîna bikaranîna ferhengan e. Di vî ferhengê de nêzîkî 1500 bêjeyên jîndar yê rojane ku di dibistanan de pêwîstiya şagirtan bi wan heye, hatine amadekirin. Piraniya bêjeyan bi awayekî pedagojîk hatine manekirin û li pêşberî piraniya wan jî wêneyên li gor cih û daxwaziya maneyên wan hatine danîn.

Ferheng bi bergên bi reng û 255 rûpel e.

Navnîşana xwestinê:

Hjúlsta Backar 22/6

163 65 Spånga-Sweden

SEYDAYÊ TÎRÊJ

Şefik Kaya

Di havîna sala 1989 de, min îmkana dîtina Seydayê Tîrêj dît. Belê wext dest neda, ku ez demeka dirêj li cem wî şa'ir û hozanê gelê me bimînim, jê têr bibim. Em berî wî çûbûn, li odeya wî rûniştî bûn. Bermaliya Seyda ji me re çay anî, li odeyê li ba me rûnişt. Li hal û kêfa me pirsî. Dayîkek pir beşerxweş bû. Wê di demeke kin de, xebardan bir ser hal û rewşa miletê Kurd û bêhemdî gotin çû ser helbestên Seyda, yên ku li ser perîşaniya miletê Kurd nivîsiye û bi dengê xwe yê xweş jî dibêje. Dema Seyda li derî da, hat, em li xebardanê germ bûbûn. Bi hatina wî re em tev rabûne piya. Ew cara yekem bû, ku min Tîrêj didît. Dema ku min wî kalê devliken dît, bi rastî min bawer nekir, ku Seydayê Tîrêj ew e,, Lew min ji xwe re digot, "ew Seydayê ku wiha ji dil ve dinivîsine û li ser halê vî miletî dilorîne, wê ne wiha devliken be". Belê dema gotin "Seyda ev e" ez jî yekdilî bûm. Me hemiyana yek bi yek bi edeb Seyda ziyaret kir. Seyda jî eniya me ramûsa.

Ka em bi hev re binêrin bê Seydayê Tîrêj kî ye, ji ku ye, çi nivîsandiye, ji bo çi nivîsandiye.

– Navê min Nayif e, kurê Heso me. Ji min

re dibêjin "Tîrêj". Ez di sala 1923 de, li mintiqaya Cizîrê, li gundê Nicim, li dora Qamişloyê, çêbûme. Navê diya min Besê ye. Em ji Eşîra Bûblana ne. Piraniya eşîra Bûblana li Serxetê ne û hinek jî li Binxetê. Navê kevbanîya min Behiya ye. Çar kur û Pênc qîzên min hene. Ez ji sala 1973 ve li Heskê dimînim.

Pêşî min dest bi xwendina dînî kir û min sê salan xwend. Di sala 1937 an de, ez çûm Amûdê, ketim medresê. Wê çaxê, di medresê de mamosteyên me tev Kurd bûn. Midîrê medresê Kurd bû, Mifetişê mia'rif jî Kurd bû, Em tev Kurd bûn. Bêguman me teva bi Erebi nizanî bû, mamostayên me ji me re dibûn alîkar. Wê çaxê partiya Xoybûn hebû û ez yek ji endaman bûm. Di sala 1937 de, ez bûme endamê Hizba Xoybûn. Wê çaxê seqafetek kurdî hebû, radiyoya kurdî li Şamê rojê du caran bi kurdî hebû, sibe û êvarê. Çar rojnameyên me hebûn, du ji wan ji Lubnanê dihatin, du jî ji Şamê dihatin. Hawar û Ronahî ji Şamê, Stêr û Roja Nû ji Bêrûdê, ji cem Kamîran. Rihma Xwedê lê be !

Yek ji endamên bilind Seydayê Cegerxwîn bû û Qedrîcan midîrê medresa me bû. Ew jî bi şerê mijûl dibû. Min jî pir meroqa şeirê dikir. Çi roja hebû, Seydayê Cegerxwîn



Seydayê Tirêj

şer'ek nû ji me re li ser lewhê datanî, me ezber dikir. Em keşafên Kurda bûn. Çekên kurdî li me bûn, alaya rengîn li ser sînga me bû. Di sala 1943 de, sê şer'ên min di Roja Nû de derketine. Bi alikariya Mele Hesênê Kurd min ji Kamîran re dişand. Mele Hesênê Kurd ji min distend û dişand. Min di wê demê de Farişî jî xwend wek kitêba Gulistan, Bilbilistan û Pendî-eta...

Ez bi Kurdî, bi Erebî û bi Farişî dizanim. Ev tiştê ku bi min re çêbû ne ko ji xwendina min î pir, ji civata Kurda... Ez di nav civatên wan de rabûme. Ez bi rabûn û rûniştina wan re bûm. Ez bi şewbihêrkê wan re bûm. Ez bi dahol, zirne, kêf û eşqa wan re bûm. Ev ji min re bûn ilm. Ev ilmê min ji welatê min hatiye. Rast e, min hebekî xwendiyê, lê ew xwendina bilind ku tê ê bêjî na. Lakin ev tiştê ku bi min re çêbû ji nava welatê min û ji halê Kurdan bi min re çêbû. Ji ber ku ez di xweşî û şînen wan de

bûm. Min ji wê çaxê ve çî tiştê bidîta yan jî bibihîsta ji xwe re dinivîsand. Herwekî Seydayê Cegerxwîn. Seydayê Cegerxwîn, ilmê şer'ê xwendiyê. Lakin, Seydayê Cegerxwîn li çar goşê Kurdistanê geriya û ev ilmê mezin pê re çêbû. Ji nevsê welatê wî ev ilmê pê re çêbû.

Ez benî, hûn dizanin, ji xwe zilm û tadayê ev tişt bi min re çêkir. Zilm mirov dikişîne ser şer'tê. Ji ber zilm û tadayê înficar (teqandin) bi mirov re cêdibe û şêrîniya welatê min. Şêrîniya miletê min li ber dilê min û ew belengaziya ko ew tê de. Tev di bin destê axa û began. Ez di wî zemanî de rabûme. Ew zilma ko wan dikir min didît. Tev belengaz bûn, perîşan bûn. Melayê wî zemanî çoganê axa bûn, li teniştê axa rûdiniştin û xwe hildiqerastin. Arîkariya Kurden belengaz nedikirin.

Dîrokek ji vî miletî re dimîne û ev kokek e ji bo me, çî miletê dîroka wî tunebe kok jê re tune.

Ez benî, ez bi her şiklî dinivîsînim. Felsefî dinivîsim, evînî, ez gelekî tê de xurt im, qewmî ez gelekî tê de xurt im. Ez ne tenê şer'ran, ez çîrok û serpehatiyan jî dinivîsînim. Min yek çêkiriye li ser zilma beg û axan, navê wê "Serpêhatiya Sîpan û Perwîn" e. Min kitêbek jî serpehatiyên kurt nivîsî ye. Min di vê kitêbê de rastiya welatê xwe nivîsiye. Mesela, wek dilketina xort û keçan. Mesela, comerdiya Kurdan, mêrxasiya Kurdan ji rastiye min nivîsî ye. Tiştê ku bi wan re çêbûye min ew nivîsiye, ne kême û ne jî zêde.

Şer'ra kurdî eslûbekî xas e. Tu carî nehatiye girêdan bi şer'ra erebî ve. Min gelek şer'ên erebî xwendiyê, gelek diwanên wan ji serî heya binî. Tu li min nenihêre, gava

ez dixwînim pir eciz dibim, şe'ra kurdî bi eslûb e. Şe'rên kurdî ji serî heya binî rihê wan heye, cewherê xwe dide. Yek ji yekê bi tamtir e. Carinan ko ji min re bêjin "Seyda, ka şe'rekê çêke!". Ez dikim nakim nikarim. Du kelîman bi ser hev ve nayinim. Lê carinan jî, ji nişkê te dît pêlek hat min. Ew pêl wextê ko tê min hûn bawerkin qelma min di ber re nagihê.

Ez benî, ana du dîwanên min temam bûne, yek ji van çap bûye, yek hîn çap nebûye. Ya sisiya ev e ku min ji te re got, serpehatiyên kurt. Mesela, dibêjin, "Li ciyê bav û bapîran, qizwan xweştir in ji hejîran". Ka gelo mana vê qisetê çi ye?

Ez benî, carekê dikaneke min hebû, min çend salan di wê dikanê de kar kir, lê min nebîr serî. Ez niha vala bûme ji bo nivîsandinê, ji bona karê nivîsandinê û edebî. Ez bi şev û ro dinivîsim.

Bi Xwedê, aborî tu tesîrê nake. Bira, bi Xwedê milyonek di berîka min de be û pênc wereqe di berîka min de be ji min re weke hev e... Wextê ku ez şe'rekê çêdikim ji min re hêjaye malê dinyayê tevî. Wextê xort dibihîzin, ko min şe'rek çêkiriye, te dît hatin hindur tije bûn, dibêjin "Seyda, de ka şe'ra xwe ji me re bixwîne!". Ez ê ji wan re bixwînim. Ev rastmalê min heye. Ez vî rast malî dibînim rastmalekî nemir.

Kurekî min mihendîs heye, em bi mia'şê wî didebirin.

Ev jî serbilindayek e, ev kêfxweşiyek ji min re, ez gelekî pê xweş im, ko miletek min dinase û qîmetekê dide min. Min ji bo vê xebata xwe, tu carî, xwe li ser millet wilo paye nekiriye. Ez ne weke hinekan xwe difentizînim. Ev tişt li cem min tune.

Daxwaziya min ji Kurdên Ewropa: Ne

ko herin Ewropa û terka zimanê xwe û miletê xwe bikin. Ji ber ko millet bi hêviya van xorta ye. Em hêvî nakin ko herin bi çîmên ditazî, ew porê sorxelek mijûl bibin û bi pey wan bikevin. Daxwaziya me ji wan ko li wir ji me re karekî bikin. Karê siyasî bikin. Karê edebî bikin. Li tarîxa xwe bigerin. Em vê hêviyê ji wan dikin. Bira her Kurdek zanibe, tarîx neynika cîhanê ye, çî însan hebe ew mirêk sûretê wî digire. Qencbûna û xirabûna wî. Ew kesên ko derdê milletê xwe ji bîr dikin, bira zanibin tarîx wan jî disecilîne. Divê hûn zanibin, milletê me di çi bindestiyê de ye. Em bi xazê tîn şewitandin... (Seyda keserek kişand, navbirek da xebardana xwe û bi goşê egala xwe hêsirên xwe paqij kir. Piştî qasekî axaftina xwe domand). Em li serê çiya ne, tev li ser sînoran tîne kuştin! Tev birçî ne, tazî ne, perîşan in... Divê ronakbîrên me bi vî tiştê mijûl bin, ne ko bi nefsa xwe tenê. Ez benî, ê min çarde kuflet di sitûyê min de ye. Welahî hima nan bi destê me bikeve em memnûn in. Em li tiştê mestir nagerin. Ez dixwazim halê milletê xwe ji xelkê xwe re, ji xelkê cîhanê re bidim zanîn. Di pey me re, bi sedê salan ko xortên Kurd rabin, bixwînin da ko zanibin di vî zemanî de bi serê Kurdan çi hatiye. ■

Tîrêj

MUYÊ SPI

Xort û ciwan bûm emrê min sih sal
Bayê min bilind bû ne xem û xiyal
Kuncîlê li min çox û qumaş bûn
Bi kum û kolos bi şapik û şal

Xwîna ciwaniyê ez hildidam jor
Herdu dêmên min mîna gulên sor
Dema min xweş bû bi kêf û şahî
Şewqa dilê min dida Tor û Zor

Mûyekî spi kêfa min şikand
Dolaba zemên li min wergerand
Ciwaniya min ji min bi dûr xist
Sed kul û keder di dil min de çand

Serê sibakê şiyar bûm ji xew
Bi dengê bilbil bi qeqqeba kew
Dev û rûyê xwe min şûşt bi avê
Bi mi r ev çê bû bi ro ne bi şew

Min bi neynikê li xwe dinêrî
Ji gerden û rû heya bê serî
Min di di nîva porê min î reş
Mûyekî spi tê de wek hêrî

Li ber çavên min bû wek Melkemot
Can û ceger û dilê min disor
Ez vedcîniqîm bi dîtina wî
Bi kerb û kîn min ev jê re got:

Tîrêj:
Tu tenê li vir çi dikî ez benî ?
Di vî cihê reş seva wek tenî
Ev cihê tarî warê diza ye
Gelo tu dost î weya dijmin î ?

Mû:
Bawer bik ji min ez dost û yar im
Ez ne dijmin im ez ne neyar im
Destê biratiyê em ê bidin hev
Ez takî mû me ez bê zirar im

Tîrêj:
Ji kîja cihî ji ku deverê
Çawa bêyî min tu vê derê
Rastî bibêje bera te nadim
Heya deh rojan bi sozê berê

Mû:
Bira, rêwî me ez dûrîdest im
Şev li min geriyan sergêj û mest im
Jar û belengaz pêxwas û birçî
Kesî min nîn e li vir rawestim

Tîrêj:
Tu ne rêwî ye ne tî û birçî
Xerîb dibînim ez te li vî cî
Ev tiştê te got neket serê min
Divê tu rabe ji vê der biçî

Mû:
Heya tu hebî ez ê mêvan bim
Heya tu tîr bî ez ê kevan bim
Çawa tu zanî ji xwe r wisa bik !
Heya tu pez bî ez ê şivan bim

Tîrêj:
Kê tu şandî vir bi qelawizî
Porê min î reş da tu bidizî
Mû bi mû yekser biguhêre spi
Qet ez naxwazim vî reng û terzî

Mû:
Ne diz im Tîrêj ne keleş im ez
Lê şevçeraxê şevê reş im ez
Çarhawêrê xwe ez dikim rohnî
Agirê Zerdeşt li Laleş im ez

Tîrêj:

Bi derzîke hûr wê bengeha te
Ez ê bikolim kok û reha te
Devê mûçingê bavêjme jorê
Ji bin hilênim asîgeha te

Mû:

Koka min kûr e dûr û dirêjî
Penc û rehê min gihane mêjî
Ne mûçinga te ne derziya hûr
Tu kêrê nakin tu ji xwe r dibêjî

Tîrêj:

Ege serê te bighê ezmana
Tu qet min nakî kalê zemana
Ez ê te bikim piçîk û parî
Bidim ber devê kêr û guwîzana

Mû:

Roja cîhan im hatim delava
Hîva çarde me ez naçim ava
Sed kêr û guwîzan min natirsînin
Ez im birûska nêv ewr û tava

Tîrêj:

Pêlek ji lehya xema tu anî
Li ser serê min îro te danî
Nîşana pîriyê li min xuya kir
Rengê ciwaniyê ji min hilanî

Mû:

Çilkeke zîv im li ser serê te
Tacek zêrîn im li keşwerê te
Ji min metirse ez xweş heval im
Hemî aqil im ez yawerê te

Tîrêj:

Çelapekek berf ji ya serheda
Li ser serê min te sîwan veda
Li min tu bûye şûrê qederê
Ferman li xort û ciwaniya min da

Mû:

Xem û derdan mex tu hê ciwan î
Ez ne dijmin im tu xweş bizanî
Ez taca serê aqilmenda me
Di her wextî de di her zemanî

Tîrêj:

Wekî derwêşan tûr li mil û pî
Dinê li hev dim qapî bi qapî
Ciwaniyê êdî nema dibînim
Piştê vê tirsê vî porê spî

Mû:

Rostemê Zalê rabî ji gorê
Guhder û Xesro xwe bidne dorê
Tu xweş bawer be tu çiqê nakin
Min naşikînin bi darê zorê

Tîrêj:

Tu şûrê Heq e ji genca Yezdan
Danter ji nîva nîqap û perdan
Wê çi bike Tîrêj darê xwe danî
Tu dest li ber te nayêne hildan

Helbestvan û xweragir

SEBRIYE HEKARÎ

Xelî Duhokî

Sebriye Hekarî di sala 1948-an de, li bajarê Duhokê ji dayik bûye. Şeş salan xwendiyê û di sêzde saliya xwe de mêr kiriye û niha neh zarokên wê hene. Di sala 1969-an de, dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Rejîma faşîst a Iraqê, di sala 1977-an de, zîlamê wê li sêdarê dide. Ew bi wê rewşê zarokên xwe xwedî dike û li ser vehandina helbestan jî berdewam dibê.

Di sala 1989-an de, dîwanek helbestan bi navê "Parzînkê Hîviya" çap kiriye û du dîwan jî ji bo çapê amade kirine. Endama Yeketiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistanê başûr. Niha jî berpirsiyara Yeketiya Afretên Kurdistanê ye li Duhokê.

Piştî zulma dehan salan, gelê kurd li Kurdistanê başûr, karî bi serhildanê rabe û dezgehên faşîyan têk bide. Ew salên giran û pirr sîtema hovan li ber çavan in. Her wesa şehîdbûna mêrê Sebriye Hekarî û rewşa aloz a xelkê bêguneh naêne jibîrkirin, lewra ew dibê:

- Serhildan delîveka dîrokî ye û divê her



Sebriye Hekarî

kes li gor şîyanên xwe xebatê bike û nehêle hêzên hovan cardin welatê me dagîr bikin. Ev azadî û serbilindiya niha, hêzê dide û dilê mirovî pirr hêvî dike. Divê em vî welatê wêrankirî ava bikin û vê hukumeta sava

biparêzin û nehêlin destên genî yên dijminan pîs bikin.

Di rewşek weha kambax de, welatê me pêdivî tevaya xelkê ye, nemaze edîb û rewşenbîrên kurd. Helbestvana jêhatî Sebriye Hekarî weha didomîne:

– Barê edîbên kurd giran e û wezîfa wan jî mezin e. Divê ew piştevaniya milletî bikin, çinku doza welatî ji hemî tişteki pîroz-tir e. Lê mixabin û ji ber her sedemê be jî, nivîskarên me nekarîne rola xwe bilîzin.

Helbet dema bizaveka rexneyî ya bi hêz hebe, hîngê edebiyat pêş dikeve û qonaxên sext dibire û digehe pileya yên nemir. Helbestvana me li ser rexnê weha dibêje:

– Bi rastî rexne nakeve berçav û bêtir li ser xeletiya dinivîsin, yan jî pesnê zêde didin û berjewendiyên xwe diparêzin, ne ku berhemê edebî ji aliyê form û naverokê ve disengînin.

Ew wek pîrekeka kurd, rola xwe dilîze û bawerî heye ku jin nîva civatê ye û wê jî pirr qurbanî dane. Li ser vê meselê jî, van peyvyan rêz dike:

– Rola jinê gelek e, nemaze niha azadî heye, komele û bingehên afretan li her derê welatî hene. Jina kurd bi dirêjiya salan, di nav şoreşê de, xebat kiriye û çendînen wan jî şehîd bûne. Ew dayik, xwişk û jina qareman bûye û zîndanên faşiyên Îraqê jî, şahîdên vê rastiyê ne.

Belê; afreta kurd berdeyam di senger û çeperên şoreşê de rûniştiye û bi çek ê qelemê xwe jî xebat kiriye. Mêr, kur û bira lê şehîd bûye, di zîndanên de xwe ragirtiye û armançên gelê xwe parastîne.

Sebriye Hekarî, helbestvan, dayika neh zarokan û jina şehîdiye. Xweragir û serbi-

linda milletê xwe ye. Em ê helbesteke wê jî ji xwendevanan ra diyarî bikin... ■

HILON GELO...

Hilon gelo mitî bes e
Bêhivedan ne bo me ye
Ma nizanin
Heyva evîna omêda xeware ye!
Tirojkên roja azadî û serbestiyê
Bijale ye
Mafê xwîna min berze ye!
Xemxorên tev mafên resen
Di hizra da şepirze ye
Giriftar e, tengezar e, kesîre ye!
Ma nizanin
Stêra Xeca Siyabendî
Li esmanê stêristana, posîde ye!
Kezî û biskên Zîna Memê
Li Cizîrê, hêsta di destê cendirma da
Dikene xilfa sêdarê
Bo gerdena Mîrê me ye...
Ma nizanin
Axa gora tev şehîdan
Gazî we ye.
Dibêjtin, hilon hilon
Guh nedene kuledara
Kuledara paşexistin
Olperêsa, diravrêsa
Ji zanîne dwtêxistîn
Lewma gelo
Naveroka paşeroja me eve ye...

ROMANSEKE ÇILMISÎ

Firat Cewerî

Te digot qey aciziya pênc salên xerîbiyê wê rojê civiyabû ser hev û bûbû kabûsek û destê xwe xistibû qirika min. Tenêtiya min ya wê rojê diltenikiyeke bêhawe bi min re çêdikir û bêt hemdê min gunehê min bi min dianî. Ew gunehpêanîna min ya xwe bi xwe, derzek li şexsiyet û gûrûra min dixist û wê hîsa han jî ez dajotim ser fikrên dawîanîna jiyaneke bêmane û stûxwar. Hundurê odeya min ya biçûk ji min re bûbû mîna zîndanekê û di wê zîdana tenêtiyê ya nedîtî de celadan bi qamçiyên li hîsên min didan. Min dixwest ez ji ber celadên bi zend û bend yê nediyar baz bidim û xwe bavêjim hemêza dilbirehminan û di hemêza wan de bi îskîna zarokekî hêşîrên delaliyê birijînim.

Erê, nayê bîra min bê min çawan kovarek li hev pêçabû û xwe avêtibû derve. Piştî barana bi çend rojan herdu rojên dawî gelekî xweş bûn. Gava ez derketim derve, poşmaniya ku ez heta niha di hundir de bûm, di mêjiyê min de derbas bû. Min li dor saet yekê piştî nivro xwe gîhande bajêr. Ez rast çûme kafeteryayeke havînî. Min ê li wir qehweyek vexwara û paşê bi niyeta belkî ez hevalê xwe Riza bibînim, ez ê biçûma pirtûkxaneyê. Min ji xwe re fîncanek qehwe û şêraniyeke biçûk kirî û ez li ser kursiyekê rûniştim. Bi vexwarina qehwê re min kovara xwe jî vekir û ji acizî çavek lê gerand. Bi xwarin û vexwarinê re, xwendina kovar û rojnameyan ez li welatê te hîn bûme. Ez nizamim tu ji ku derketî. Pantorekî kurt û qutikek li te bûn û tava royê ya van herdu rojên dawî tu şewitandibû. Tu di ber maseya min re derbas bû û te bi lez ji xwe re qutikeke fanta kirî. Te ji bîr kir ku tu rahêji qedehê, lê keçika li ser qaseyê ew dirêjî te kir. Tu li maseya hemberî min rûnişt. Qedeha ku te nivî kiribû, te bi carekê ve bi ser xwe da kir. Ji ber pîrbûna asîtê qirpika te hilat, lê te tavilê destê xwe da ber devê xwe û te çavek li dora xwe gerand. Te ê fêhm kiribe ku wê dengê qirpika te hatibe min, loma te ji şerman serê xwe xiste ber xwe. Pêşênîka porê te yê kurt û zer, ji xwêdanê bi eniya te ve zeliqî bû. Mîna ku qet haya min ji te tune be, min rûpelên kovara xwe hêdî di ser hev re diqulupandin. Paşê gava min serê xwe rakir û berê xwe bi te vekir, min dît ku te awirên xwe bera ser min dane.



Wêne: Ata Kazaz

Tu bi min re bişîrî. Ji bo ku ez dilê xwe têxim cih bê tu bi min re dibîşîrî, min li maseyên li pişt xwe nihêrî. Li pişt min, ji keçîka garson ya ku firaxên vala ji ser maseyê didane hev pê ve, kes tune bû. Dilşahiyeke bitirs ez girtibûm. Bêî ku ez firrîni-

yê ji qehweya xwe bînim, min hêdîka vedixwar û mîna ku ez dixwînim, min çavên xwe berdabûn benedê di kovarê de. Lê hişê min li te bû. Gava min dîsan serê xwe bilind kir û li maseya te nihêrî, vê carê çavên me ketin hev, me tibabekî li hevdu nihêrî, çavên te zora çavên min birin, min serê xwe bera ber xwe da û min bi şermokî bi neynûka tiliya xwe ya girdikê leyist. Ew acizî, bêhtengî û tenêtiya min ji min bi dûr diketin. Dilê min gelekî fireh bûbû, lê ez ji heyecanan diricîfm. Gava te vexwarina xwe ya dawî vexwar û li saeta xwe ya biçûk ku bi zincîrekê di stûyê de bû, nihêrî, tîrsa ku tu ê herî ez girtim. Gelo min çi bikira? Ez ji ser maseya xwe rabûma û bihatama ser maseya te, dibû ku te erza min bişikanda. Lê min bi destan tu dawetî maseya xwe kir. Bi daweta min re tu bişirbû, te serê xwe bi nazikî li ba kiribû û tu bi kêfxweşî hatibû. Tu devliken bû. Berî ku tu rûnê, ji bo danasîna xwe te destê xwe dirêjî min kir, ez jî rabûm ser xwe û min destê xwe da te. Navê te "Malîn" kêfa min anîbû, "Nalîna" kurdî anîbû bîra min. Min jî xwe bi Juan bi te dabû naskirin. Te ji min pirsî bû bê ez ji kêjan welatî me. Gava min gotibû ez Spanyolî me, te behsa gera xwe ya Madrîdê kiribû. Ew çend gotinên spanyolî ku tu ji gera xwe fêr bûbû, te ji min re gotibûn. Min tiştek fêhm nekiribû, ez tenê keniyabûm û min serê xwe ber bi jêr ve hejandibû. Te ji min pirsî bû bê ez ji Swêdê hez dikim an na. Min dixwest ez li gora dilê te herim. Gava min gotibû "ne zêde" min bi tîrs gotibû, lê gava min fêhm kiribû ku tu bi xwe jî ji jiyana vir ne ewçend razîbû, êdî tiştên ku hatibûn ber devê min min gotibûn. Te ez biheq derxistibûm. Lê ji nişkê ve hebûna te welatê te bi min şêrîn kiribû. Dilşahiya min difûriya. Te çavek avêtibû kovara li ser maseya min. Te sernaveke kurdî mîna spanyolî xwendibû. Ez bi te re keniyabûm, lê ji ber ku min ji te re rastî negotibû, min ji xwe şerm kiribû. Ji bo ku ez mijarê biguherim, min ji te pirsî bû bê tu tiştekî sar an dondirmeyekê dixwazî an na. Te dondirmeyek xwestibû. Ez bi kêfxweşî rabûbûm, min ji me re du dondirmeyên di qutikên lekînî de kirî bûn. Te kevçîkê xwe yê lekînî te da kiribû, lê ji ber hişkbûna dondirmê, kevçî şikestibû. Em herdu jî keniyabûn. Şerma min nemabû, te digot qey ev deh sal in em hevdu nas dikin. Te jî gelekî nêzîkahî nîşanî min dabû. Gava min xwestibû ez herim ji te re kevçiyekî nû bînim, te nehiştibû, te bi kevçiyê min xwaribû. Te tûfiringiya li ser dondirmeya xwe bi kevçîkê lekînî xistibû devê min. Paşê min kevçî ji destê te girtibû û ew tûfiringiya li ser dondirmeya xwe ya ku sor dikir, xistibû devê te. Di demeke kurt de em pîrr nêzîkî hev bûbûn, em pîrr keniyabûn. Carekê min dilê xwe bijandibû mêtina lêvên te yên sor û dagirtî. Mîna ku te jî hîs kiribe te ziq li çavên min nihêrîbû. Paşê te ji min xwestibû ku em bîskê di hewa xweş de bigerin. Ez bi kêfxweşî bi te re rabûbûm. Çer ku em ji kafeteryayê derketibûn, te destê xwe xistibû destê min. Min bawer nekiribû, ji min re mîna xewnekê hatibû. Germahiya destê te di laşê min de belav bûbû, çongên min ji heyecanan diricîfm. Destên me di hevdu de em çûbûn parke-

ke ber çemekî, em li ser benkekî li hemberî çêm rûniştibûn. Me li ordekan temaşe kiribû. Lê destê te hêdî hêdî di destê min de tevdigeriya. Min jî destê te mist dabû. Paşê min destê xwe avêtibû ser stûyê te. Mîna ku te ew yeka han ji zû ve dixwest, te mîna berxikekê xwe xistibû hemêza min. Min serê te maçî kiribû, herdu destên xwe li stûyê te gerandibûn. Tu di nava lepên min de bûbûyî mîna zarokekê. Di wê navê de gava serokê komeleya me û jina xwe re di wir re derbas bûbûn, min berê xwe guhretibû; min şerm kiribû. Em heya saet heftê êvarê bi hev re geriyabûn. Me ji dondirmefiroşê li parkê du caran dondirme kiribû. Em li çarşiyê geriyabûn, me li camekanan temaşe kiribû. Em li ber camekaneke ku kirasekî bûkaniyê lê daliqandîbû, gelekî rawestiyabûn. Te ji kirêş pir hez kiribû. Te gotibû, mirov carekê dizewice û mîna ku te ew pêşniyaz ji min re anîbû, te kûr kûr li çavên min nihêribû. Xwedê-yo, tu ji min re ji ku derketibûyî? Mîna ku min qet tenêtî nedîtibe û xemgînî nekişandibe, ez dilşa bûm. Ma dilşabûn jî peyv e? Ez ji kêf û şahiyana difriyam. Keçên ku di ber me re derbas dibûn, mîna ku ez bi wan qayil nedibûm, min xwe dinepixand, baweriyeke ecêb bi min re çêbûbû. Gava em di ber restorantekê re derbas bûbûn, min pêşniyaza ku em herin şivekê bi hev re bixwin, ji te re anîbû. Lê te nexwestibû, te ji min pirsî bû gelo tişteki xwarinê li mala min heye. Min çar mirîşk di erzaniyê de kiribûn, gava min gotibû, li malê mirîşk hene, te kêfa xwe anîbû û hezkirina xwe ya ji mirîşkan re anîbû ziman. Ji bo ku em ji otobusa heft û nîvan nemînin, em bi xar ber bi rawestokê ve çûbûn. Em û otobus bi hev re gihîştibûn rawestokê. Gava em li otobusê siwar bûbûn, çavên min li hevalekî min ku li rêza pêşî rûniştibû, ketibû. Min bi swêdî silav lê kiribû û em derbasî rêza herî dawiyê bûbûn. Te destê min bernedida. Te çend caran bi spanyolî gotina "ez ji te hez dikim" gotibû. Hilma te ez diqidiqandibûm, laşê min lerizandibû. Gava em li rawestoka ber mala min peya bûbûn û me destên xwe avêtibûn ser stûyên hev, mîna ku hevaleyê min dexisîbû, wî serê xwe xistibû ber xwe û bi stûxwarî ber bi mala xwe ve meşiyabû. Bêî ku di destên min de be, bi hebûna te min xwe qure kiribû. Em bi esansorê hilkişiyabûn qatê heftan û em derbasî odeya min ya biçûk bûbûn. Te qet xerîbî nekişandibû, mîna ku tu li mala xwe bûyî, te xwe rehet dîtibû. Te sola xwe ya paçikî î spî ji pê kiribû û ji ber westandina gera hemû rojê, xwe li ser piştê avêtibû ser nivînê min. Ez jî li qorziya qeryole li ba te rûniştibûm. Paşê tu jî rabûbû li ser xwe rûniştibû û te odeya min di çav re derbas kiribû. Çavên te li dîwêr li ser wêneyekî sekinîbû. Ew wêneyê birayê min bû. Gava min bi te dabû zanîn ku ew birayê min e, te pozê me şibandibû hevdu. Paşê te bi lêvên xwe yêncî pozê min maçî kiribû. Min xwe negirtibû, min jî pozê te yê biçûk û li hev maçî kiribû. Mîna ku ez ê ji destên te baz bidim, te bi lez gomlegê min ji min şeqitandibû. Ji ber bêpirçbûna sînga xwe ez li ber xwe ketibûm. Lê te bi tevgerên xwe firsend nedabû min. Ez bi germahiya laşê te ji xwe çûbûm. Gava saet yanzdehê şevê em ji nava nivînan rabû-

bûn, min behsa çêkirina mirîşkê kiribû, lê te nexwestibû, te tenê qîma xwe bi qedehê şîr anîbû û qedeha şîrê xwe jî te bi xwe ji sarincê derxistibû. Wê êvarê min kir û nekir, dîsan te firaxên min yên ku ji hefteyekê de mabûn şustibûn. Gula min ya li mitfaxê, ku li ber hişkbûnê bû, te av da bû. Mîna bermaliyeke ku rojên yekşeman mala xwe pak dike, tu pê ketibû te mala min ya tevlihev û gemarî pak kiribû. Ya Rebî, ez çiqasî dilşa bûm! Dûrbûna ji welêt, hezkirina malbat û merivan, tenêti û xemên rojan di wê kêlikê de ji bîra min çûbûn. Heta, gava saet donzdehê şevê me li albuma min ya resiman mêze kiribû jî, ew tesîra her tim li min nekiribû. Di albumê de wêneyekî bala te kişandibû. Bavê min li ser kêlekê li kerê siwar bûbû. Şewqeyê wî berepaş li serê wî bû û cigareya wî ya qalind î ji tûtînê jî di devê wî de bû. Em herdu jî bi wî wêneyî keniyabûn. Paşê te devê albuma min ya rengkesk girtibû û ew danîbû dera hanê. Te destên xwe li min pêça bûn û ez xistibûm hemêza xwe. Bi hezkirina zarokêkî ku bi rojan diya xwe nedîtibe, min xwe di hemêza te de civandibû ser hev. Em heya saet çar û nivê sibehê bi hev şa bûbûn. Nayê bîra min bê em çawa di xew re çûbûn, lê gava ez saet heft û nivê sibehê ji xew rabûbûm, tu ne di nava nivînan de bû yî. Mîna ku heft peya min ji nava nivînan rakim, ez bi sivikahî pengizî bûm ser xwe û min bi navê te "Malîn!... Malîn!..." bang kiribû. Min baz dabû mitfaxê, ez çûbûm serşokê, lê tu çûbû. Gava ez bi dilkulî dageriyabûm odeyê, min nameya te li ser maseya biçûk, ya li ber qeryole dîtibû. Hema min rahiştibûyê û min ew li ser lingan xwendibû:

"Me roj û şeveke xweş bi hev re derbas kir, min gelekî ji te hez kir. Ji ber dilşikes-tîbûna xwe ya evînê, ez niha ji hezkirinê ditirsim. Hezkirin û evîn du hevokên ku min ditirsînin. Lê ev sê meh in, ji roja ku ez hatime vî bajarî û min tu li Pirtûkxaneyê Navendî dîtiye, bêî ku ez haya te bigihînimê, min meyla xwe berdaye ser te. Min ji niha ve cihê te di quncika dilê xwe ya herî germ de veqetandiye. Û ji bo ku ez te ji bîr nekim, ez niha heyvanê zaroka me hildigirim. Min resimekî te ji albumê derxist, bi soz ez ê wî mezin bikim û li odeya zaroka me daliqînim. Ez te ji bîr nekim, lê tu min ji bîr bike. Malîna te".

Erê Malîna min, mîna ku tiştêk ji dilê min qetiyabû, dilşahiya min di qirika min de mabû, min nameya te di nava destên xwe de guvaştibû, ez hêdîka li ser çongan rûniştibûm, min xwe li ser dev avêtibû ser nivînan û ez bi îşkîna zarokêkî giriya-bûm. ■

HAPPY BIRTH DAY TO...!!

Mehmed Emîn Pencewînî

Wekû gulî sîs û jakaw
Le ser şeqam firêdiraw
Y nêrgizî lasik zerdî
Be riqewe pêşêl kiraw...!
Ya karjole û berxî bê şivan
Be sawîlkeyî û bê aga
Le lay gurgan biken geman!!
Çeşnî qetê û
Kewî bendî naw qefesî
Bê aw û dan
Bem serma û soley zistane
Le cêy nazî dayik û dayen...!
Be şir û pir malewe,
Be Quran û bermalewe
Be desraze û hethetoke û
Bêşke û bûkî minalewe!!
Wek qerec û dom û xerat
Le naw çeçî delalxane
Mezad! Herac!!
Herac! Mezad!!

Le cêy (happy birth day to you)
Le batî diyarî û cejnane
Des le milane û babe giyane
Bêrî nomal, muşûrî şû...!!
Le ser şostey ter û şêdar
Dil be azar
Hest birîndar
Bawan şêwaw û kost kewtû...!
Kezî zerd û agrîcey xaw
Çawî şînî asmanîyan
Le tirsane, le birsana

Ebleq bûwe, waqiyay mirraw!
Çon peyaken
Nanî jînî pir le zûxaw
Le ber diwa rojî teng û tar
Wek rişole û pole kotrî
Be tor gîraw!!
Rîz çinrawin, dahêzrawin
Bo firotin.
Deskêşî ciwanî rengawreng
Gorewî ben
Serkilawî xûrî nayab
Şitî degmen
Bermaxêk û hendê tûtin
Bo firotin
Mîr û murû
Purediraw be qalonçe û zerdewale!
Şitî seyrû wîrdewale!!

Lew laşewe
Le penayekî nedîwî
Kes nezan û nenasewe
Le jêr kewlî meynetî da
Le naw bergî pelasewe
Pîrejinê be tîle çaw...!!
Dilî pir la ax û zûxaw...!
Basî gul û abrû deka!
Newek tepke dawî zîr û diraw
Dile pakekey lê bidzê...!
Rawî biken
Wek kerwêşkêkî bê agaw
Karmamizê...!
Bo zelkawî firîw bixzê...!
Zerdewaley dawên pîsî
Şiley gulî lawî bimjê...!
Le ber çawî dost û dujmin
Qetrey pakî heyay birjê!!
Bîken be pen!
Abrûman ben!!

Xelkî Hewlêr!!
Gorewî ben
Lifkey nayab, kewçîkî dar
Destkêşî ciwanî rengawreng
Heta zuwa biben be bar
Biben be bar...
Ho kurdîne
Ho xelkî (şar)...
Bo dananî xîştî dîwar
Yaxud berdê le ser melo...!
Daldey cuckey çingî helo
Dilniya bin... lêzanî... bar...!
Lê... zanî... kar...!
Wa êstake, le naw çeçqî delalxane
Herac dekem
Her kel û pelêkî ke hem
Herzan mezad
Herzan herac
Belam encam
Lêwî hez her dega be maç
Îsa dadegîrê le xaç...!!
Heta zuwe
Ta le destan derneçuwe
Em derfete le des meden
Zû biken bikrin
Gorewî ben!
Gorewî ben!!

Le Dîwanî "Ke gil ebête Himogilobîn" le çapkirawakanî Dezgay roşinbîrî û bilaw kirdinewey kurdî, Bexdad, 1987.

DEMEKE KU HATE KUŞTIN

Ji ARŞÎVÊN POLÎSAN REWŞENBÎRÊN RÛSAN

Süleyman Demir

Bi perestroyka re, arşîvên GPU (navê KGB yê kevn), NKVD (Komîsêriya ji bo karên navxwe û bûye navê GPU yê bi dûre) û KGB jî hêdî hêdî dest pêkirin û hatin eşkerekirin. Ev nivîsên ku ez ê li jêr pêşkêşî xwendevanan bikim, li gora agahdariyên ku wê wextê eşkere bûne, hatine nivîsîn.

Encama tiştên ku heta aniha hatine eşkerekirin, li ser navê sosyalîzmê şermezariyeke mezin e. Gelek tiştên ku ji wan arşîvan derdikevin, mûyên serê mirovan gij dikan. Keleşî û kevnariya ku di warê fetisandina ronakbîriyê de bûye, nikare sosyalîzm be. Armanca min ne riswakirina sosyalîzmê ye. Lê mixabin li gora dosyayên ku eşkere dibin, rastiyên tahl in û li ser navê sosyalîzmê bûne. Dosya didin xuyakirin ku di şexsiyeta bi sedan ronakbîran de demeke yekser, dema nav salên 1920 û 1950 hatiye kuştin. Ne pirr nivîskarên birûmet ji mirinê xelas bûne.

Ev rastî bi gellek awayan derdikeve. Pavel Sudoplatov wek yek ji wan şêfên GPU û NKVD yên kevn, jina Bucharin, Anna La-

rîna Bucharina jî wek jina Bucharîn, wek keça Larîn (Larîn yek ji wan çend endamên komîta şoreşê ya bilind ya birêvebir bû) û wek girtiyeye bîst salan, bi bîranînên xwe alîkariya têgihîştina wê demê dikan. Aniha jî, agahdarî ji arşîvên NKVD dikevin destên me, em êdî bêtir tiştan di vê derheqê de dizanin.

Lê dîsa jî, her çiqasî ku kaxet derdikevin û agahdariyên `rast` in jî, bi baweriya min divê mirov para ku dê qet nebe hinek ji wan agahdariyan rojekê bikaribin ji hêla teknîkî de nerast derkevin, ji bîra neke. Tiştên bê rê û neheqî îro jî bi destên dewletê dibin û karbidestên îro di warê xapandinê de ji yên do jîrtir in.

Dema arşîv hêdî hêdî hatin eşkerekirin, mereqdar û lêkolîner ji çar aliyên dinyayê çûn li ber deriyên arşîvxanan rawestiyên û li ser her rûpelê ku ji serdaban derketin derve, bi pûteyî hûr bûn û hîna jî dibin. Gellek bûyerên wê demê ji bo gellek lêkolîneran sergirtû mabûn. Ji bo ku bikaribin wan bûyeran eşkere bikin jî, hew ew rê ji wana re mabû; û êdî ew mecal derket. Lo-

ma jî her rûpelê ku di vê derheqê de bû û ji serdaban derdiket, ji bo lêkolîneran tişteki giranbuha bû. Tiştên ku heta aniha hatine eşkerekirin, li Moskoyê di arşîva Enstituya ji bo Literatura Dinyayê de ne. Lê karê ku di vî warî de dibe, hîna xelas nebûye.

Hejmareke lêkolîner û rojnamevanên Rûsan bi pûteyî li ser wan rûpelan radiwestin. Gellek jê, ji bo ku bikaribin gunehên sosyalîzmê derxin, vî karî dikin û gellek jê jî, bi rastî dixwazin tiştên ku eşkere nebûne, fam bikin û dîroka wê demê ji nû ve binivîsin. Hinek jê jî, bi armanca ku dê bikaribin agahdariyên giranbuha bidest xwe bixin û bi dû re jî bifiroşin biyaniyan, vî karî dikin. Lê armanç çî be bila bibe, di encama karê hemûyan de, dê gellek tiştên ku hata îro sergirtî mabûn bîn eşkerekirin. Ji hêla dîrokî ve, tiştên giranbuha ne. Mixabin ku dîroka rewşenbîriya Rûsan ya demeke dirêj, wek ya siyasî ya wê demê şaş hatibû nivîsin. Agahdariyên ku di derheqa gellek rewşenbîrên navdar de li ber destan hebûn, ya şaş bûn û ya jî nîvcî bûn. Loma jî yên ku dixwestin hinek agahdariyan bidest xwe bixin û berhemên xwe tekûz bikin, li welatên rojava jî ne hindik bûn. Dosyayên rewşenbîrên wê demê, ji bo hezkirên edebiyatê pîrr balkêş bûn. Loma jî agahdariyên di vê derheqê de, zû li dinyayê belav bûn. Lê dîsa jî heta ku tîncumekirin û çapkirin, hinek wext derbas dibe. Tiştên wilo, mixabin dawiya hemû kesan digihin destên me Kurdan. Lê bila hebin, bila dereng bin, ji Kurdan re jî pêwîst in. Min jî bi vê baweriyê xwe tev vî karî kir.

Piştî ku min ev agahdarî bi dest xwe xistin, ez mam li bendî hejmara bi dû re. Min

hêvî dikir ku belkî tiştin nû derkevin. Lê mixabin tişteki nû di hejmara Artes ya bi dû re de tunebû. Loma jî hinek derengketin di amadekirina van nivîsan de bû.

Li gora ku ji dosyayên heta aniha hatine eşkerekirin tê famkirin, bi sedan nivîskar û rewşenbîrên wê demê hatine kuştin. Di serê rêza navan de, navdarên wek Î. Babel, M. Gorkî, V. Meyerhold û bi sedan ronakbîrên din hene.

Tiştên ku eşkere bûn, ji bo Swêdiyan jî balkêş bûn. Li Swêd mirovekî ku bi salan kar di derheqa derxistina rastiya jiyana hinek ronakbîrên Rûsan de kiriye heye: Bengt Jangfeldt.

Bengt Jangfeldt, zimanzan e û nivîskarekî lêkolîner e. Di beşa xwe de xwediyê zanîyariyeke dîrokî ya li gora arşîvan e. Çend pirtûkên wî di vê derheqê de hene, lêkolîn û werger in. Piraniya berhemên Mayakovskî yên bi Swêdî, bi keda wî ne. Aniha yek ji du serok redaktorên Kovara ARTES e. ARTES, bi hevkarîya Akademiya Zimanê Swêdî, Akademiya Musîkî, Wakfa Neh Ruhaniyan û Çapxana Natur och Kultur, salê çar hejmar dedikevin. Her dem hemû di derheqa hunermendiyê, nivîskarên dinyê û xebatên di vî warî de ye.

B. Jangfeldt, cîyekî fireh ji hejmara 4-an ya payîza 1994-an, dabû tiştên ku ji arşîvên KGB derketine. Gelek tiştên ku heta îro hew sergirtî bûn, ya jî bi şik bûn, di wê hejmarê de eşkere kiribûn. Bi taybetî cî dabû nivîsên di derheqa jiyana Osîp Emilyevîç Mendelstam, Vladîmîr Mayakovskî, Marina Tsvetajeva, Maksîm Gorkî, Îsaak Babel, Vsevolod Emilyevîç Meyerhold û jina wî Znaïda Raich.

Bi dû re jî, cî daye danasîna berhemên gelek hunermendên Rûsan. Yek ji wana Dîmîtrî Şostakovîç`ê muzîsyen e. Mixabin ez ê aniha wê ji tiştên di derheqa hunermendiya Şostakovîç de bê par bihêlim, ez ê ji xwendevanên Kurd re hew agahdariyên ku di vê derheqê de balkêş in, yên ji arşivên KGB û şirovekirinên di vê derheqê de derxim.

Divê ez bêjim ku min nivîs tercume nekirine, lê min ramanên nivîsan tercume kirine. Min ne hemû derxistine, lê min yê balkêş derxistine. Heta ku ji min hatiye, min raman û naveroka nivîsan neguhertîye. Loma jî ez nikarim bêjim ev nivîs, yê min in. Lê hinek tiştên ku min berê di vî warê de zanîbûn, ji bo ku bûyer baştir bêm famkirin, min xistine nav.

Ev nivîs, Bengt Samuelsson ji Arkadij Waxberg wergerandine. Waxberg, rojnamevanekî Rûs e. Beşa di derheqa Mendelstam û Mayakovskî de, B. Jangfedt bi xwe li gora tiştên ku ji arşivan derketine, şirove kiriye û nivîsiye.

Osîp Emîlyevîç Mendelstam

Dema B. Jangfeldt dest bi vê nivîsê dike, berî hemû tiştan xwe deyîndarê ku şîretekê li lêkolîneran bike, dibîne. Dibêje, mirovê ku di derheqa jiyana nivîskarên dema desthilata Sovyetan de lêkolînan bike, divê mebesta xwe ne bi gotinên eseh bêje. Ji ber ku gelek tişt di vê derheqê de ne rast in. Bi piranî mirov nizane bê ew nivîskar kengî, li ku û çawa mirine. Loma jî divê mirov her demê para ku agahdarî dê bikaribe ne rast be bihêle. Ji ber ku piraniya nivîskarên wê

demê ne bi awayekî tabîî mirine, KGB gelek tiştên di derheqa wana de veşartî hiştine. Jiyana Osîp Mendelstam û mirina wî wilo bû. Rastiya di derheqa wî de, piştî eşkerekirina arşivan derdikeve. Tiştên ku di derheqa wî de dihatin zanîn, bi alîkariya jina wî Nadezjda Mendelsatam bûn. Lê mixabin dîrok li ser agahdariyên ku hinek bidin, nayê avakirin.

Osîp Mendelstam, helbestvan e. Mirovekî sosyalîst bû û bi baweriya xwe piştgirê Kerenskî bû. Lê piştgiriya wî, bi baweriya wî û nivîsên wî bû. Lê ya ku pîrr balkêş e, cesaretê wî yê rewşenbîrî yê bêpîvan e. Baweriyên xwe yê di derheqa Bolşevîkan de her dinivîsîn û çap dikirin, li qedexebûnê û sansurê guhdar nedikir. Tîrsa kuştinê, ji bo wî nedibû sedema ku baweriyên xwe neniwîse.

Tê gotin ku Mendelstam, di destpêka şoreşê de piştgirî daye desthilata Bolşevîkan. Lê bi dû re, hêdî hêdî bêhêvî bûye û ji wana bidûr ketiye.

Sala 1991-ê, sedsaliya çêbûna wî bû. Dosa wî di demeke wilo de hat eşkerekirin. Hata wê çaxê sedema mirina wî, cî û dema mirina wî ne eşkere bû. Li gora agahdariyên ku ji dosya wî tên famkirin, Osîp Mendelstam 27 çileyê pêşîn yê 1938-an li kampê miriye. Sedem, "dilê wî rawestiya" ye.

Dosya wî 42 rûpel in û sê beş in.

1- Beşa girtina wî ya 1934-an.

2- Beşa girtina wî ya cara duyemîn ya 1 nîsana 1938-an.

3- Beşa ewraqên wî yê kampa civandinê (çîlêyê pêşîn û çîlêyê paşîn) 1938-an.

Li kêleka van tiştan, gelek kaxetên ji jina

wî û birayê wî hebûn.

Mendelstam, cara yekem 16-ê gulana 1934-an, bi sedema ku nivîsên dijî desthilata Bolşevîkan nivîsîne, li Moskovayê hatiye girtin. Mendelstam li ba polîsan, li baweriyên xwe xwedî derdikeve û hinekî ji helbesteke xwe ya ji 1933-an dixwîne. Helbest, yekser rexneyên tûj bûn, ji rexneyan wirde-tir bû, dijî desthilata Sovyetan bû. Lê ev baweriyên min in, dibêje. Baş e, ma te ev helbest ji hinekên din re jî xwendiyê, jê dipirsin. Min ji jina xwe re û ji Anna Achmatova re xwendiyê, dibêje. (Anna Achmatova helbestvaneke Rûsan ya ya wê demê ye. Di nav salên 1888-1966-an de jiyaye. Pirtûka xwe ya yekem 1912-an çap kiriye. 1965-an Universita Oxfordê, Doctor Honoris Causa (doktoriya şerefê) da wê û Pablo Nerûda. Yek ji wan helbestvanên Rûsan ku her demê pirr hatiye xwendin e. S. D.)

Li gora protokolê, Mendelstam xwe sêdar qebûl kiriye û îmze kiriye ku protokol rast e û ku dijî şoreşê ye. Piştî sê rojan dema jina wî diçe wî dibîne, dibîne ku zenda wî bi birîn e, di wan sê rajan de xwestiyê xwe bikuje.

Wê carê, sê sal cezayê nefîkirinê didin Mendelstam. Dê Mendelstam sê salan li gundekî Ural bi navê Şerdîn bijiya. Li gora sêdar ku di protokolê de hatine nivîsîn, cezakî pirr sivik e. Mendelstam li wir jî xwestibû xwe di pacê re biavêje û xwe bikuje. Wê çaxê, hezîrana 1934-an cezayê wî yê nefîkirinê radikin, lê mercê ku dê nikaribe li ku û ku bijî didin ber wî. Here ciyekî ku tu dixwazî, lê ne Moskova, Leningrad, Char-kov û Kiev, jê re tê gotin. Bi vî mercî Mendelstam berdidin.

Wê çaxê Mendelstam û jina xwe diçin li Voronezjê bi cî dibin. Buhara 1937-an dema cezayê wî diqede, dîsa vedigere Moskovayê. Wan her sê salan, beşa yekem û duyemîn ya Nivîsên Voronezj û Helbestên di derheqa Stalîn de nivîsîne. Di wan helbestan de êrîşt Stalîn dike.

Sedema ku Mendelstam 1934-an bi ceza-yekî sivik xelas dibe, bi dû re derket ku birayê wî nemeyeke dirêj ji GPU re nivîsibû û karê wî hêsantir kiribû. Di warê fermî de jî nivîskarê futurîst Boris Pasternak û Buc-harîne siyasethan alîkarî pê kiribûn. (B. Pasternak hîna ji wê demê de nivîskarekî navdar bû, gotina wî kar dikir. Wek helbestvan jî tê nasîn. Berhemên wî yê navdar hene. Bi dû re romana bi navê Doktor Jîvago afirand û sala 1956-an li Îtalya çap kir. 1958-an Xelata Nobel bi Doktor Jîvago girt. Lê li Sovyetistanê rexneyên xerab li Pasternak hatin girtin. Loma jî xelat red kir. Lê di qada navneteweyî de, bû xwediye navekî û tiştên wî pirr dihatin xwendin. Lê mixabin Doktor Jîvago cara yekem 1985-an li² Sovyetistanê hat çapkirin. Tê gotin ku qedexê bû. S. D.)

Dema ku li Voronezjê bû, di nav xizaniyeke mezîn de bû. Siheta wî ne baş bibû. Ji derdora nivîskaran hatibû derkirin, kovar û rojnameyan nema nivîsên wî çap dikirin, çapxanan ew qebûl nedikirin. Tu kesan newêribû alîkariyê pê bikin. Rût û bêmedal mabû.

Li Moskovayê salekê azad dimîne. Ji rapora ku şêfê NKVD yê seksiyona 9-an ya beşa 4-an V. Yuryevîç nîsana 1938-an daye şêfên xwe tê xuyakirin ku Mendelstam ji pirr nêzik ve dihat taqîbkirin. V. Yuryevîç

dibêje: “Ji ber rewşa psîkolojiya xwe ya hilweşiyayî, Mendelstam dikare bibe mirovekî êrîşker”.

Sekreterê Yekîtiya Nivîskaran Vladîmîr Stavski û romannivîsê navdar Pyotr Pavlenko jî raporên bi vî awayî di derheqa wî de dane NKVD û şandine ji Yezov bi xwe re jî. Stavsky, di nama xwe ya ku 16-ê adara 1938-an de şandiyê ji Yezov re û (Nîkolay Îvanoviç Yezov, 1936-1938 wêzîrê NKVD ye. 1938-an tê daliqandin û Beria dikeve ciyê wî) gotiyê bi bawerîya min êdî divê mesela Mendelstam bê helkirin. Ji xwe helbestên wî jî nehêjane tişteki. Vladîmîr Stavski di derheqa ku helbestên Mendelstan bexêr in û nehêjane de, nivîseke Pavlenko jî bi nama xwe re şandiyê ji Yezov re. Tê gotin ku sedema girtina wî ya dawî jî ev rapor bi xwe ne.

Mendelstam 3-ê gulana 1938-an (dûre li ciyekî din dibêjin 30-ê nîsanê hat girtin) dîsa hat girtin. Wê çaxê rewş pirr xerabtir bibû, ne protestokirin û ne jî tikakirin alîkarî dikir. Ji xwe tu kesan nema wêribû tişteki wilo bike jî, cezayê “şaşiyekê” biçûk jî dikarîbû kuştin be. Dema ku Pasternak û Bucharîn bikaribin hinekan ji serdaban derxin, êdî çûbû. Wê wextê hew Stalîn û NKVD mabûn. Kîrov hatibû kuştin, Zînovyev, Kamenev, Rîkov, Tomskî, Bucharîn û her babet “muxalefet” nemabû. Bucharîn bi xwe rojekê berî girtina Mendelstam tê kuştin. Piraniya ronakbîran girtîbûn. 17-ê gulana 1938-an Mendelstam digirin û 5 salan cezayê kar didinê. 2-yê tebaxê, ji bo ku dûre bibin Kolymayê, pêşî dibin zindana Batûrkî. Ronakbîrên ji Moskovayê ku di wir de raneketine pirr hindik in. Berê Çar ronak-

bîr dixistin wir, dûre, piştî ku çar ket, ronakbîr dîsa ji ketin wir bi xwe. Batûrkî...

Li gora ji nama ku Mendelstam ji jina xwe re şandiyê tê famkirin, 12-ê çiriya pêşîn gihayê herêma Vladîvostokê, kampa civandinê û kar. Arşîv qala rewşa wî ya xerab, ya li wir dikin. Ji dosya wî kifş dibe ku ji hêla psîkolojîk ve, hilweşiyabû. Lêxistinê, birçîbûnê, spiyan, nexweşiyê û sermayê ew zû kuşt.

Du şahidên ku ew li wir dîtine, hebûn. Yek jê doktorê wir Miller e û yê din jî biyologekî bi navê Merkulov e. Yê doktor dibêje dema mir, ne li ser hişê xwe bû, bê kontroll çarîn ji helbestên xwe dixwendin. Yê biyolog jî dibêje rojekê min dît ku karmendên wir ji bo xwarinê li yekî hûr û nexweş dixin, min çû ew ji nav destên wan derxist. Dema ji min re gotin Mendelstam e, ne tu kesê din e, min ew bir şuşt, birînên wî pêçan û spiyên wî jê pakkirin. Mendelstam destê xwe avêtibû nanê ku ne wana dixwest bidinê, dixwazin min bi jahrê bikujin, loma min xwest ez rahijim nanekî din, ez naxwazin yê ku ew bi xwe didin min bixwim, Mendelstam got min. Nivrazî bû, nexweş û ketî bû, lê hîna zanîbû ku şekir ji bo siheta mirovan baş e, loma jî wê sermê, qapûtê xwe bi çengek şekir firotibû. Dixwest hinek şekirê din jî bi xwendina helbesta xwe ya di derheqa Stalîn de bikirê, lê tu kesan lê guhdar nedikir.

Li gora ku Merkulov dibêje, piştî ku Mendelstam miriyê, tiştên wî bi mazatê hatine firotin. Lê tişteki wî yê bikêrhatî tunebû. “Lê tişteki wî tunebû. Şevên reş, koxikeke nizm û spiyên qelew, hemû tiştên ku bi helbestvanîyê bidest xistibûn bû”

Merkulov dibêje.

Li gora dosyayê:

Mendelstam, Oşîp Emîlyevîç. Netewe: Cihû. Malbatiya wî: Kurê tucaran. Karê wî: Nivîskar û helbestvan. Nîşanên wî: Por: gewr. Çav: Kahweyî. Bêvil: Nikilî.

15-ê çileyê paşîn 1891-ê li Warşovayê çêbûye, 27-ê çileyê pêşîn 1938-an li ciyekî nêzîkî Vladîvostokê, “ji ber xwe ve miriye”.

İsaak Babel

İsaak Babel 15-ê gulana 1939-an li mala xwe ya havînî, ya li Peredelkîno, li nêzîkî Moskoyê hat girtin. Dema İsaak Babel hat girtin, NKVD dest danî ser arşîva wî. Wê çaxê, encama her babet karê wî yê nivîskarî, yên ku hîna çap nebibûn jî pê re girtin. Li gora ku tê famkirin, tişteki pirr bû. Pênc dosya destnivîs, gelek name, wêne, plan ûhw. in. Di vê derheqê de protokolek heye. Di nav tiştên ku hatin girtin de, pirtûkeke çîrokan bi navê “Çîrokên nû”, romana bi navê “Kolya Topûz”, wergerên ji Solomon Alejchem û gelek amadekariyên berhemên pêserojê hebûn. Jina wî û hevalên wî bi pîrbûna tiştên wî yên ku hatibûn girtin zanîbûn. Loma jî, dema Î. Babel sala 1954-an hat pakkirin, (İsaak Babel yek ji wan kesên ku pirr zû hat pakkirin e. Dadgehên Sovyetan, bi piranî piştî mirina Stalîn, piraniya kesên ku bi destê dewletê hatibûn kuştin, ji gunehên wana azad kirin û hat gotin ku neheqî li wana bûye. Navê vê kirinê, Rehabilitation e. Tê mana pakkirinê) jina wî, bi alîkariya hevalên wî yên ku sax mabûn û Yekîtiya Nivîskaran, arşîva wî xwest. Lê tiştê ku her carê li her deran jê re hat gotin, “tişteki nehat peydekirin” bû.

Dem a ev bersiv dihat dan, kesên ku bi bûyerê alaquadar dibûn, texmîna ku di nav nivîsên Babel de tiştên dê bikaribin siyaseta dewletê pûç derxin hene, dikirin. Hêvî dikirin ku wê demek bê, ku dê hemû tiştên wî bikaribin ji serdaban derkevin.

Dem a dem hat, gelek tişt hatin dîtin. Berhemên ji çapê re amade ji arşîvên KGB derketin. Pirtûkeke Nikolay Kluyev derket. Lê mixabin tişteki Î. Babel hîna derneketiye. Bi gumana mezin arşîva wî hatiye şewitandin. Ji ber ku arşîva rojnamevanê navdar yê wê demê Michail Koltsov hatiye şewitandin. Di vê derheqê de protokolek heye. Lê ji bo yên Babel tişteki wilo jî tuneye. Loma gera li berhemên wî, nehatiye rawestandin. Wek ku ji bo hemû nivîskarên navdar yên wê demê dibe, komîsyoneke ku li tiştên wî jî digere heye, dibe ku rojekê li ciyekî şaş, di refin xelet de derkevin.

Hêviya ku wê rojekê tiştên Babel bê dîtin, zêf e, lê dîsa jî hinek tiştên wî yên ku xelkê li ba xwe vaşartibûn, gihane destê komîsyona Babel. Ne tiştên ji çapê re amade ne, lê zaniyariyên di derheqê Babel de dewlemendtir dikin. Dem a Babel hatibû girtin, ew tişt ne li mala wî bûn, loma xelas bûne.

Babel demeke dirêj hatibû ji bîrakerin. Erê hatibû pakkirin, le ne qala wî dibû û ne jî tiştên wî dihatin xwendin û çapkirin. Lê aniha ji nû ve hatiye bira hevvelatiyên xwe. Rojname êdî him di derheqê şexsiyeta wî de û him jî di derheqê nivîskariya wî de nivîsan diweşînin. Çapxane jî, bi kêşiyên mezin tiştên wî çap dikin. Tê gotin ku Babel ji nû ve tê dinê.

Ji aniha û ne dereng, dê pirtûkeke di derheqê Babel de, ji bo giramiya wî bê çapki-



Isaak Babel di girtîgeha Lubyankayê de, 1939.

rin. Pirtûk, ji nivîsên nivîskarên biyanî yên ku di derheqa Babel de ne pêk tê. Ew nivîs berê li Rûsya qet nehatine çapkirin. Lê tiştê ku xelk dixwazin bi kêfxweşî bizanibin, ew çend mehên jiyana wî ya dawî, yên li ba NKVD li Lubyanka ne (Lubyanka, navê kuçeke li Moskovayê ye, navenda GPU, NKVD û dûre jî KGB li wir bû). Ji ber li gora ku derdikeve, xelk pê dihisin ku Babel mirovekî cuda bû, mirovekî ku jê bê hezkirin bû. Her wilo jiyana wî jî cuda bû. Jiyanê wî pirr hêl û şên bû. Hevalên wî jî li gora jiyana wî guhertî bûn û pirr bûn. Ji hemû hêlên siyasî hevalên wî hebûn. Xelk mereq dikin: gelo di serdabên Lubyanka de çi babet îşkence bi wî mirovê wilo xweş bûne?

Dema jina Nikolay Yezov hat girtin û ew bi xwe jî li ser girtinê bû, hevalên Babel zanîbûn ku rojên wî jî hindik mane. Nikolay

Yezov Wezîrê karên navxweyî û (wê demê ji wezîran re Komîsêrê gel dihat gotin) şêfê NKVD yê mezin, ew bi xwe bû. Jina wî ya rojnamevan Yevgeniya Chayutina ku jê re, piştî navê mêrê wê yê kevn, Gladûn jî tê gotin, çiriya paşîn 1938-an bi terorîstî hat tawanbarkirin û girtin. Girtina wê, dida xuyakirin ku Yezov bi xwe jî li ber girtinê ye. Wî bi xwe jî di vê yekê derxistibû, lê her tişt çûbûn û bibûn. Rev û vegeer ne gengaz bû. Di dema wî de gellek kuştin bibûn û ji wan kuştinan re peydakirina sûcdarekî pêwîst bû.

Y. Chayutina û Babel herdû ji Odesayê bûn. Hevdû ji lîse nas dikirin. Pêwendiyên wan yên wê demê, li Moskovayê jî dom dikirin û xuyaye ku ne platonîk bûn. Tiştê ku derdikeve, pêwendiyên wan yên seksuel hîna ji dema lîse de hebûn. Dibe ku Yezov jî bi vê yekê zanibû, lê ewraqên ku eşkere bûne, tiştêkî wilo nadin destan. Dostaniya wana pirr bû û Yezov piştgirî dida Babel. Y. Chayutina, rojnamevaneke zîrek bû, şêfa kovara populer ya bi navê USSR in Construction bû. Babel kiribû nivîskarê wê û bi wî awayî deriyên li pêşiya wî vekiribûn û kişandibû nav derdora xwe. Êdî deriyê mala wana jî ji Babel re vebibû û beşdarî şevên wan yên şaiyê dibû. Babel mêvanên wana bi çîrokên xwe yên ji Odesayê dikanandin û şev xweştir dikirin. Babel dikaribû bi saetan çîrokên henekan bêje û guhdarên xwe bikenîne. Hinek ji wan çîrokan, wî bi xwe li hevdu tanîn û hinek jî rast bûn. Derdora malbata Yezov ku bi piranî polis û mîlîs bûn, bi beşdarbûna xwe ya di şeveke Babel de, kêfxweş dibûn. Loma jî gellek şevên wilo dihatin lidarxistin. Di nav

yên ku ew şevên wana digêrandin de, artîstê navdar Solomon Michoels û hunermendê musîka Jazz yê navdar Leonid Ustionov jî hebûn.

Gelo tiştê ku Babel kişandibû nav wê derdorê hew "spehîbûna ji rojê" bû. Yê ku Chayutîna nas dikirin, ji bo wê wilo digotin; pirr spehî bû. Ya jî, gelo Babel li ser romanekê dixebitî û dê bûyerên derdora wana jê re bibûna materialê bingeh? Ev ne kifş e.

Lê rewş xerab bû, baweriyên di derheqa mirovan de zû dihatin guhertin. Tu kesan nizanîbû bê wê kengî kî wek xaîn bê eşkerekirin. Tu kesan bîra ku wê rojekê Chayutîna wek xaîn û terorîst bê girtin, nedibir. Tu kesan bîra ku wê rojekê Yezov bi xaîntî bê tawanbarkirin û girtin nedibir.

Di dosya Babel de tê nivîsandin ku jina Yezovê xaîn Chayutîna ew kişandiyê nav karên terorîstî yê dijî rejîma Sovyetan. Sempatiya Babel bi xwe jî ji karên wilo re heye, aniha van karên xwe bi awayekî organîzekirî dikin û hedefa wana serokatiya partiya Bolşevîk û yê dewleta Sovyetan e.

Yevgeniya Chayutîna, bi awayekî bêşik wek terorîst hat îlankirin. Bi dû re jî hat kuştin. Li gora eşkerekirinên fermî, wê xwe bi dermanan kuşt. Lê tê zanîn ku berî mirina wê bi çend rojan, ew rakiribûn nexweşxaneyekê ji bo personalên Kremlîn. Doktorên ji Lubyanka lê dinerîn.

Chayutîna ji wir kaxetek gihandiyê Yezov. Dibêje: "Kolya` yê min, ez di derheqa hemû tiştan de bêguneh im, dikarin li hemû tiştan bikolin..." (Kolya, di zimanê Rûsî de kinaya navê Nikolay e). Lê Kolya bi xwe bêçare bibû, ew jî li bendî girtin û kuş-

tina xwe bû. Zanîbû ku êdî dora wî bi xwe ye. Lê li gora ku aniha derdikeve, wî bi xwe emrê ku jahrê bidin Chayutina derxistibû. Jê re hatibû gotin ku divê wilo bike. Hêvî dikir ku wê ew kirin wî xelas bike. Lê bi dû re, dema Yezov bi xwe hatiye girtin û derxistine pêşberî dadgehê, yek ji sûcên wî, kuştina Chayutina bû.

Li gora ku ji dosya Babel tê famkirin, divabû Babel û yê wek wî hemû zûtir bihatina girtin û kuştin. NKVD, pirr zûtir di derheqa Babel de agahdarî didan hevdu. Di rûpelê 125-an yê dosya Babel de, yek ji helbestvan û lêkolînerê zimên yê wê demê Borîs Kuşner, di derheqa Babel de wilo gotiye: "Divê ez bêjim ku Babel hevlekî nêzik yê Jakov Ochotnikovê Troçkîst e û bi havdû re di nav amadekariyên karên terorîstî yê li dijî kadroyên partiyê û Leşkerê Sor de ne." Ochotnikov, alîkarê serokleşkerê Leşkerê Sor Îona Jakîr bû û bi rastî dostê Babel bû. Jakîr, di şerê nav xwe de wek generalekî sor yê serketî nav dabû, lê bi dû re ew jî bi xaîntî hatibû tawanbarkirin û 1937-an hatibû kuştin. Ne Ochotnikov tenê dostê Babel bû, Dîmîtrî Schimîdt jî dostê wî bû. D. Schimîdt, serokleşkerê yekîna mekanîze ya giran bû. Paşê Schmidt û Ochotnikov herdu jî hatin kuştin.

Lê dîsa jî Babel mabû heta 15 gulana 1939-an. Texmîna ku Yezov bi xwe ew diparast tê kirin. Lê bi dû re herdu bûn rêwiye rêyekê. Babel 27 Çileyê paşîn 1940 hat kuştin û Yezov jî hefteyekê piştî wî.

Mixabin di îfadegirtina polîsên Sovyetan de, îşkence bi awayekî berfireh dihat xebitandin. Ev yek ji bîranînên jina Bucharîn jî tê famkirin. Tiştê ku xuya dibe, bi îşkencê

organîzasyona ku xwedêgiravî Babel endamê wê bû û pê dihat tawanbarkirin, pê qebûlkirin dabûn. Loma jî Babel navê Îlya Ehrenburg wek serokê organîzasyonê dide. Babel ne navê Ehrenburg tenê dabû. Babel jî nav nivîskarên navdar yên wê demê, navê Alexey Tolstoy, Leonid Leonov, Valentin Katayev, Yurî Oleşa, Vsevolod İvanov, Konstantin Fedin, Lidiya Seyfulina, Vladimîr Lidin, jî nav rejîsoran Sergey Eisenstein û jî artîstan Solomon Michoels û muzisyen Leonid Ūstionov daye. Dûre, navê helbestvanan Semyon Kirsanov, Michail Golodnij, Michail Svetlov, artist Erast Garin û mûzîsyen Dîmîtrî Şostakovîç û Vasarion Şebalin jî lê zêde kirine. Dema îfada Babel ya duyemîn digirin, li gora gotinên wî yên ku li dosya wî zêde dikin, bi Babelê Troçkîst û xain re, Borîs Pilnyak, Andrey Belîş, Nikolay Klyûyev, Pavel Vasilyev û hinek nivîskarên din yên wek wana hene. Lê ev yek jî bo wan kesan ne bûye sedema girtinê û kuştinê. Ew emrê ku van rewşenbîran jî bibin ber dîwarên Kremlîn û bidin ber gullan ji devera bilind derneketiye. Wîlo ye, dîrok dide xuyakirin ku carinan serokên xeraban jî wana bi xwe mirovtir û dilovantir in, ya jî hew biaqiltir in, loma naxwazin bi qasî wana xerabiyên bikin. Personalê NKVD dixwest ku wana hemûyan bikujin, lê Stalîn emrê dawî dernexist. Stalîn tê derdixist ku mirovên wî dikarin raporên bi derewan jî bidinê û tê derdixist ku parastina kuştina hemû ronakbîran ne karekî hesan e. Divabû hinek bikaribin bimînin. Dema navê Ehrenburg û Alexey Tolstoy dikeve nav xainan, neçîra bi dî rewşenbîran de sist dibe.

Di nav nivîskarên ku wê demê hatin girtin û kuştin de, bûyera Babel bi xwe xwediyê taybetiyekê ye. Personalê NKVD di dosya wî de, romana wî ya bi navê Budyonniş Leşkerê Suwarî yê Sor, ji hêla edebî ve rexne kiriye. Bi piştigiriya encama ku jî berhema wî derxistibûn, dixwestin xaîntiya wî bipeyitînin. Roman di derheqa şerê nav xwe de ye. Babel dixwaze zulma ku di şer de bûye derxe. Babel dinivîse ku milîsan jî zulm kiriye.

Vladimîr Mayakovskî

Dema dosyayên nivîskaran hatin eşkerekirin, jî nav helbestvanên wê demê yên navdar, sala 1989-an dosya Anna Achmatova, 1990-î ya Borîs Pasternak, 1991-ê ya Osîp Mendelstam û Marina Tsvetayeva hatin eşkerekirin. Dema sal bû 1993, êdî dor hatibû dosya Vladimîr Mayakovskî.

Van salên dawiyê li Welatê Sovyetan, pîrozkirina çêbûna sedsaliya navdaran, bibû tiştê ku pirr li ser hevdu dibû. 1993-an sedsaliya çêbûna Mayakovskî bû. Her salê, ya jî her ji deh salan salvegera çêbûna wî dihat pîrozkirin û bala Rûsan dîsa dikişandin ser Mayakovskî.

Ev wek qanûnê bû. Lê her çar helbestvanên din, bizanabûn ji bîrakirin didan, qet qala wana nedihat kirin. Lê piştî ku sistema Sovyetan hilweşiya, rewş hat guhertin û berovajî bû. Yê din, êdî berhemên wana bi çapên hejmar pirr tên çapkirin, di şema dibistanan de hene û tên xwendin. Lê Mayakovskî ne tê çapkirin, ne tê xwendin û ji şema dibistanan jî hatiye derxistin.

Ev rewş dikare bi gelek awayan bê tercu-

mekirin, lê encama tercumeyan çî dibe bila bibe, rastiyeke ku naye guhertin heye: wî û hevalên xwe yên ku berê neheqî li wana hatibûn kirin û hatibûn qedexekirin, îro cî bi hevdû guhertine. Hêla rastiye ya din, ku hevalên wî hatibûn qedexekirin, dewletê dikir ku bên ji bîrakirin, lê xwendevanan ji wana hez dikirin. Bi vê yekê, rewşa Mayakovskî jî derdikeve: xwendevanan ji dil jê nefret dikirin.

Ne ecêb e, tê gotin ku, ji ber ku demeke dirêj wek helbestvanê Rûsan yê serek hatibû danasîn, êdî xelk jê têr bûne. Lê ji bo ku wilo bibe, bêguman gelek sedemên din hene. Lê di nav hemû sedeman de duduyên bingehîn hene: piraniya Rûsan, Mayakovskî ne xwendine. Xelk li welatê wî, bi wî awayê ku em wî nas dikin, wî nas nakin. Em dizanin ku hunermendiya wî ne hew pesinandina Lenîn û GPU ye, helbestên wî yên din û xweş hene û me xwendine. Lê mixabin ew helbestên wî yên bedew, bi awayekî ku bikaribin bigihin xwendevanan, tu caran li ser hevdû nehatine çapkirin. Di berhemên wî yên civandî de hene, lê ew jî pîrr peyde nabin. Ji bo ku xelk bikaribin wî nas bikin, biyografiyeke wî ya baş jî nehatiye derxistin.

Bêguman tu kes ji helbestvanekî wilo hez nake. Rewşa wî ya anîha, heqê wî ye tê gotin. GPU bi milyonan mirov ji me kuştin, wî jî helbestên pesinandinê ji bo GPU lêdikirin. (Mayakovskî, ji mirovan hez dikir, kuştin û tadarî di dinya ku wî xeyal dikir de tunebûn. Mayakovskî ji îdara polîsan hez nedikir. Lê Mayakovskî lawê bindestan bû, helbestvanê çîna xwe bû, ji bo parastina berjewendiyên çîna xwe şerkerekî serek û

hunermendekî siyasetvan bû, şer eşkere dikir û ji ber vê jî, pîrr dijmin ji xwe re çêkiribûn. Mayakovskî, di siyasetê de `rasto` bû. Lêkolîner dibêjin ku siyasetvaniya wî "bi ehmeqî" bû. Dijminên wî yên îro jî, ji ber şerê wî yê wê çaxê ne, dibêjin. Lê Mayakovskî, GPU, hîna dema li hember serdestan wek hêza parastina desthilata bindestan ava bûye pesinandiye. Texmîn nedikir ku dê rojekê bikaribe bibe hêzeke terorîst. Dûre jî, dema GPU ji rêya xwe derketiye, ewî bi xwe, bi cesaret li hember GPU şer kiriye. Wê demê, ji ber wan kirinên xwe, sergirtî bi destên partiyê ji civatê hatibû afarozkirin û di bin raçaviya GPU de bû. Lê Rûs dîsa jî wî wek piştgirê kirinên wan dizanin û lingê xwe lêdixin. Bi gotineke din, Mayakovskî, him ji dêrê bû û him jî ji mizgeftê. Ev neheqî ye, lê neheqiyên wilo ne li Mayakovskî tenê dibin. Dema nivîskarên navdar xwe bi wî awayî tev li siyasetê dikin, bi gotina B. Jangfeldt, xelk bi dût re serê wana bi mekînên ko gurûzî dikin S.D)

Rûs Mayakovskî baş nasnakin. Dema wext bibû 1930 û giha xwe bikuje, ji bo eşkerekirina jiyana wî ya bi rastî, ji xwe dereng bû. Eşkerekirina gelek hêlên jiyana wî him nema gengaz bû û him jî qedexe bû. Piraniya hevalên wî êdî ne sax bûn. Li gora baweriya fermî, ji xwe hemû bûrjûva bûn, di bin rûpelên dîrokê de wendabûna wana ne xem bû û tişteki ku dê bikaribûna ji bo Mayakovskî bêjin, tunebû. Piraniya wana hatibûn kuştin ya jî reviyabûn. Hemû kesên ku ne Bolşevîk bûn, wek dijmin hatibûn danasîn. Mayakovskî bi xwe jî ne bolşevîk bû. Ma heger mirov komunîst be mi-

rov çawa dikare xwe bikuje? Ne sedemên mirov yê siyasî dikarin hebin û ne jî yê şexsî. Hew bi nebaşî qala wî û yê din dibû.

Jina wî ya kevn, lê hevala wî ya her demê Lîlî Brîk bi vê rewşê diêşe. Radibe nameyekê ji Stalîn re rêdike. Sal 1935 e. Lîlî di nameya xwe de ji Stalîn daxwaz dike ku Mayakovskî derxin ciyê ku bi hunermendiya xwe û xebata xwe ya siyasî heq kiriye, tika kiriye ku berhemên wî bînin çapkirin. Wê wextê berhemên Mayakovskî yê civandî dihatin çapkirin, lê burokratan ew kar sabote dikirin.

Dema Stalîn name girtiye, dawê şandiyê ber destê Komisêrê gel, Nikolay Yezov. Di emrê ku daye Yezov de, Mayakovskî "helbestvanê me yê hêja ye, ...helbestvanê me yê baştirîn e" gotiye. Piştî çend rojan bûyer di hemû rojnaman de bi wî awayî çap bû û Mayakovskî bû serek helbestvanê welatê Sovyetan. Piştî wê, êdî Mayakovskî li hemû deveran hebû û xuya dikir, li dibistanan dihat xwendin û navê wî li febrîqan, li keştiyan, li dibistanan, li kolan û li meydana kirin. Jê re biografiyêke nû ji nivisandin û Mayakovskî bi zorê kirin stûyê xelkê. Bi vî awayî, Mayakovskî bû xwediyê mirina xwe ya duyem. Ji hevalên wî, Pasternak bi vê yekê êşiya ye, lê nikaribû tiştekî zêde bike. Bi Glasnost re, hemû tiştên ku hîna bi emrê Stalîn ji bo Mayakovskî hatibûn avakirin, bi carekê re hilweşiyên. Êdî ne tê çapkirin û ne jî tê xwendin. Ev jî bû mirina wî ya sêyem. Anîha li Rûsya, ji nav helbestvanên wê demê, Osîp Mendelstam helbestvanê ku tê xwendin e.

Lê dîsa jî yê ku dixwazin rastiya jiyana

Mayakovskî derxin hene. Di rojnaman de nivîsên di derheqê jiyana wî de carinan derdikevin. Ji ber ku Rûs vê hêla wî pîr hindikî dizanin, loma jî tîna xwendin. Yek ji wan tiştên ku Rûs baş nizanin ku gelek pîrek ketine jiyana Mayakovskî ye. Nû pê dihisin. Çima ev hêla wî ji me hatiye veşartin dibêjin.

Dema jineke şêst salî bi navê Patricia Jelena Thompson (bi serbilindî navê Jelena Vladîmîrovna li xwe dike) ji Emerîkayê derket û got ez keça Mayakovskî me, bala xelkê dîsa çû ser Mayakovskî. 1925-an çûbû Emerîkayê. Wê çaxê li New Yorkê pêwendiyên wî bi jineke bi eslê xwe Rûs, bi Elly Jones re çêdibin. Elly Jones dûre ji Patricia Jelena re gotiye ku ji wan pêwendiyên e, bavê wê Mayakovskiyê helbestvanê Rûsan e. Tê gotin ku Mayakovskî bi xwe jî zanibû ku keçeke wî çêbûye û navê wê Patricia Jelena ye. Di vê derheqê de name ji Elly Jones girtine. Dema B. Jangfeldt ji bo lêkolînan çûye Lîlî Brîk diye, ew name di arşîva wê de dîtine.

B. Jangfeldt dûre çûye Patricia Jelena Thompson li New Yorkê dîtîye. Li gora agahdariyên ku wê ji dêya xwe girtibûn, piştî ku Mayakovskî dimire, ditirse ku vê yekê êşkere bike. Bi dût re dema Troçkî li Meksîka tê kuştin, tîrsa Elly ya ji kuştinê mezintir dibe û qet deng ji xwe dernaxe. Mayakovskî li Sovyetistanê egî û serek helbestvan bû. Li gora hesabê Elly, êşkerekirina tiştekî wilo, ji bo Sovyetistanê kêmasiyek bû û ji bo wê bi xwe jî xeterek bû. Loma ev yek her veşartî maye. Lê piştî ku desthilata Sovyetan sist bû, êdî xeter rabû. Jelena Thompson bi xwe derket û xwe eş-



Heta niha nezelalîyek di mirina Gorkî û di xwekuştina Mayakovskî de jî heye

kere kir. Çend caran çû ser dan gora Mayakovskî, axa ji ser gora dêya xwe tanî û bi ser gora wî dadikir. Mayakovskî bavê min e got. Rûs ecêbmayî man. Çima heta aniha ji me dihat veşartin ku keçeke Mayakovskî heye? Madem ku keçeke wî hebû û ji me dihat veşartin, em ê çima ji hemû tiştên din yê ku di derheqa wî de hatine gotin bawer bikin?

Loma jî pîrseke din derket: Gelo bi rastî wî xwe kuştîye? Bi hezaran mirov hatin kuştin, belkî Mayakovskî jî hatibê kuştin. Piraniya nivîskarên wê demê hatin kuştin, çima nabe ku ew jî hatibe kuştin? Dema derdikeve ku Yesenîn û Gorkî dikarin hati-

bin kuştin, çima nabe ku ew jî hatibe kuştin? Li gora tiştên ku hene û yê ku dîre derdikevin, sedemên ku Mayakovskî hatibe kuştin, ne ku tunebûn. Tê gotin ku ev şik berê jî hebûn.

Mayakovskî helbestvanekî navdar yê welatê Sovyetan bû, lê êdî sist bibû. Di şano û helbestên ku wan salên dawiyê dinivîsîn de, rexneyên rûj dibirin ser burokrasiyê û kirinên rojane. Li gora wî, tişteki zêde ji bo bindestan nehatibû guhertin û hêvî xeter xuyabû. Ji xwe dijminatî bi mîlîsan û GPU re dikir. Didît ku lê raçav dibin. Li gora ku tê gotin, çend caran li wana vegeyriyaye û bi wan pêvçûye. Gotinên giran ji bo wan û

şêfê wan Jagoda digotin. Êdî nema kifş bû bê Mayakovskî, “dê îcar çi bike”. Ji jineke li Parîs hez dikir. Penabereke Rûs bû, ji ber şoreşê reviyabû. Navê wê Tatiana bû. Tatiana, a ku di bejna wî de bû, wek wî dirêj bû. Di helbesta ku ji bo wê nivîsîbû de wilo digot. Mayakovskî bi hesanî dikerîbû here Parîs ya jî New Yorkê û qet nema vegere. Wê vê kirinê, ji bo propagada li dijî welatê Sovyetan, hesaniyeke mezin bida dijminan. Loma dibe ku hatibe kuştin, dibêjin.

Rojnamevanên ku ketine dû derxistina vê bûyerê hene. Di dosya wî de tiştên ku li hevdu nekin hene, lê hîna tişteki ku bawerîya din, ya ku wî xwe kuştîye pûç bike û em bikaribin bawer bikin ku hatiye kuştin, derneketîye.

Du tiştên nû hene. A yekemîn, li gora protokola polîsan, Mayakovskî bi gullakî ku ji demançeke Browning derketîye hatiye kuştin, lê demança ku ketîye dawê û hatiye hilanîn, yeke Mauser e. A duyemîn, ku hestiyê bêvila Mayakovskî li erdê ketiyê û şkestîye. Ev yek jî dide xuyakirin ku bi pêş de ketîye, tê gotin. Lê li gora tecrubeyên tibbî, hemû mirovên ku xwe dikujin, bi paş de dikevin.

Balkêş e, lê ne gelek mirov dikarin ji ber van herdû tiştan tenê bawer bikin ku Mayakovskî bi destê GPU hatiye kuştin. Karên ku di vî warî de dibin, hîna berdewam in.

Lê ji dosya wî derdikeve ku GPU bi dû wî de bû. Sûreteki ji evîndariya wî ya li Parîs di dosyayê de heye. Ew çawa ketîye wir? Bersîveke fermî ji bo vê pîrsê tune. Ra-

porên muxbiran, piştî mirina wî jî hatine ji GPU re hene.

Marina Tsvetayeva

1892 çêbûye. Di biçûkaniya xwe de dest bi helbestan kirîye. Demekê li hember şoreşê helwest girtiye, lê miroveke bi bawerîya xwe lîberal bû. Û dihat zanîn ku 31 tebaxa 1941-ê xwe kuştîye.

Marina, 1922-yan bardike Parîs. 1939-an dişa vedigere welatê xwe. Lê demeke dirêj tu berhem çap nekiribûn. Tê gotin ku li Parîs jî ne azad bû, NKVD li wir jî bi dû de bû, loma tişteke çap nekirîye. Lê dema arşîv eşkere bûn, hinek tiştên wê, ji wir derketin. Ev yek, wê teoriyê rast derdixe. Dûre hinek nivîsên wê li ba malbateke Belçîkî derketin. Bi piranî nameyên ku ji helbestvan Anatolî Steiger re rêkiribûn in. Steiger, evîndarê wê ye dawî bû. Ew nivîs çawa çûne ba wê malbata Belçîkî, ew nehatiye nivîsîn. Malbat bi xwe çû Moskova û ew nivîs teslîmî komîsyona ji bo lêkolînên di derheqê wê kirin.

Aniha komîteyêke ji lêkolîneran ji bo wê ava bûye, ew komîte bi taybetî li tiştên wê digerin. Komîteyêke wilo ji bo Anna Achmatova jî ava bûye. Lê tiştê balkêş ew e ku lêkolînerên ji bo berhemên Anna Achmatova peyde bikin, bi piranî zilam in, lê yên ku li tiştên Marina Tsvetayeva dikolin, hemû pîrek in. Xuyaye ev taybetî, ji ber êşa ku Marina wek pîrek jî kişandîye tê.

Mêrê wê Sergey Efron û keça wê Ariadna, li Parîs dikevin nav NKVD û tîna Sovyetistanê. Herdû ketine nav bûyerên bixwîn û tawanbar. Lê Sergey bi xwe pîr ketîye nav bûyerên bi kuştin. Bi dû re, herdu

bi xwe jî tèn girtin û kuştin. Marina nizanîbû ku mêrê wê û keça wê ji NKVD ne. Lê hinek dibêjin ku pê zanîbû. Lê tiştêkî ku dide xuyakirin ku pê zanîbû, tune. Hevalên wê jî dibêjin ku nizanîbû. Lê zanîbû ku "karên Sovyeti" dikin. Dema mêrê wê û keça wê girtî bûn, nameyeke wê di derheqa wana de çûye ji Beriya re. Di wê namê de dide xuyakirin ku dizanê mêrê wê û keça wê di nav "karên Sovyeti" de ne, loma jî tika ku wana nekujin ji Beriya dike. Lê peyva "karên Sovyeti" di derheqa karê mêrê wê û keça wê de, ne eseh e ku dizanîbû tev kuştinan dibin yan na.

Marina demeke baş li Parîs dimîne û bi dûre vedigere. Piştî ku vedigere Sovyetistanê ne bi gelekî, NKVD wê radike Tataristanê û li bajarekî biçûk li kêleka Volga bi cî dike. Li gora ku ji dosya wê tê famkirin, 30-ê tebaxa 1941-ê, serokê NKVD yê wî bajarê biçûk, gazî wê dike. Roja din jî Marina xwe dakuje.

Wî kesî çî jê re gotiye, dikaribû çî bêje, ne kifş e. Gelo Marina ji ber tiştên ku wî jê re gotibûn xwe kuştîye, ew jî ne kifş e. Çima Marîna piştî wê çûna ba NKVD wilo bi ecele xwe kuşt, ne kifş e. Çima Marina alîkari ji Nikolay Aseyev ne xwestiye, ne kifş e. Aseyev, yek ji wan helbestvanê futurîst yên ku hevalên Mayakovskî bûn bû, dostaniya wî û Marina û Pasternak hebû. Marina jî giramiyeke bilind dîda Mayakovskî û helbest ji bo wî nivîsîne.

Maksîm Gorkî

Dilê Rûsan, ji zû de ye ji Gorkî sar bûye. Him di derheqa nivîskariya wî de û him jî

di derheqa rola wî ya civatî de jê sar in. Tiştê ku Rûsan di derheqa wî de bihîstine û dizanin, ku Gorkî "bilbil û hozanê şoreşê" bû, "avakarê realîzma sosyalîst" bû, "nivîskarê romana proleter ya yekemîn" bû. Hevalê Lenin û Stalîn yê şexsî bû. Û gotineke wî jî di hişê xelkê de mabû: "heger dijmin teslîm nebe, divê bê qelandin". Tiştê ku ji vî dihat dexistin ku Gorkî piştgiriya wê terora mezin kiriye. Loma jî pirr xwendevanên wî tune bûn. Çend helbestên wî di şema dibistanan de hebûn, lê nedihatî xwendin, ji ber ku bi zorê bû, xwendevanan hew çavên xwe lê digerlandin di ser re derbas dibûn.

Li gora ku tê gotin, hinekan ji ber meraqdariya lîteraturî ew dixwendin, dixwestin hinek tiştan di derheqa wî de bizanibin, lê ew kes pirr hindik bûn. Dema bi nav agahdariyên di derheqa Gorkî de dadiketin, wê çaxê tê derdixistin ku Rûs hindik tiştan di derheqa wî de dizanin û gelek tiştên ku di derheqa wî de hatine veşartin hene. Bi taybetî, di derheqa jiyana wî ya piştî ku ji Ewrûpa vegeyriyaye de, tiştêkî bi xêr li ber destan tunebû.

Piştî ku arşîv vebûn, tu berhemên ku bikaribin Gorkî dîsa bigihînin destên xwendevanan, derneketin. Lê di derheqa rola wî ya civatî de tiştên balkêş derketin. Li gora ku ji arşîvan derdikeve, ji bo ku Gorkî bikaribe berê desthilata Sovyetan ji ser xeterê û terorê biguhere, pirr tişt kirine. Lê dosya wî hemû nehatiye eşkerekirin. Loma jî mixabin em hîna jî gelek tiştan di derheqa Gorkî de nizanin.

Dema dosya Gorkî hat eşkerekirin, li gora alenîkirina fermî, dosya hemû nehatibû

eşkerekirin. Hew beşê ku şexsî bû hatibû eşkerekirin. 300 rûpel di derheqa wî de nehatibûn eşkerekirin. Gelo çi di wan rûpelan de hebû? Gelo li gora kîjan pîvanê tiştên şexsî hatibûn hilbijartin? Gelo yên ku mabûn çiqasî ne şexsî bûn? Em bersiva van pirsan nizanin. Lê tê zanîn ku 46 nameyên ku Gorkî ji Stalîn re rêkiribûn di dosyayê de hebûn. Lê hejmara bersivên wan naman ne kifş e.

Gorkî di civatê de xwediyê roleke bilind bû. Pêwendiyên wî bi gelek siyasetvanên navdar re hebûn û ew ji nêzik ve nas dikirin. Wê çaxê gellek name ji Molotov re, ji Kaganoviç re, ji Kalînin re, ji Andreyev re, ji Zdanov re, ji Ordzonkîdze re û ji kesên ku wek "xaîn" hatibûn binavkirin re: Zinovyyev, Kamenev, Rîkov, Bucharîn, Yezov û Postîşev re jî şandibûn. Hindik ji van naman hatin eşkerekirin. Pêwendiyên Gorkî, hîna ji salên 1920-an de bi gelekên ji wana re hebûn.

Tiştên ku hatine eşkerekirin, didin xuyakirin ku Gorkî him ji Stalîn piştîk û bi tirs bû û him jî dixwest lîteratura Sovyetî bi alîkariya wî îdare bike. Bi alîkariya wî dixwest ku yekîtiya nivîskaran bike xwediyê desthilatekê, bike wek wezaretekê û ew bi xwe jî ji jor îdare bike. Ev li hesabê Stalîn jî dihat. Dema pêşengiya karekî wilo bike, ew jî dibû "serokê lîteraturê yê bilind".

Ev kar kirin, dezgeheke wilo ava kirin. Îcar Gorkî, ji wir name rêdikirin ji Stalîn re. Komîsêrên bilind ku heq ji karên xwe dernediketin û nivîskarên ku nav û dengê ne bi heqî bi xwe xistibûn, ji wir eşkere dikirin. Ew Komîsêr, Pavel Yûdîn û Lev Mechlîs bûn. Gorkî ji bo wana dibêje "mi-

rovên nezan û tirsonek". Ji bo ku bikaribin xwe veşêrin, xwe dixin pişt mirovên wek Fyodor Panfyorov, Aleksandr Fadeyev, Vsevolod Vişnevskî, Vladîmîr Yermilov û Vladîmîr Stavskî ku îcar ew, "ji wana bi xwe nezantir û tirsonektir in. Ez naxwazim paşgotiniya wana bikim, lê ez wana ji nêzik ve nas dikim û di derheqa her awayê wana de xwediyê baweriyê bêsîk im ku qet bikêr nayên. Loma jî ez red dikim ku bi wana re kar bikim..."

Gorkî di derheqa rewşa welêt û partiyê de jî name ji Stalîn re rêdikirin. Di derheqa girtina rêya xeterê de baweriyên xwe dinivîsîn. Şaşî destnîşan dikirin û jê dixwest ku rawestîne. Li vir rêya herdûyan ji hevdû ve-diqetiya.

Ji arşîvan tê famkirin ku Stalîn ji sala 1934-an pê ve, xwestiye ku Gorkî bêkêr bike û tenê bihêle. Ew baweriyê wî ku wê Gorkî bibe heyranekî wî û jiyana wî dûrêzî hevdû bike, pûç derketibû. Loma jî Gorkî hew wek serokê yekîtiya nivîskaran yê dekoratîv bû. Stalîn, êdî karên xwe yên di wî warî de bi yên din dikirin.

Ji dosyayê derket ku Gorkî di derheqa Stalîn de nivîsiye: "Jozef Çûgaşvîlî li Gurbis..." gotiye û nivîsandina xwe ya di vê derheqê de qedandiye. Ji vê derdikeve bê Gorkî çiqasî ji Stalîn sar û bêhevî bibû.

Stalîn û Gorkî, piştî vê dema sar jî name ji hevdû re şandine. Lê di wan naman de tu dostanî êdî nema xuya dike. Nameyên sar û fermî ne. Nama dawî, 1-ê gulana 1936-an, berî mirina wî bi meh û nîvekê ye. Gorkî di nama xwe de ronakbîrên ku bibûn hedefa NKVD diparêze û ji Stalîn daxwaz dike ku bela xwe rewşenbîran veke,

tiştên êrîşker ku di vê derheqê de di Pravda de çap dibûn, rawestine. Gorkî, di nav wan mirovên ku Pravda taqîbat bi dû wana de dikir de, Dîmîtrî Şostakovîç bi gotinên wek “muzîsyenê serketîtîrîn yê dema Sovyetan”, Îsaak Babel, bi gotinên wek “yek ji wan nivîskarê me yê bîaqiltîrîn” û André Malraux jî, bi gotinên wek “di nivîsandina romanên de rewşenbîrê jîrtîrîn” bi nav dike. Lê mixabin hersê jî dûrê bi terorîstî, ajantî û sabotoriyê hatin tawanbarkirin û kuştin. Gorkî di wê nama xwe de şanovanan Meyerhold û Tairov jî, bi gotinên “mîrovên dahî” binav dike û li wana xwedî derdikeve, lê herdu jî ji lepên NKVD xelas nebûn. Meyerhold hat kuştin û Tairov jî heta mirinê hat îzole kirin.

Gorkî û Stalîn di derheqa kesan û bûyerande, ji hevdû cuda diramiyan. Lê Gorkî bawer dikir ku dikare tesîrê li Stalîn bike û rewşê baştir bike. Ji ber ku bi daxwaza wî Bucharîn bibû redaktorê Îzvestiya û Kamenev jî bibû dîrektorê çapxana Akademiya, di vê derheqê de baweriyeke wî hebû. Dîsa bi xwestina wî bû, Bucharîn û Radek wek gotarvanên serek yê Yekîtiya Nivîskaran hatibûn destnîşankirin. Loma jî bawer dikir ku dikare alîkariya baştirkirina rewşê bike û dostaniya xwe bi Stalîn re didomand. Lê dûre tê derdixe ku bêxêr e.

Gorkî, hîna berî salên 1934-an bi vê yekê hisiyaye. Nameke wî ya ji Kîrov re, (Sergey Mîronovîç Kîrov sekreterê partiyê yê Leningrad bû. Kîrov yek ji wan kesên ku bi cesaret siyaseta Stalîn red dikir bû. 1-ê çileyê pêşîn 1934-an hat kuştin. Stalîn, kuştina Kîrov kir stûyê her babet muhalefê û yê ku bi siyaseta wî ne bawer bûn. Stalîn kuş-

tina Kîrov kir sedema destêpêka terora wê demê ya berfireh. Hew “hevkarên” wî neketin ber. Bucharîn û Zinovyev jî bi kuştina wî hatibûn tawanbarkirin. Lê li gora Anna Larîna jina Bucharin, Kîrov û Bucharîn dostên hevdû bûn) dide xuyakirin ku dostaniyeke wana ya kûr heye.

Di encama lêkolînên ku di vê derheqê de bûne de, nîşanên ku Gorkî di nav koalîsyoneke fireh ya li hember Stalîn de bû xuya dikin. Nama Gorkî ya ku lawê wî Maxîm, sala 1934-an bidizî ji Kîrov re dibe Leningradê, vê yekê dide xuyakirin. Ne eşkere ye bê çî di wê namê de hebû, lê eşkere ye ku nameke wî heye. Kîrov di nav partiyê de xurt bû û dibe ku serokatiya muhalefê wî dikir, ya jî wî dihat zanîn. Ji xwe Kîrov piştî wê namê bi çendakî tê kuştin. Dibe ku naveroka wê name û lêkolîneke ku di derheqa pêwendiyên Gorkî û Kîrov de bê kirin, awayê mirina Gorkî jî derxe. Lê gelek tiştên di vê derheqê bi xwe de, nehatine eşkerekirin. Lê ya ku eşkere ye ku G. G. Yagoda, şefê NKVD yê duyemîn yê wê demê, bi sedema ku Gorkî û lawê wî Maxîm bikuştin dane hatiye girtin, suçdar derketiyê û bi wê sedemê hatiye kuştin.

Vsevolod Meyerhold

Vsevolod Meyerhold reformatorê mezin yê şanovaniya Rûsan e. Di vî warî de gellek karên hêja kirine, şanovaniya Rûsan bi awayekî modern, wî ji nû ve avakiriyê. Rûsan Meyerhold bi vî awayî nas dikirin, lê hindik tişt di derheqa wî de dizanîbûn. Piştî ku Meyerhold hat girtin û di girtîgehan de hat kuştin, di derheqa wî de tiştêkî berbiçav, bi nivîskî li ber destên xelkê nema

bû, ew jî hatibûn girtin. Hemû tiştên wî, di arşivên KGB de bûn û tu kesan nikaribû xwe bigihîne wana. Loma jî Meyerhold hêdî hêdî di nav xelkê de dihat ji bîrakirin. Hew hinek lêkolîneran, çend dost û hevalên wî yên ku sax mabûn û neviyên wî ew ji bîra nekiribûn. Lê bi perestroyka re, dema arşivên KGB yên di derheqa rewşenbîran de hatin eşkerekirin, tiştên wî yên hêja ketin destan.

Wê demê bûyereke balkêş jî bû: mala wî ya ku heta roja dawî lê jiya, karên xwe lê dikirin, heval û şagirtên wî lê li dora wî dicivayan -ew mala ku banûya şanovaniya Rûsan- jina wî Zinaïda Raich lê hat kuştin, wek muzeya wî hat vekirin. Ew mal li Moskovayê li kuçaya Bryusov e.

Dost û nasên wî ji zû de daxwaza tişteki wilo dikirin, lê nedibû, her bersiva neyînî digirtin. Heta ku KGB ji rê derket, ji nû ve ew mal bû muze. Karên di vê derheqê de



Meyerhold bi Babel re hate girtin. Di girtina îfadeya wî de pêji milên wî şikandin, paşê ji mîza wî pê dane vexwarin

bi nermî û bêdeng bûn.

Piştî ku Meyerhold û Zinaïda hatin kuştin, mirovên KGB çûbûn di wê de rûniştibûn. Ew mal bi wî awayî mabû ji KGB re. Lê çawa bû ku mirovên KGB bêdeng ji xênî derketin û ji bo ku bibe muze hat amadekirin! Evê bûyerê, mecala ku heval û şagirtên wî bikaribin navê wî dîsa bigihînin xelkê da wana. Îro, dixwazin dîsa wî derxin wî ciyê ku bi xebata xwe ya bêhempa heq kiribû.

Di nav tiştên ku ji arşivên KGB di derheqa Meyerhold de hatin eşkerekirin de, mirov destnivîsên wî û yên şagirtên wî jî dibîne. Ev tiştên wilo bi pirranî tiştên di çerçeva karê wî de ne. Notên wî yên ji proveyên şanoyan, munaqaşeyên wî yên bi şagirtên wî û listikvanan re ne. Ew tiştên wî yên wilo jî, tiştên yekî wek wî “dijminê desthilata gel û xaîn”, hemû di arşivan de bi pûteyî hatibûn hilanîn.

Tê gotin ku hemû tiştên wî hatine eşkerekirin. Wek yên Gorkî hinek jê veşartî nehiştine. Di vî karî de gellek keda neviya wî ya ji keça wî ya ji jina wî ya kevn Maria Valentey heyê. Derxistina tiştên di derheqa kalikê xwe yê ezîz de, ji xwe re kiribû karekî girîng. Bi saya wê, îro gellek tiştên di derheqa Meyerhold de li ber destan hene. Di nav tiştên ku hatin eşkerekirin de namayên wî, notên wî yên li ser pirtûkên cuda, hinek sûret û programa wî ya şanovaniyê hene. Ji van tiştan, pêwendiyên Meyerhold yên bi mirovên cuda re eşkere dibin.

Andrey Belîş, havîn û payîza 1931-ê, hinek name bi sedema girtina jina xwe û mêrê wê yê kevn, ji Meyerhold re şandine. A. Belîş ji serî vê piştgirê desthilata Bolşevîk

bû. Lê wek piraniya ronakbîran ew jî sist bibû. Dema jina wî hat girtin, jî bo xelaskirina wê, alîkarî ji Meyerhold xwestibû. Gellek dostên Meyerhold di dewletê de hebûn. Yek ji wana şêfekî GPU Yakov Agronov bû. Agronov li Moskovayê dostaniyeke fireh bi ronakbîran re ava kiribû. Meyerhold bi alîkariya Y. Agronov jina A. Belîş û mêtê wê yê kevn berdide. Tê gotin ku Meyerhold û hinek ronakbîrên din bi alîkariya Y. Agronov, gellek kes ji mirinê vegerandine. Lê wê çaxê hîna sal 1930 û 31 bû. Tiştên wilo gengaz bûn. Dema dor hatibû Meyerhold bi xwe, alîkariyên bi vî awayî nema dibûn û girtiyên navdar nema ji serdaban derdiketin.

1955-an dosya Meyerhold ji nû ve derxistine û xwestine nû bikin. Tiştên balkêş ji karên ku di wê derheqê de bûne û mane, jî dosya wî derketin. Karê nûkirina dosya wî dabûn SAVCIYÊ leşkerî yê ciwan Borîs Ryajskî. Dema dosya wî dixwîne, dibîne ku tawanbariyên li Meyerhold bûne, ne rast in. Li gora dosyayê, Meyerhold serokê hêzeke îspiyonan û xanînan bû û kesên girîng yê di wê hêzê de jî Borîs Pastêrnak û Yurî Oleşa bûn. Lê ew camêr nehatine girtin, di nav "xweşiyên navdariyê" de jiyane. Ev nakokiyek bû.

Borîs R. di bin tesîra xebata wî ya şanovanî ya bêhempa de maye, bawer nekiriye ku Meyerhold xain e. Peyitandina vê yekê ji xwe re kir kar. Xwe gihand neviya Meyerhold û jê xwest ku bê daxwaza jî nû ve vekirina dawê bike. Ji bo ku bikaribe kalikê wê ji tawanbariyan pak derxe, jê xwest ku agahdariyên pozîtîf ji dost û ronakbîrên ku wî nas dikirin bide ser hevdû û pêşkêş bike.

Yên ku di derheqê Meyerhold de, ji neviya wî re axivîne, jî bo pakderxistina wî piştgirî dane neviya wî, ne Borîs Pasternak û Yurî Oleşa tenê ne. Ji nav nivîskaran Îlya Ehrenburg, Nazim Hikmet, Vsevolod Ivanov, Yurî German, ji nav muzîsyenan Vladîmîr Şostakovîç, Vissarion Şebalîn Vladîmîr Sofronîtskî Lev Oborîn, ji nav rejîsorên şano û sînemê Nîkolay Oxlopkov, Michaîl Romm, Grîgorî Aleksandrov, Sergey Yutkevîç, Yurî Zavadskî, Leonîd Vivien, Sergey Obratzov Nîkolay Ekk, ji nav listikvanên şano û sînemê Erast Garîn, Aleksandra Yabloçkîna, Îgor Îlyînşskî, Michaîl Şarov, Lev Sverdîln, Maksîm Strauch, Sofia Giatsîntova, Vasili Merkuriev û Dîmîtrî Orlov piştgirî dane neviya wî. Michaîl Şaryovê ku li ba Meyerhold listikvan bû û gellek xainîti pê re kiribû jî piştgirî dabû. Van camêran hemûyan Meyerhold pesîndine. Ewraqên di vê derheqê de jî, aniha rakirine muzeya wî.

Meyerhold cara duyemîn bi jina helbestvanê navdar Sergey Yesenîn, Zinaîda Raîch re zewicîbû. Keçeke wê û S. Yesenîn bi navê Tatiana Yesenîna hebû. Ew jî li ba dêya xwe û Meyerhold dima. Bavê wê yê bi rastî 1926-an xwe kuştibû. Tatiana, Meyerhold wek bav qebûl kiribû. Dema dêya wê û Meyerhold hatin kuştin, ew jî rakirin Taşkent û heta mirina xwe -1992-an- li wir ma. Wê Tatinayê li gora mecala xwe li Taşkent agahdarî di derheqê Meyerhold de didan ser hevdû û pirtûkek di derheqê Meyerhold de çapkir.

Dema dêya wê hat kuştin, ew 21 salî bû. Şahida hemû çûn û hatin û bûyerên ku li mala wana bûne ye. Loma jî gellek agahda-

riyên giranbuha nivîsîne. Gellek rûpel dane agahdariyên di derheqa kuştina dêya xwe de û xwestiye perda derewan ji ser bûyerê rake. Li gora wê, kuştina dêya wê, yek ji hemû kuştinên siyasî ye.

Piştî ku Meyerhold hat girtin bi çend rojan, hatin Zinaîda Raich bi kêran di mala wê de kuştin. Pêşî hat eşkere kirin ku ji ber pêwendiyên xwe yê "dijî şoreşê" hatiye kuştin. Piştî wê ne bi gellekî jî, hat gotin ku hinekan xwestiye wê tazî bikin, diz û keleşan ew kuştîye. Dûre jî Vîtalî Golovîn, la-wê tenorê navdar yê Bolşoyê Dîmîtrî Golovîn ji ber kuştina wê hat girtin û sûcdar derxistin. Bavê wî jî kirin şîrikê sûcê wî. Klambêjê opera yê Bolşoy Aleksandr Baturîn kiribûn endamê jûriya dawa Golovînan. Li gora ku A. Baturîn agahdarî dabû Tatiana Yesenina, hemû tiştên ku di derheqa law û bav Golovinan de hatin gotin, çêkirî bûn, ne rast bûn. Tê gotin ku Vîtalî Golovîn heta sala 1948-an jî sax bû. Kuştina Zinaîda bi vî awayî tarî ma. Lê tiştê ku tê zanîn ku demeke kurt piştî kuştina wê, dostikeke Beriya û şifêrê wî ketine mala ku ji wana ma û tê de jiyane.

Meyerhold û Îsaak Babel di demekê de hatin girtin. Di ragirtîxanê de îşkenceyên xerab li Meyerhold jî kiribûn. Destên wî şkandibûn û mîza wî pê vexwarin dabûn. Bavê şanovaniya Rûsan bi awayekî wilo bê-rûmet kuştin û bê şop û bê nîşan veşartin. Heta berî bi demekê jî ne kifş bû bê gorra wî li ku ye. Lê aniha tê zanin bê xweliya wî li ku veşartine. Mixabin hîna tu nîşan li wir ranekirine. Lê gorra Zinaîda kifş e û navê wî ji li ser lêkirine. ■

Em ji xwendevanên xwe lêborînê dixwazin ku me ji ber nebûna cih nivîsa Mayakovsî "Mirov Çawa Helbestan Dinivîsîne" ya bi wergera Süleyman Demir hişte hejmara 16'an.

dîdar

Yekîtiya Ciwanên Kurd li Swêdê
Kurdiska Ungdomsförbundet
i Sverige

Berpirsyarê giştî / ansvarig utgivare
HUSEYN BETTÊ

Redaktor / Redaktör

(kurmancî)

ARIF ZÊREVAN

(svenska)

CECILIA ENGLUND

(kurmanciya başûr)

LOQMAN ENDIMEH

Redaksiyon / i redaktionen

Arif Zêrevan

Atiya Bettê

Birahîm Xalid

Behrûz Şucaî

Mehmûd Mirgewerî

Rojda Çeliker

Mizanpaj / Redigerare

ARIF ZÊREVAN

Abonetiya Salane / Prenumeration

Ji bo endamên YCK-ê belaş e.

Ji bo ciwanan / För unga: 120 Skr

Ji bo mezinan: 180 Skr

Ji bo dezgehên/myndigheter: 200 Skr

Ji bo welatên dî 200 Skr

Buhayê yekane 25 Skr

Navnîşan / Adress:

dîdar

Box 49082

S-100 28 Stockholm

SWEDEN

☎: 08-652 85 85 vxl

Hişê xwe pêş de bibin

Azîz Nesîn

Werger: Mustafa Aydoğan

Dedektîvê navdar Şarlok Holmes û Nat Pinkerton hefteyeke berê hatibûn Stenbûlê. Serê sibehê li wê otêla ku ew lê diman, telefonê bi dilşe-watî lêxist.

Di telefonê de dengê jinikê-kê. Jinikê bang kir û got;

- Yarê min... Yarê min... û telefon hat birrîn.

Di destekî Şarlok Holmes de telefon hebû û destê wî yê din jî li ser cênîka wî bû, piştî bi qasî saetekê fikirî, ji Nat Pinkerton re got;

- Min ya ku telefon kir, nas kir.

PIRS:

1- Ya telefon kiribû kî bû?

2- Telefon ji bo çi hat birrîn?

BERSIV:

1- Jinika di telefonê de yara Şarlok Holmes bû.

2- Di nêviyê axavtinê de qutbûna telefonê, li Stenbûlê bûyereke pîr normal e.



Nivîskarê tirk Azîz Nesîn ku her tim serê wî bi dewletê re de belavê de bû, îsal, di meha tîrmehê de wefat kir. Kurteçîrokên wî berê jî bi kurmancî û soranî hatine weşandin.

Lê Nat Pinkerton ji boçika çixareya xwe hilmeke kûr kişand û got;

- Tu şaş e, Mistîr Holmes. Yara te bîstî-keke berê çû masiyan bigre, ne mumkun e

ku ew telefonê bike.

Di wê navê de telefon lê ket û dengê eynî pîrekê hat bihîstin.

– Yarê min!.. Yarê min!..

Telefon hatibû girtin.

Şarlok Holmes şewqê xwe heta ser bêvila xwe daxist û got;

– Nat, cînayetek li ber me ye.

Lê Nat Pinkerton tişteke got û Şarlok Holmes wê gavê fahm kir ku ev ne cînayetek e.

PIRS:

Gelo Nat Pinkerton ji Şarlok Holmes re çi got?

BERSIV:

Nat Pinkerton got;

– Ev jinik di telefonê de li yarê xwe digere. Lê li Tirkîyê gava mirov li numarayekê telefonê bigere, mutlaqa ew devera ku mirov lê nagere derdikeve.

Di wê navê de, jineke ku porê xwe hil dikir, di derî re ket hundur û got;

– Hûn ji bo çi bersiva telefona min nadin? Yarê min mir...

Şarlok Holmes piştî ku qalûna xwe di nava diranên xwe de sê caran bir û anî, pirsî;

– Madam, yarê te li ku miriye?

– Serê sibehê ketibû serşokê. Ez heta nivê şevê li bende wî mam, gava derneket, min meraq kir. Wexta min deriyê serşokê vekir, min dît ku di serşokê de fetisiye.

Nat Pinkerton dikira tiliya xwe ya talî ya qelaqûçikê jî bixwara û got;

– Bawer neke, Holmes. Bi namûs, ev jinik derewan dike.

PIRS:

Gelo Nat ji bo çi weha gotibû?

BERSIV:

Nat Pinkerton dizanibû ku li Stenbûlê ava bi qasî ku têra fetisandinê bike, ji kaniyan nedihat.

Şarlok Holmes got;

– Himm!...

Dû re berê xwe bi jinikê vekir;

– Madam, ne mumkun e ku yarê te di avê de fetisî be!...

Pîreka ciwan bang kir;

– Kê ji we re gotiye ku ew di avê de fetisiye? Musluxa gazê vekiriye!...

Bi dengê eynî mîna yê di temsîlên radyofonîk de, ku cam hejandin, pixkînî bi Nat Pinkerton ket.

PIRS:

Nat Pinkerton ji bo çi keniya?

BERSIV:

– Esabên wî tev li hevdû bûne.

– Na.

– Bi tişteke hesiyaye.

– Na, we tê dernexist.

Nat Pinkerton dizanibû ku ji musluxên gazê ji berdêla gazê, hewa sade dihat.

Şarlok Holmes û Nat Pinkerton çûn mala jinikê. Mêrikek li serşokê dirêjkirî bû. Nat Pinkerton piştî ku bi destmala xwe navrana mêrik nuxumand, got;

– Mistir Holmes, musluxa gazê veke, bila hebekî hewa paqij bê.

Şarlok Holmes ji navmaliyê pirsî;

– Beg kengî hat malê?

– Gava ku mêtê xanimê ne li mal be tê. Ji pirê saet di 6,45–an de li keştiyê siwar dibê, saet di 7,30–an de li vira ye.

Nat Pinkerton got;

– Xanima Domestik tu derewan dikî.

PIRS:

Nat Pinkerton ji bo çi ji navmaliyê bawer nekiribû?

BERSIV:

Ji ber ku Nat fêr bûbû ku li Stenbûlê keşti tu carî di wextê xwe de hereket nakin.

Şarlok Holmes îfadeya sekreterên mêrik girt;

– Hûn dikarin bibêjin ku bê we beriya mirina beg, ew cara dawî kengî û li kî derê dît?

Ji sekreteran yekê got;

– Terbiyeya min ji bo bersiva pirsê we ne musaît e.

Nat Pinkerton bi diranên xwe simbelên xwe kişand. Di vê navberê de yekî din got;

– Yê ku herî talî ew dît, ez im. Em saet di çaran de ji Taksîmê li minîbusê siwar bûn û di çar û çil û pêncan de hatin Beyazîte. Dû re ez jê veqetiyam.

Nat got;

– Hevalo, tu derewan dikî!

PIRS:

Nat Pinkerton ji bo çi weha gotibû?

BERSIV:

Édî hûn fêr bûnin, hûn ê bibêjin, ji ber

ku li Stenbûlê minîbusek di çil û pênc de- qîqeyan de ji Taksîmê nayê Beyazîte.

– Na!

– Ji ber ku wê rojê hejmartina nufûsê hebû û minîbus nedixebitîn.

– Na!... Nat ji bo ku mêrik şaş bike û ji îfadeya ruyê wî, ruhê wî bixwîne, weha gotibû.

Nat Pinkerton di cîhê xwe de hebekî fikirî û got;

– Min mesele fahm kir, Mistir Holmes.

Dû re ji bêrika xwe lupek derxist, da ber tavê û çixareya xwe pêxist.

Şarlok Holmes di wê navberê de got;

– Ma hayê te jê heye ku cînyeteke gellek girîng li ber me ye?

Nat Pinkerton bang kir û got;

– Mistir Holmes, min di dawiyê de delîlek zevt kir.

Mêrikê mirî ji cîhê xwe got;

– Mistir Nat Pinkerton, tiştê ku te zevt kiriye, doxîna min e, ez rica dikim nekişîne!

Şarlok Holmes ji mêrikê mirî re got;

– Dengê xwe bibirre! Li gor delîlên qetî yê ku di destên me de hene, divê tu mirî be!...

PIRS:

Yê mirî çawa peyivî?

BERSIV:

Nivîskar jî ji bo vêya li qulpekê difikire, lê peyde nekir. ■

Kîtin Bazdayî Ji Gewdê Helbestê

Hoşeng Biroka

I

Şev...
di bin kelaxê evîndaran de
bi xew ve çûyiye
û pencera min
bawîşkandinên xwe
li şûna xatira te
ji kêr dike
borînên bêmiradan
yeko...yeko
di qewlikê Beratan* de
winda dike

2

Oxira te...
bajarekî evdal e
çîçikên xeweke kû...r
dikoje
di bin
perdên
Şerfedîn** de

Şeveronk
 bi rêwingiya herdu çavên te re
 Endekokeke kenok e
 kolanên Şengala şewitî
 qonax bi qonax
 mel
 hem
 di
 ke...

* Berat: Di êzîdayetiyê de xarxaronekin pîroz e. Ji axika geliyê Laleş û ava kaniya spî têne çêkirin. Lewra pêdivî ye ku qewlikê beratan di her maleke êzîdan de hebe.

** Şerfedîn: Xasek ji xasêd êzîdiyan e, ango Yezdanekî pîroz e û heta roja îro perestgeheke wî di Laleş de heye û di wê perestgehê de perdene pîroz hene. Êzdî dibêjin ew perdên Şerfedîn bi xwe ne.

PÊWÎSTIYA PISPORIYÊ

Lokman Polat

Ji bo ku dewleteke me ya neteweyî tune ye, me Kurdan gelek tiştên xwe winda kiriye. Em ji gelek tiştan bêpar mane. Ji ber rûnebûna dewletê û dezgeyên netewî di hemû tiştên me de tevlihevî heye. Ji karên siyasî bigire hetanî yên edebî tevlihevî xwe dide nîşandan. Di hêla ziman de bêserûberiyek berdewam dike. Hêj jî sê Alfabeyên cuda tên bikaranîn. Li ser kumik û şewqan, ji bo “ i - î ” û “ î - î ” hêj jî dubendî berdewam dike. Ji bo yekîtiya ziman, ji bo grammar û rastnivîsînê otorîteyek neteweyî ku xwediyê biryar be tune ye. Di hêla li ser xebata ziman de berhemên zanistî gelek kêmtêne weşandin, pisporek ziman kêmtin. Çend kes hene ew jî bi tiliyan têne jimarînin. Berhem û lêkolînên wan li gor yên biyaniyan pirr qels in. Hewcedariya xebata li ser ziman her dem xwe dide nîşandan. Pêwîstiya pisporên ziman gelek girîng e. Divê ev tevliheviya ku di hêla ziman de heye di nav pêvajoyê de bê rakirin.

Di hêla weşanên Kurdan de jî tevliheviyek mezin xwe dide nîşandan. Weşanên Kurdan ne wek weşanên gelê cihanê ne.

Ferqiyeta wan ji weşanên neteweyên ku xwediyê dewletin, gelek in. Helbet di vê de di serî de bêdewletbûn, bêîmkanî, bêqadîrên teknîkî û ji alî aborî ve astengên mezin hene.

Weşanên netewên ku dewletên wan heye bi her awayî weşanên gelek xurt in. Li gor her babetî weşanên wan heye. Ji bo pirsên dîrokî û lêkolîna dîrokê kovarên wan yên taybetî ji bo dîrokê heye. Ji bo gelşên edebî kovarên wan yên edebî hene. Kovarên çand, huner, ziman, muzîk û hwd. pircûre kovar hene. Xwendevanên ku întresa wan ji muzîkê, ji dîrokê, ji çand û hunerê, ji edebiyatê heye van kovaran distînin, dixwînin. Ger îmkan hebe divê Kurd jî li gor her babetî kovarên cuda derxin. Kovarên me Kurdan hem kovarên teorîk in, hem edebî ne, çandî ne, muzîkî ne, hem zimanî ne. Li vê dawiyê bi derketina kovara Berhem û Nûdemê hinek zelalî di babetên çerçewa kovaran de çêbû. Wek têt zanî Berhem kovara lêkolînê bû, Nûdem jî kovara edebî ye.

Kadirên teknîkî yên Kurdan kêmtin in. Ew

kesên ku kovar û rojnamên Kurdan derdixin ji rojnamevaniyê baş fam nakin. Mizampajê rind nizanin, nûçevaniyê nizanin. Bi gelek şaşî, xeletî û kêmaniyan wan kovar û rojnamên hefteyî diweşînin. Di van weşanan de nivîsên Kurdî jî gelek şaş tên nivîsandin.

Kovar û rojnameyên me kurdan li gor neteweyên ku xwedîdewlet in pîrr û pîrr kêr in. Mînakê; Li Finlandayê 209 rojnameyên rojane û 557 kovarên hefteyî û mehane derdikevin. Kovar û rojnameyên ku li Fransa, Almanya, Bîrîtanya û li Swêdê derdikevin ji xwe nayê jimartin.

Di hêla muzîkê de jî tevlihevîyek heye. Gelek dengbêj dibistanên muzîkê nexwendine. Nota nizanin, ji meqamên muzîkê yên cûre cûre fam nakin. Hema dengê kê piçekî xweş be ew bûye dengbêj, bûye stranbêj. Ji bo ku dezgehê neteweyî ya Kurdan tune, dibistanên Kurdan yên muzîkê tune, loma jî ev tevlihevî hene. Tirk muzîk û folklorê Kurdan didizin, digehurtînin û dikin malê xwe. Gelek stranên Kurdî werdigerînin tirkî û dibêjin ev stranên "Türk Halk Türküleri" ne.

Ji bo ji niha û pê ve pêşiya van tevliheviyan bê girtin, divê Kurd gelek tiştan bikin. Helbet heranî ku dewleta Kurd neyê damezrandin, pêşiya her tiştî nayê girtin û ev tevlihevî ji holê ranabe. Lê divê ji niha û pê ve sazgehên neteweyî bêne avakirin. Di her warî de mirovên pispor bêne gîhandin. Kadirên teknîkê ji niha ve bêne amadekirin. Gava ev tişt ji niha û pêve bête kirin, ji bo birêvebirina karên dewleta Kurd jî dê mercên hêsan çêbibin. Dewleta Kurd dê di hêla kadirên teknîkî û mirovên pisporî de

zehmetiyê nekşîne. Hewcedariya mirovên pispor di hêla xebata li ser ziman, çand û edeb de jî xwe nîşan dide. Ger di vê hêlê de jî mirovên pispor bigihîjin û bikemilînin dê ji bo pêşveçûna çand, ziman û edebiyata Kurdî gelek baş be. ■

Li Mala Rewşen Bedir-Xan

Firat Cewerî

Piştî rêwîtiyeke dirêj, ez berdestê êvarê, li Baniasê, ji otobusê peya bûm. Banias bajarekî xweş e, bi a min yek ji bajarên Sûriyê yê herî xweş e. Bajar li kêleka deryayê hatiye avakirin. Bi awira pêşî piraniya bajarvaniyan dewlemend dixuyin. Dibe ku jî mirov dewlemendiya wan di lixwekirin û otomobîlên wan de dibîne. Herçiqas rûniştevanên bajêr ereb jî bin, dîsan mirov peyayên bi çefî û egal û jinên sernuxumandî kêr dibîne. Li vî bajarê Sûriyê yê nûjen, xanimeke kurd dima. Keça Salih Begê, dotmam û kevaniya Celadet Begê... Kaxeza navnîşana vê Xarûna han di destê min de bû û yên ku ez pêrgî wan dibûm, min navnîşana wê ji wan dipirsî. Gotineke pêşiyên me heye, dibêje “Mirov bi pirsê dihere Xursê”. Ez jî bi pirsê gihîştîme ber avahiye-kê, hebekî li ber deriyê avahiye rawestiyam û min hêdî bi heyecan li derî da. Ya ku ji min re derî vekir berdestka wê bû. Jinikê bi tirkîyeke osmanî, lê bi devoka çerkezan bixêrhatinî da min, çenteyê min ji destê min girt û ez birim odeya rûniştinê, ba Rewşen Xanimê. Rewşen Xanimê jî bi mêvanperweriyeke kurdî û bi rûyekî bi ken bixêrhatinî da min û ez bi cih kirim.

Ez jî bi dilşahî rûniştîm. Piştî kurtesohbetekê min çavên xwe li resimên li dîwêr

gerandin. Resimên ku pêşî li ber çavên min ketin, resimê hersê biran; Sureya, Celadet û Kamûran Bedirxan bûn.

Piştî şîva êvarê min ji Rewşen Xanimê pirsî:

– Gelo tu ê bikaribî bi niyeta kurtehevpeyvînekê xwe bidî naskirin?

– Ez keça Salih Bedir-Xan û jina Celadet Alî Bedirxan im, got û jê pê ve tu tişt ne-got.

Ji xwe bes e jî. Kurdên ku navên Salih û Celadet Bedir-Xan nebihîstibin pir kêr in. An jî kurdên xwende û bîrewer yên ku haya wan ji Celadet û xebatên wî tunebin, çî bigire nîn in.

– Ê baş e, xebat û xwendina Rewşen Xanim bi xwe çî ye û çî bû?

– Weke kar, min mamostetiya zimanê erebî dikir û ez demekê jî midûrê dibistanê bûm. Erebiya min ji kurdî û tirkîya min çêtir bû û çêtir e jî. Ji ber vê yekê xebatên min yên rewşenbîrî jî bêtir bi zimanê erebî dibû. Min bêtir bi erebî dinivîsand û ji zimanên din werdigerande erebî. Min pirtûkek jî bi navê “Hîn Rûpel Ji Edebiyata Kurdî” bi erebî, berpêşî xwendevanên ereb kiriye. Min carna jî hin bend di Hawarê de belav dikirin.

Gava ew bi kurdî dipeyivî wê hin zehme-



Firat Cewerî bi Rewşen Bedir-Xan re; li Banîasê li mala R. Bedir-Xan 1987

tî dikişand, ew carna di nav re bi min re bi tirkî dipeyivî; bi tirkîyeke pir xweş û bê kêmasî...

– Niha jî ez vê pirtûka han werdigerînim erebî. (Pirtûkek li ser Sulta Hemîd bû).

– Ji bo çi ev pirtûk û ne yeke din?

– Weşanxaneyekê ev ji min xwestiye, bêtir vê bala wan kişandiye. Tu ya rastî bixwazî, bi wergerandina vê pirtûkê çend quruş pere jî digihîjin destên min.

Bivê nevé sohbeta me carna diçû dema rehmetî Celadet Beg û kovara Hawarê.

– Yadê, tu dikarî ji kerema xwe re bi kurî behsa dema Hawarê bikî? Hawar li ku û çawan derdiket, yên zîrek ku tê de kar dikirin kî bûn?

– Çapxaneya Hawarê li mal bû. Yek ji

mijûliyên rehmetî yê sereke derxistina Hawarê bû. Min jî alîkariya wî dikir. Piştî demekê, gava ez hînî rêzkirin û ambelajê bûm, kar hêsantir bû. Hingî Osman Sebrî û Qedrî Can jî li ba me diman, herdu jî pir jêhatî bûn. Dû re Îbrahîm hebû, ew bi rastî jî rewşenbîr bû. Osman Sebrî çar mehan li cem me mabû, hîn jî min nizanibû ku ew Osman Sebrî ye. Wan Osman Sebrî, bi Heçî Husên bi min dabûne naskirin.

– Hin kes dibêjin ku kovara Hawarê bi alîkariya fransîzan derdiket, ma rast e?

– Na, ne rast e. Hawar ne bi alîkariya fransîzan, lê bi destûra wan derdiket. Ne bi tenê Hawar, her wisa Roja Nû jî bi destûra wan derdiket.

– Gelo ku îro fransîz li vir bûna, wê rew-

şa kurdan çawan bûya?

– Wê rewşa kurdan her wilo bûya. Fransiz jî kolonyalîst in û yên ku em îro di bin destên wan jî de ne kolonyalîst in.

– Ma rast e ku armanca Celadet Beg avakirina Kurdistanê monarşî bû?

– Kî wê bibêjin ew bêbextiyan li rehmêtî dikin. Wî tu caran tiştêkî wilo ne gotiye, ne jî daxwaz kiriye. Wî her digot, divê Kurdistan bi destê hemû kurdan bête ava kirin. Çi karker, çi gundî, çi mele, çi axa û beg hemû xwediyê Kurdistanê ne. Armanca rehmêtî Kurdistanê demokratîk û yekbûyî bû. Ji xwe Kurdistan yek e. A niha jî hin xort dibêjin em ji Kurdistana Tirkîyê, hin dibêjin em ji Kurdistana Îranê, hin dibêjin em ji Kurdistana Iraqê û hin jî dibêjin em ji Kurdistana Sûriyê ne. Bi a min ev ne rast e, şaş e. Kurdistan yek e û sînorên ku li Kurdistanê hatine kişandin ji derveyî îrada kurdan hatiye kişandin. Ew sînorên emperyalîzmê ne.

– Ew Celadetê ku îro ji aliyê hemû kurdan ve tête hezkirin, gelo ji Rewşen Xanimê re çawan bû?

– Ew ne bi tenê mîrê min, lê ew her tiştê min bû. Ew bavê min, birayê min, hevalê min, mamostayê min bû. Ez jî yek ji wan kurda me ku îro kêmasiya tunebûna wî dikişînim.

– Windabûna vî peyayê bi rûmet çi tesîr li jiyana te kir, ev trajedî çawan çê bû?

– Mirina wî ez mehû kirim, dinya bi ser min de hilşand. Mesûliyetêke siyasî, civakî û aborî di stûyê min de hişt. Ji xwe dawîhatina jiyana wî ya bi trajedî jî, ji bo başkirin û hebekî bipêşdexistina aboriya xwe bû. Lê nebû, ew kar bû sedema mirina wî.

– Çi bû ya ku bû sedema mirina wî?

– Tacirî, pembo... Em gelekî destteng bûbûn. Ji ber vê yekê rehmêtî rabû zeyvên hevalekî xwe bi nivî çand, kire pembo. Ji ber kêmbûna avê, wî dest bi kolandina bîrekê kir û navê bîra xwe jî kire “Bîra Qederê”. Ew di wê bîra xwe wer bû û mir. Wî bîra xwe bi destê xwe kola.

Piştî van gotinan Rewşen Xanim demekê bêdeng ma, kûr kûr fikirî û cigarek vexist. Wîlo xuya bû ku wê hê jî ew bûyer ji bîr nekiribû. Min jî nexwest ku ez zêde bi dû sedemên ku çima “wî bîra xwe bi destên xwe kola” bikevim, min gotin dagerande ser tiştêkî din:

– Çi ji xortên kurd yên li Ewrûpa dikeve serê te? Ew dikarin çi bikin?


– Ger ew bibin yek, ew dikarin her tiştî bikin. Yekîti, divê hûn yekîtiyekê di nava xwe de çêbikin. A niha bi dehan kovar û rojname derdikevin, çira? Ma ger hûn werin ba hev û sê-çar kovar û rojnameyên bi kalîte derxin, ne çêtir e?

Heya ku ez li ba wê bûm, wê ji min re got, got û got. Destê min ji vê mirova gotinxweş, zarşêrîn, zana û rewşenbîr nedibû. Di mêvandariyêke kurt de wê ez hîni pir tiştan kirim, dîrokek ji min re got... ■

Ev hevpeyvîna bi Rewşen Bedir-Xan re di sala 1987'an de di Kurdistan Pressê de hatibû weşandin. Bi hinceta bîranîna Rewşen Xanimê û bi niyeta ku wê negihîştibe girseya xwendevanan, em wê careke din diweşînin.

Nameyeke Rewşen Bedir- Xan ji Firat Cewerî re

Banias 87-12-28



Kurê min ê pir bi qîmet!

Pêşiyên me dibêjin: Bila kêç be, lê ne dereng be!

Rewşa min ya bi te re jî wilo bû. Mixabin ku ez ancax niha dikarim bersiva nameya te ya bi dîroka 87-7-31'ê bidim. Gelek sebeb çêbûn. Ez di dîroka 87.9.19'an de ji Mistrê vegeriyam. Ez demekê gelekî westiyayî bûm. Paşê karê malê, haziriyên zivistanê, nexweşî, pîrîtî û astengiyên din jî çêbûn. Çawan be ez lêborînê dixwazim. Nizanim gelo navnîşana te ya berê ye? Ez ditirsim ku nameya min negihîje te...

Nordein? Piştî çend rojekî em ê têkevin sala nû, Xwedê ji te re, ji hemû hezkirên te re, ji miletê te re, ji mirovatiyê re xêrê bîne.

Ferzend çûye Parisê. Wî ji wir ji min re nivîsand. Ez Kurdistan Pressê digirim. Ew baş bi rêk û pêk bûye. Tu nizani bê ez çi qasî bextiyar dibim. Ez ê ji wan re binivîstnim.

Gelo tu ê di van nêzîkan de werî cem me? Ger tu werî, ji bîr meke, li Banîsê dayikeke pîr û xaniyekî biçûk li benda te ne.

Ez her tim jî te re saxî û bextiyariyê dixwazim, çavên te maçî dikim û li benda dengûbasên te me.

Diya te ya manewî

Rewşen Bedirxan

Ev name ji tîtkî hatiye wergerandin. Orjînalê wê li milê rastê ye.

Banias
87-12-28

Pek Kijmali Oğlum !

Atalorimiy derberdi :

Kiç olunday, gus olunday ! ..

Benimde sanikle durumim işle oldi .

Maalesef 87-7-31 tarixli mektubima ancax şimdi cevap veriyorum . Hoşli selahler oldi . Nisurdan 87-9-19 de dindim . Bir muddet çok yorgundim . Sonra ev işi, Kiç hazirlikleri, hastalık ve ihtiyarlık, daha başka engeller oldi . Herhalde işyeri dilemiş . Bilmen adresin aygısını ? Herkarim mektubim oluca geçmez .

Nordein ? Bir kaç gün sonra yeni yıl girince Allah sana ve bütün sevdiğilerime, milletime inanca lîga hayrli basaridi olsun .

Ferzend Parîse gitmiş . Oradan lîva geydi . Kurdistan Pressi alıyorum . Oldukca lîvane girmiş . Bilmişim ve hadar bekliyorum . Ocularda geyişe başlım .

A-caba kuralere yakınlarda gelecektimim .

Gelersen , sanıtına seni Banias de bekliyar . Bir Ana ve kuçuk bir ev bekler .

Daima sana sıhat ve saadîet diler , gözle rinden işer habercilerini beklerim

Mananî Ana

R. Bedirxan

Serokê Karê Diyanetê nizane ku çi dibêje

Sabah Kara

Wek ku tê zanîn, vê dawiyê Serokatiya Karên Diyanetê qaşo bi meqsêda “parastina neguherîna Qur’anê”, qerar da ku çêkirina meala kurdî mumkin nîn e û nabe ku Qur’an bi kurdî şirove bibel!”

Serokatiya Karên Diyanetê di vê qerara xwe de xeletî û kêmasiyên meala kurdî ya ku Abdul-lah Varli hazir kiriye, ji xwe re kiriye delîl.

Li gor nûçeyên ku di rojnameyan de cih girtine, ji bo ku meala kurdî neyê weşandin, hikûmet dixwaze ku teklîfeke qanûnê hazir bike.

Ez wek kurdekî misliman ku berpirsiyarê giştî yê kovara kurdî Nûbihar a ku ev nêzî sê salan tê weşandin im, vê qerara Serokatiya Karên Diyanetê wek *yawe û ebesê* dibînim û van gotinên wan ên xirab, li wan vedigerînim.

Serokatiya Karên Diyanetê, “wek devê xwe-diyê xwe” dipeyive û ev qerara wê, bi tevayî ji îslamê bi derve ye.

Digel vê qasê ku di ti zimanê de wergera Qur’anê ya mikemmel û yekeyek tinîn e û bîz-zat Serokatiya Karên Diyanetê bi xwe jî di meala tirkî ya ku wê weşandiyê de vê yekê beyan û îlan kiriye, eva ku ji kurdan dixwaze ku wergerê Qur’anê ya yekeyek bînin pê, xwestineke *yaweyî û ebes* e.

“Parastina neguherîna Qur’anê” yanî çi? Ma gelo kîjan meal dikare vê yekê îdia bike ku yekeyek weke Qur’an erebî ye? Bi ser de jî, yê ku di vî îşî de qisûrin kiriye, Abdullah Varli bi tenê jî nîn e. Serokatiya Karên Diyanetê jî meala tirkî ya ku wê bi xwe daye hezkirin, gelek caran ji ber çavan ve derbas kiriye û hê jî vê xebata xwe didomîne. Wek ku tê zanîn, hê van dawiyayan, wê li ser vê pirsê civîneke taybetî jî tertîb kir.

Ez wek merivekî ku min di gelek warên edebiyatê de berhemên kurdî nivîsandî û weşandiyê, û ev li dor sê sal in ku ez berpirsiyarê giştî yê kovareke çandî, hunerî û edebî ya kurdî me ku kovara me pir bi hêsanî dikare bi kovarên em-

salî yên tirkî re têkeve pêşbaziye; ez ji Serokatiya Karên Diyanetê re dibêjim, hodrîmeydan! Bila hemû pisporên xwe bidin hev, em ê vê pirsê li ber raya gelemberî minaqeşe bikin. Lê belê elbet ku şertekî min heye. Kesên ku ez ê bi wan re têkevim minaqeşe, divê ku wek min hem bi tirkî bizanibin û hem jî bi kurdî. Lewra bi kesên ku bi kurdî nizanin, lê digel vê qasê ku nizanîn jî cardin ehkaman dibirrin re, minaqeşekirin xebateke yaweyî û ebes e.

Li ser vê pirsê tiştên ku divên bên gotin, pir in...


Li hember vêya ku sazmanên fileh, dinyak pere xerc dikin û Încîla bi kurdî didin hazirkirin û diweşînin; Serokatiya Karên Diyanetê, dev jê biqerin ku wezîfa xwe bînin pê û ew bi xwe mealeke kurdî bide hazirkirin, ji bo ku astengan derxîne ber kesên ku divin vê wezîfê bi îmkanên xwe çêbikin, tiştê ku ji dest tê nade paş û dixwaze bike ku kurd îslamê bi zimanê xwe fêhim nekin. Ku ev, nimûneke ecêb û xerîb e.

Netîceya ku ji mefhûma mixalîf a dazanîna Serokê Karên Diyanetê derdikeve ev e ku, “mealên tirkî, mîna Qur’anê ne! (Lewra Serokatiya Karên Diyanetê, mealên tirkî bi meqsêda “parastina neguherîna Qur’anê”, ebed qedexê nekiriye. Nexwe li gor îdia Serokatiya Karên Diyanetê, “mealên tirkî, yekeyek mîna Qur’ana erebî ne!”) Lê elbet ev tiştek e ku zarok jî wê qebûl nakin.

Ez îdia dikim! Zimanê kurdî, ji hêla qeweta îfadekirinê ve (bi gotineke pir mitewazî) ji zimanê tirkî paşdetir nîn e û madem dibe ku meala tirkî were hezkirin, nexwe meala kurdî jî hele hele tê hezkirin.

Înşallah dê dîtina vê yekê bibe nesibê me; û rariş, dê ew kesên ku eksê vê îdia dikin, bi navê mifertî zikir bike. ■

BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ



Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd hebe, pêşniyazeke me heye; bibe aboneyê Nûdemê!

Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya her çar perçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê Nûdemê!

Nûdem dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bike, bibe abone!


Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê Nûdemê
Ji bo Swêd salekê 190 Sek, welatên din 50 \$

Nav û paşnav.....

Navnîşan.....

Vê karta jor dagirin û li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê Nûdemê digel karta abonetiye ji we re bişînin

WEŞANÊN NÛDEMÊ



Maleke bê pirtûk weke xaniyekî bê pencere ye

Moa Martinsson